


# NÜDEM

No 19 1996



**Kovara Hunerî, Edebi û Çandî**

# WEŞANÊN NÛDEMÊ

- ◆ BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCI Celadet Ali Bedir-Xan / Gramer
- ◆ DÊ Û DÊMARÎ Egidê Xudo ji Kirilik: Nacî Kutlay / Roman
- ◆ KESKESOR Nûredin Zaza / Çirok
- ◆ DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN Rohat / Lâkolîn
- ◆ HEZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ Mehmed Uzun / Ceribandin
- ◆ MÎRZA MEHEMED Medenî Ferho / Roman
- ◆ MILKÊ EVÎNÊ Rojen Barnas / Şiîr
- ◆ ZAROKA ŞEVÊ Jack London Werger: Mustafa Aydogan / Çirok
- ◆ BIYANÎ Albert Camus Werger: Fawaz Husêن / Roman
- ◆ MÎRZAYÊ BIÇÜKA de Saint-Eksupéry Werger: Fawaz Husêن / Çirok
- ◆ GOTIN Yaşar Kaya / Ceribandin
- ◆ ANTOLOJIYA ÇIROKA NÛ YA KURMANCÊN BAŞÛR Xelîl Dubokî
- ◆ ŞEVÊN SPÎ Dostoyevskî Werger: Fırat Cewerî / Roman
- ◆ MIŞK Û MIROV John Steinbeck Werger: Fırat Cewerî / Roman
- ◆ BEXÇEYÊ VİŞNE Çexov Werger: Fırat Cewerî / Piyes
- ◆ LI BENDA GODOT Samuel Becket Werger: Fırat Cewerî / Piyes
- ◆ GOTİNÊ NAVDARAN Amadekar: Fırat Cewerî / Aforîma
- ◆ GIRTÎ Fırat Cewerî / Çirok
- ◆ KEVOKA SPÎ Fırat Cewerî / Çirok
- ◆ KULTUR, HUNER Û EDEBIYAT Fırat Cewerî / Ceribandin, hevpeyvin
- ◆ ÇIROKA ŞOFÊR Cengiz Aymatov Werger: Nacî Kutlay / Roman
- ◆ EVINA REBEN Derwes M. Ferho / Şiîr
- ◆ BANGA HAWARÊ Medenî Ferho / Şiîr
- ◆ KULTUR Û RAMAN Şerefhan Cizîri / Ceribandin
- ◆ KURÊ ZINARÊ SERBILIND Sidqî Hironî / Roman
- ◆ DERWARÎ Yusufê Cerihî / Şiîr

PIRTÛKXANEYA XWE BI WEŞANÊN NÛDEMÊ BIXEMİLÎNE!

# NÜDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî

\*

Xwedî û berpirsiyarê giştî

*Chief Editor*

## Firat Cewerî

\*

Hejmar 19, sal 5

Payiz: 1996

\*

Şerdên abonetiyê (salek)

Swêd: 190 Sek

Welatên din: 50 \$

Institution 260 Sek

\*

Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964

\*

Wêneya bergê: Tabloya Bişar Îsa

\*

Pergala berg û rûpelan: Nûdem

\*

NÜDEM kovareke serbixwe û Kurdistanî ye, ferqiyetê naxe navbera nêrîn û îdeolojiyên kurdan, ji dijminatiya kes û rêkxistinan dûr e, rûpelên wê ji hemû nivískarênen kurd re vekirî ne.

**Adres:**

**NÜDEM**

**Termov. 52 2tr.**


**176 77 Järfälla-Sweden**

**Tel û Fax: 8-583 564 68**

# NAVEROK

- 4 İNTELLEKTUELIYA KURDÎ ♦ Firat Cewerî
- 12 RONAKBİR Ú RONAKBİRİ ♦ Rojan Hazim
- 22 İNTELLEKTUEL Ú İNTELLEKTUELİZM ♦ Şahînê Bekirê Soreklî
- 27 İNTELLEKTUEL... ♦ Edîp Polat
- 32 ROLA REWŞENBIRIYÊ ♦ Derwêş M. Ferho
- 36 PIRSGIRËKA İNTELLEKTUELIYA KURDÎ ♦ Cemşid Bender
- 40 REWŞENBIRÊN POLİTİK ♦ Şerefşan Cizîrî
- 46 BÊDENGÎ MİRINA REWŞENBIRAN E ♦ Medenî Ferho
- 50 İNTELLEKTUEL ♦ Rıza Polat
- 52 ŞİREK JI ♦ Yawer
- 55 KOMUTAN ♦ Serdar Roşan
- 59 ŞİREKE SÊWÎ
- 60 XEWNA ÇELENGE KOÇER ♦ Sebrî Botanî
- 63 HEWÎ ♦ Xemgîn Temê
- 69 MAMOSTE, MAMOSTEI ♦ Nizar Agirî
- 71 HEMESEİD HESEN ♦ Xelîl Duhî
- 87 NELSON MANDELA ♦ Mihemed Dehsîwar
- 99 AZAR MAHLOUJIAN ♦ F. Cewerî
- 102 60 SALIYA WEŞTRÊ EŞO ♦ Têmûrê Xelîl û Emerîkê Serdar
- 107 XEZAL ♦ Lokman Polat
- 109 ROJEK JI ROJEN EVDALÊ ZEYNİKÊ ♦ Adil Dûran
- 112 ÇIROKÊN SUZAN SAMANCI...

# Întellektueliya kurdî



**Fırat Cewerî**

Tîstê tu dibêjî ez qebûl nakim, lê ez he-  
ta mirinê mafê te yê gotinê diparêzim.

*Voltaire*

E v demek e di nava rûpelên kovar û  
Erojnameyên kurdan de, di çavîka te-  
levizyona Med'ê de û herweha li der û  
dorêñ kurdan munâqşeya terma întel-  
lektauelî, întellektuelên kurd û berpirsiya-  
riyên întellektuelan tê kirin. Berî bi de-  
mekê jî bi vê mijarê ve girêdayî, munâq-  
şeya nasnava şâîrê kurd, nivîskariya kurdî  
û romana kurdî dihate kirin. Destavêtina  
vê beşa girîng û jibîrbûyî, nîşana pêşketi-  
nê û ber bi bajarvaniyê ve bi xurtî gavavê-  
tinê ye. Ji aliyê din ve, mizgîniya zayîna

întellektueliya kurdî û rohnîbûna civaka kurdî ya tarî ye. Munâqşeyên bi vî  
babetî, lê bi perspektîfên cûda ji mêj ve li welatên îndustrî hatine kirin.  
Herçiqas cihêbûna kulturê, cihêbûna ziman û cihêbûna av û hewa welatan,  
karakterên întellektueliyeke cihê jî tînin pê û herçiqas karakterên întellektu-  
eliya cihê bi karakterên neteweyên cihê û li gorî pêşketin û paşdemayîna  
wan neteweyan reng û şekil digirin jî, dîsan di navteweyî de, mîna hêlîn mi-  
rovêñ dînyayî yên hevbeş, hêlîn întellektuelan jî yên gelekî hevbeş hene.  
Gava em mijarê bînin ser întellektuelên kurdan û kurteanalîz û tarifeke întel-  
lektaueliya kurdî bikin, em ê ne bikaribin xwe ji întellektueliya cîhanî qut  
bikin, ne jî tenê bi perspektîfeke neteweyî nêzîkî mijarê bibin. Lî, divê em  
rewşa kurdan, rewşa welatê wan, sosyo-ekonomiya welêt, siyaseta serdestêñ  
kurdan û siyaseta kurdan bi xwe jî berçav bikin.

Di civata kurdî de ne derxistina û intellektuelan, liserlinganmayin û xweparastina kurdan bi serê xwe bûyereke unîk e. Tu heftê salî di bin zilm û zorê de bimînî, tu heftê salî werî înkarkirin, tu heftê salî ji zimanê xwe, ji hebûna xwe, ji navê xwe werî bidûrxistin, û tu dîsan li ser lingan bimînî; ne bi tenê li ser lingan bimînî, lê tu ji nava xwe siyasetvanan, nivîskaran, hunermendan û û intellektuelan derxînî; bi zimanekî ku di dibistanan de nehatiye xwendin tu pê romanen, çîrokan û şîfran binivîsinî. Herçiqas mînakên nêzîkî vê rewşê li cîhanê werin dîtin jî, dîsan gelekî kêm in. Wê çaxê wê taybetmendîyeke û intellektuelen kurd jî hebe, wê xweseriyeke û intellektuelen kurd û herweha wê berpirsiyariyeke û intellektuelen kurd û taybetî hebe.

Gava em û intellektuelen kurdan bikin du kategorî û ji kategoriya û intellektuelen kurd ya kurdperwer û welathez bi rê bikevin, em ê bibînin û intellektuelen kurd berpirsiyariyên xwe yên û intellektuelî û civakî bi cih anîne û gelek caran xwestine ji hêza xwe bêtir li ber xwe bidin. Derketin û zayîna û intellektuelen kurdan ne tenê derketineke û intellektuelî, lê belê derketineke protestoyî, derketineke serîhildanî, derketineke parastin û ji mirinê rizgarkirina hin tiştên bingehîn in. Ji ber qelsiya nexwendinê, nebûna siyasetvanen jîr û pîrhîl, û intellektuelen kurdan mecbûr mane bârê xwe girantir bikin, barê gelekî bidin ser milên xwe û bixwazin ji bo azadiya wî gelî têkoşînê bidin. Di vir de û intellektuelen kurd mecbûr mane ku cih bi cih rola siyasetvanen kurd jî bileyizin, ji tevger û berxwedanen gel re bibin serkêş, sîngên xwe bidin ber guleyan. Ev celebîntellektueliye kurdî, tarîfa Benda ya û intellektuelî tîna bîra mirov. Benda dibêje: "Întellektuelen rastî, dikarin bi kaxezên xwe ve werin şewitandin, werin surgûnkirin û li çarmîxê werin xistin."

Em ê di rêzen pêş de bibînin ku bi rastî jî aqûbeteye wilo hatiye serê û intellektuelen kurdan. Întellektuelen kurdan bi piranî li derveyî sînorêne welêt xwe gihandine, bi kapasîteyên xurt û kemilandî xwe avêtina hemêza gel. Neşiyarbûna gel, nezanî û paşdemayina gel, her tim kiriye ku qutbûnek di navbera wan û û intellektuelen wan de çêbibe. Ji ber nebûna tevgeren siyasi yên modern û qelsbûna têgilîştina kulturî, gel û û intellektuelen xwe an bi zimanen cihê peyivîne, an jî di warê ji-hevtêgihiştinê de gelekî zehmetî kişandine.

### **Di û intellektueliye kurdî de rola Bedir-Xaniyan**

Întellektuelen kurd her tim fêdeya miletê xwe, riya azadî û hişyariyê, fedekarî û malwêraniye xwe, xistine pêşîya menfeet û karyera xwe. Gava em li bangâ xwedîyê rojnameya Kurdistanê, Mîqdad Mîthed Bedirxan ya berî bi sed salî guhdarî dîkin,

em li fedekarî û dilsoziya wî temaşe dikin, em dibînin ku resimekî intellektueliya kurdî ya dema me jê derdikeve. Gava hemdemên wî yên Ewrûpayî bi riya çapemenî û rojnamederxstinê dewlemend dibûn, Mîqdad Mîthet Bedirxan, ji bo şiyarkirina kurdan, ji bo ji nezaniyê rizgarkirna wan, ji bo medenîkirin û rakirina wan ya ser lingan, hem bi malê xwe, hem jî bi canê xwe xwe avêtibû meydana intellektuelî û siyaseta kurdî.

Celadet Bedir-Xan jî dide ser eynî riyê. Ger ew kurdayetiyê neke, bi pirsgirêka kurdan re mijûl nebe; li xwe, li navê xwe, li malê xwe bifikire, wê bikaribe jiyaneke bêdeng û aram bijî. Lê ew weha nake, ew dixwaze hemû zanebûna xwe, ilmê xwe, kapasîteya xwe veguhêza civaka xwe û bi wê riyê, miletê xwe şiyar bike, zimanê ku bi zorê jê hatiye stendin, bidiyê, wî bike xwedîyê şexsiyet û rûmetê û ew bi xwe jî xwe bi şexsiyet û bi rûmet hîs bike, bibîne.

Dema Celadet Beg, di dîroka intellektueliya kurdî de, demeke zêrîn e. Pişti ku serîhildana Agiriyê têk diçe, tevgera Xoybûnê belav dibe, İhsan Nûrî Paşa û birê-vebirênen serîhildanê xwe didin alî, Celadet Bedir-Xan bi her awayî xwe davêje meydana intellektueliya kurdî. Intellektueliyeke modern, bi pîvanêni modern û humanîst, lê hetta tu bibêjî bi reha kurdayetiyê ve girêdayî. Ew dixwaze bi wî awayî baweriya kurdan xurt bike, zimanê wan bi wan şêrîn bike û hem bike ku ew li ser koka xwe bilind bibin, hem jî mîna perçeyek ji cihanê, xwe nêzîkî mirovatiya cihanî bikin. Dîsa Benda dibêje: "Ji ber ku intellektuelî karekî zehmet e, li dij statukoyan derketin e, stûyê xwe dayîna ber kîrê ye, her tim hejmara wan jî kêm e". Em dizanin ku Benda di tarîfa intellektulan de, navendê Ewrûpa digire. Ew bawer dike di civakên Ewrûpayî yên pirxwende de jî hejmara mirovên intellektuel ne zede ye. Vêca, di civateke mîna civata kurdî de, di destpêka salên sihî de, di dema xela, koçberî, nexweşî û feqîriyê de, pirbûna hejmara intellektuelan ji xwe wê ne nêzîkî rastiyê be. Celadet Bedir-Xan jî bi wê rastiyê dizanîbû, bi barekî giran, lê bi baweriyeke xurt dixwest bi xwe re jî hinek hevalan çêbike, qet nebe ji nivşê pêşerojê re bibin cirûskên hêviyê. Û ew bûn jî... Em dibînin ci intellektueliya kurdî ya salên şestî û ci ji ya salên heyştêyî deyndarêni ekola salên sihî ne.

### Kêmberbûna intellektuelên kurdan

Pirsgirêka intellektueliya kurdî her tim bi pirsgirêka gelê kurd ve hatiye girêdan. An jî serdestên kurdan, bi metoda ku ew çûne ser têkoşerên siyasi, pêşengên serîhildanan, ew bi eynî metodê çûne ser intellektuelên kurdan jî. Wan ferqiyetek ne-

xistine navbera sîlah û pêñûsê. Ew bi sîleh çûne ser xwedîpêñûsan. Vê metoda serdestêñ kurdan kiriye ku întellektuelêñ kurdan xwe nêzîkî sînorê siyasetê bikin, pişti demekê partîyan ava bikin, bibin serok û berpirsiyarêñ partiyêñ siyasî; ji ber qedexebûna siyaseta vekirî, ew mecbûr mane illegal bixebitin. Ev yeka han jî, ji bo pêşketin û cîhanîbûna întellektuelêñ kurdan búye kelemek. Ji ber xebata wan ya bi dizî, ew bi dizî dixwînin, bi dizî digihîjin kêm mirovan, nikarin bi fermî besdariyê li civatê, li bûyerên civatê, li munâqşeyê vekirî ku di civatê de dibin bikin. Ew ji ber polisan baz didin, cih diguherin, her roj li bajarekî, her roj li malekê dimînin; ji cîhana pirtûkan bi dûr dikevin, loma îmkana wan ya xwegihandina di warê întellektuelî de bi sînor dibe, ji ber wê yekê jî ew bêber dimînin, kontunîte di xebata wan ya nivîskariyê de çenabe, bi çend şîran, an jî bi çend meqaleyen ji nav me koç dikan.

Ev bêberî, hem di întellektuelî û nivîskariya salêñ şestî de, hem jî di ya salêñ sihî de li ber çavan dikeve. Wek mînak Nûredîn Zaza bi xoranî dest bi nivîsandinê dike, lê ji bilî bîranînêñ xwe zêde tiştekî nanivîsîne. Ew weke çîroknivîs derdikeye pêş, lê di hemû jiyana xwe de bi tenê çend çîrokan û hinek nivîsêñ din dînivîsîne. Osman Sebrî bi nasnaveke şairî û zimanzanî derdikeye, lê hemû şîr û nivîsêñ wî bi tenê pirtûkekê dadigirin. Rewşa Qedî Can û Reşîdê Kurd ji ya Nûredîn Zaza û Osman Sebrî ne cûda ye. Herçiqas di avakirin û geşkirina kurdiya nivîskî de keda Celadet û Kamuran Bedir-Xan gelek e jî, lê gava em wan didin ber nivîskar û întellektuelêñ dema wan em dibînin ku wan jî kêm tiş li dû xwe hiştine.

Ger em derbaşî xebatêñ întellektuel û nivîskarêñ kurd yêñ salêñ şestî bibin, em ê bibînin ku rewşa wan gelekî dişibe rewşa nivîskar û întellektuelêñ kurd yêñ salêñ sihî. Faîq Bucak şîran dînivîsîne, li gorî dema xwe şîrên gelekî baş jî dînivîsîne, lê mixabin, hejmara şîrên ku dînivîsîne, tişte ez dizanim, bi yêñ çapkirî û neçapkirî, pirtûkekê jî danagire. Kemal Badîlî mîna zimanzan derdikeye lê berhemêñ zêde li dû xwe nahêle. Hetta Musa Anter bi xwe jî, li gorî demdirêjiya xebata wî, berhemêñ ku li dû wî dimînin, gelekî hindik in. Gava mirov vê rewşê tîne ber çavan, mirov dibîne ji ber kêmberhemî û nekontunîtêya nivîskar û întellektuelêñ kurdan yêñ do, di întellektueliya kurdî ya îroyîn de krîzek xuya dibe.

### **Fedekariya întellektuelêñ kurdan**

Gelo mirov dikare sûcê mezin têxe stûyê întellektuelêñ do? Ger mirov objektîv bifikire, rewşa wê demê bîne ber çavan û întellektuelêñ wê demê li gorî wê demê bi-

nirxîne, mirov ê bibîne ku wan ji hêza xwe bêtir ji kirine. Ew bi hejmar hindik in, lê di aliyê kapasîteya întellektuelî de xurt in, ew ji bo gel dixebeitin, lê neyarên wan ew û gelê wan ji hev bi dûr xistine; ew sîrgûn bûne, li Stembolan in, li Şaman in, li Kahîreyan in... Dixwazin bigihîjin gel, lê nikarin bigihîjinê. Bang dikan, lê banga wan di qirika wan de dimîne. Ew dîsan ji dev ji dozê bernadin, heta mirina xwe li ber xwe didin. Musa Anter bi kalîtiya xwe tê kuştin. Osman Sebrî bi kalîtiya xwe li Şamê wefat dike. Celadet Bedir-Xan li Şamê wefat dike. Gora Qedrî Can li Şamê ye. Cegerxwîn li Swêdê diçe ser dilovaniya xwe. Nûredîn Zaza li Swîsreyê xatir ji me dixwaze. Îhsan Nûrî Paşa li Îranê... û bi vî awayî liste dirêj dibe.

### **Întellektuelên serdestan**

Ji aliyê din ve em dibînin întellektuelên serdestên kurdan dibin hêsîrên ideolojiyekê, dibin dûvik û mirîdên mirovekî, bi navê laşîzm û sivilîzasyonê, li qetliem û talankirina mafêni mirovî temâsevan dimînin. Yanî em li welatên serdestên kurdan pêrgî întellektuelên mîna Voltaire ku xerabkirina Palatinkê mehkûm dike, lidij-derketina Renê ya wahşeta Napoleon, Sartreyê ku mafê Cezayirê tîne ziman, Nietszsheyê ku li dijî xedariyên ku alman li firansizan dikan, nayêñ.

Nivîskarê tirk Azîz Nesîn, di pirtûka xwe ya bi navê "Em întellektuelên tirsonek" de, mînaka profesorekî fransiz dide ku ew bi çi awayî nerazîbûna xwe ya polî-tîkaya fransizan ya li hemberî Cezayiriyan, tîne ziman. Profesorê fransiz, cubeyê xwe yê profesoriyê davêje û dibêje heta ku fransiz di nava erda Cezayirê de bin, ez hew vî cubeyî li xwe dikim. Ev kirina profesorê fransiz, ji bo mirovatiyê, ji bo rû-meta întellektueliyê mînakeke pir baş e. Lê ji aliyê din ve, herçiqas Azîz Nezin yek ji întellektuelên tirkan e ku li dijî desthilatdariya Tirkîyeyê carcaran serî hildaye ji, mirov serîhildanêñ wî yên ji bo kurdan, yên ji bo ziman û nasnava kurdan kêm dibîne.

### **Întellektueliya kurdi ya salêن heftêyî**

Di salên heftêyî de, bi pêla cepîtiyê re, li bakurê welêt, tevgereke xortan ya xurt ges bû. Tevger ji unîversîteyan derket û li seranserî welêt belav bû. Li bakurê welêt, heta wê dîrokê, tevgera herî ji întellektueliyê re amade bû pêk dihat. Di wê demê de, ji aliyê xortan ve felsefe, siyaseta dinyayê, çînayetî û berxwedanêñ gelan hem dihatin xwendin, hem ji gelekî li ser dihate munaqşekirin. Di wan salan de bi dizî û eşkere gelek belavok, gelek kovar û rojname derketin. Ji her grûp û partiyê, xor-

tan bi kolektîvî dixwendin, tiştên dixwendin li ser dipeyivîn, li ser şiroveyên cihê dikirin û jîmnastîkeke baş ya mîjîyê xwe yê terr dikirin. Lê ci heyf ku ew tevgera xurt, ji pêdaketina problemên kurdan yên bingehîn wêdetir, ji xwe re pêdaketina pirsgirêkîn çînayetî û îdeolojî bingeh girtibûn. Di netîceyên munaqeşeyen sert de, xwîna bêhejmar xortêñ kurd û intellektuelêñ pêşerojê hate rijandin. Netîceyên xebatêñ salan, bi hatina 12'ê ilonê re, bû sıfir. Yanî, xortêñ kurd ku li ser riya intellektueliyeke unîversal bûn, di dibistanêñ tirkan de, bi îdeolojiyeke fermî ya yekpeyayî hatibûn perwerdekirin, paşê bi wê riyê, çepîtiyeke çewt û anthumanîst seri hildabû. Peyivandina bi zimanê kurdi li gelek der û doran mîna nîşana nezanî û paşdemayînê dihate dîtin, nivîsandin û pêdaketina edebiyata bi zimanê kurdi mîna nasyonalîzmê dihate dîtin û bi çavekî bêqîmet lê dihate temaşekirin. Lidarxistina rojname û kovarêñ xwerû bi kurdi qet nedihate fikirandin, avakirina sazgeh û mueseseyen kulturî û neteweyî nedihate bîra kesî, ji bo weşandina berhemên klasîk, vejandina folklor û urf û adetên kurdan tiştên zêde nedihatîn kirin, lê belê ji aliyê din ve xortêñ kurdan bi mîrxasiyeke bêhempa di nava siyasetê de bûn, ji aliye karbidestan ve dihatin girtin, dihatin îşkencekirin û heta dihatin kuştin jî.

Ger em ji aliyê kulturî de kirasekî li intellektuelêñ wê demê bikin, ew tîpa intellektueliya kurdi ya wan salan, tîpa qehremanê Turgenyev, Bazarov tîne bîra mîrov. Bazarov li dijî adetên kevin derdikeve, xwe ji dê û bavê xwe bi dûr dixe, tiştên civatê yên kevin încar dike, her tiştî ji xwe dest pê dike, dixwaze her tiştî ji bin de biguhere. Ew qîma xwe bi tu tiştên kevin nayne, qerf û tinazêñ xwe bi tore û adetan dike, ji hisiyetê dûr e. Bi gotineke din ew înkarkirê kevnekultura xwe ye, nîhîlistek e.

Nîhîlîzmeke Bazarovane li ba gelek intellektuelêñ kurdan jî peyda bûbû. Loma ji ew gelekî ji xelkê bi dûr ketin, ji nasnava xwe bi dûr ketin, riya bajarvanî û medeniyetî di başbikaranîna zimanêñ serdest de dîtin. Herçiqas piştî cûntaya 12'ê ilonê, piştî hilweşandina sosyalîzma reel û bi derketina intellektuelêñ kurdan ya derveyî welêt, ev tewra han hebekî hatibe guhertin jî, dîsan, mîrov bi hêsanî pêrgî intellektuelêñ bi wî celebî tê.

## Intellektueliya kurdi li Swêdê

Ji xwe munaqeşeyen ku iro di derheqa pirsgirêka intellektueliya kurdi de dibin, bêtir li ser xebatkarêñ kulturê yên şeniyêñ Swêdê ne. Piştî hatina cûntayê û bi darbexwarina tevgera kurdi û tevgera demokratik li Tirkîyeyê, komek siyasetvan û tê-

koşerên kurd xwe li Swêdê girtin. Swêd, welitekî demokratîk û plural e. Li Swêdê ji bili dezgeh û mueseyênu ku alîkariya perwerdeya bi zimanê cûda yên zikmakî dîkin, dezgeh û mueseyênu ku piştgiriya xebatên kulturî jî dîkin hene. Ji bili vê ji hebûna demokrasiyê, hebûna bi azadî fikirandinê, kir ku mirovên kurd jî sûdeke ji vê rewşê bigirin û hinekî adapteyî kultura demokratîk bibin. Kurdên hatibûn Swêdê, li welatê xwe xwende bûn, di nava siyasetan de bi salê dirêj xebitbûn, di ber fîkrênu xwe de hatibûn girtin, îşkence dîtibûn, li ber xwe dabûn. Gelek ji van celebmirovan li Swêdê, êdî ji pêdaketina îdeolojî û siyasetê wêdetir, ji xwe re riya pêdaketen û mijûliya ziman û kultura kurdî girtin. Di sazgeh, komele û mueseseyênu ku ava kirin de, zimanê xwe yê fermî kirin zimanê kurdî; broşur, belavok, kovar, rojname û pirtûkên xwe bi kurdî derxistin û kurdî kirin zimanê xwe yê malê, kirin zimanê zarokên xwe yê perwerdeiyê. Di vê prosesê de, berberiya ji kevnesiyasetê dihat, car caran di jiyana kulturî de jî xwe nîşan dida û hê jî xwe nîşan di-de. Lê her çawan be, li Swêdê dest bi nivîsandina romana kurdî, çîroka kurdî, şîra kurdî, giramera kurdî bû; dest bi derxistina kovarên kurdî, rojnameyên kurdî û pirtûkên kurdî bû. Vê xebata deh-panzdeh salane, di warê kulturî de, bû mijara munâqeşeya termên *rônesansa kurdî* û di kurdî de *ekola Swêdê*. Piştî Celadet Bedir-Xan û ekola wî, intellektueliyeke kurdî dest bi geşbûnekê kir. Ji xwe, munâqeşeyen iro di nava kurdan de li ser intellektueliye kurdî jî têne kirin, ji ber destpêbûna kemilandina intellektueliye kurdî ya xweser e. Ji vê intellektueliye kurdî hem tê xwestin, hem jî hesab jê tê kirin.

### Berpîrsiyariya intellektuelên kurd

Îcar mirov dikare bipirse gelo intellektuelên kurdan iro berpirsiyariyên xwe yên civakî û wijdanî bi cih tînin? Di demeke ku civaka kurdî serûbino dibe de, di demeke urf û adetên sedsalane wenda dibin de, di demeke ku em dibin şahidê kuştina bi dehan nivîskar û rojnameyanê kurdan, bi sedan xwenda û welatperwerên kurdan; di demeke ku rojnameyên kurdan têne bombekirin de, intellektuelên kurdan ci dîkin? Ew ji raya giştî re ci dibêjin? Ew di vê derheqê de xwedîyên fikreke çawan in? Di bersivêvan pirsan de em dibînin ku intellektuelên kurdan li hemberî bûyerên civaka xwe, li hemberî trajediya li welatê wan pêk tê sar in, dûr in, xwe naxin nav. Bawer dîkin gotina wan pere nake, rola xwe biçûk dibînin, bi hêza xwe nizanin. Ev sarî û têkilnebûna intellektuelên kurdan ya civak û bûyerên welatê wan, ji başiyê re "baş", ji xerabiyê re "xerab" negotina wan, wan di civatê

de bêfonksiyon dihêle. Ew loma jî dîbin hedefa rexneyên tûj. Divê, di rewşa îro de, ûnîtelîktuelêñ kurd çiqasî dûrî partî û rêkxistinan bin jî, ew li hemberî bûyerêñ we-latê xwe bêînsiyatîf nemînin, divê ûnîtelîktuelêñ kurd otosensura li ser xwe biavê-jin, bi azadî û serbixweyiya xwe, li gora xwe pirsgirêkan binirxînin û şirove bikin, jê dûr nemînin, lê tevlî bibin, nedin dû şâsiyan, lê riyêñ rast pêskêş bikin. Gava ûnîtelîktuelêñ kurdan dûrî pirsgirêka kurdan bin, dûrî bûyer û guhertinêñ welêt bin, ji her tiştî re bibêjin ji min re çi, wê çaxê wê heqê wan û rexneyan jî bi sînor bibe. An jî wê rexneyêñ wan cidî neyên girtin. Gava ew li gorî prensibêñ xwe berpirsiyariyêñ xwe yên bingehîn bi cih bînin, ew ê gotina wan jî di civatê de pere bike, ew ê bi hêsanî bikarîbin serok û birêvebiran bidin ber pêla rexneyan û wê rexneyêñ wan jî cihê xwe bigirin.

### **Antî ûnîtelîktualîzm**

Lê divê ev kêmasiya ûnîtelîktuelêñ kurdan, bi antî ûnîtelîktuelîzmê ve neyê girêdan. Antî ûnîtelîktuelîzm ramaneke totalîter e, nedemokratîk e, ji tolerans û pluralîzmê bitirs e, hovîtiyê di hundurê xwe de dihewîne. Antî ûnîtelîktuelîzm civatê ber bi cî-haneke tarî ve dajo, balansa pêşdeçûnê têk dibe û cih li nezan û şelafan fireh dike. Antî ûnîtelîktuelîzm li bejna sîstemêñ fundamentalîst, dîktatorên çep û rast û iđeolojiyêñ fanatîk tê. Antî ûnîtelîktualîzm dûrî fikra demokratîk, dûrî pêşketin û guhertinêñ pozitîv e.

Ji xwe di civakeke mîna civaka kurdî de, ku gelekî hewcedariya wê bi hebûn û pîrbûna ûnîtelîktuelan heye, divê li hemberî ûnîtelîktuelêñ ku hene, bi sebir û bi bêhnfirehî bête hereketkirin, li wan xwedî were derketin, hemêz ji wan re werin ve-kirin. Bi qasî ji wan tê xwestin, divê ewqasî jî alîkarî bi wan were kirin. Bi qasî ku hewcedarî bi wan heye, ew jî ewqasî hewcedar in.

Erê, digel hemû zehmetiyan, di dawiya sedsala bîstan de, ûnîtelîktueliyeke kurdî li ber zayînê ye... 

# Ronakbîr û ronakbîrî!

*Rojan Hazim*

Pirsa intellektualiyê anjî ronakbîriyê di her demî û her civatê da hatîye axivtin û riberizên kûr û fireh li ser hatine kirin. Lî belê, her kesê anjî aliyeke li gorî xwe mana kiriye û çu caran konsensusek jî pêk nehatiye li ser vê pirsa ronakbîriyê!: Gelo ci ye ronakbîrî? Anjî kî ye ronakbîr?...

Ravekirina vê bêjeyê relativ e û li gorî her dîtin û her kesê tête guharthin. Her kes anjî aliyeke ji pencereya xwe berê xwe dide vê pirsê. Her kes anjî her aliyeke li gorî şertên xwe, têriya zanîn û armanca ramana xwe manayekê li vê bêjeyê bar dike. Ji ber hindê, em jî dê ji pencereya xwe lê bi awayê rastiya relativiteya mana kîrinê û bi çavekî objektîv li ser vê pirsê rawestin. Helbet divê li bersiva vê pirsê jî bigerin: Rol û erkên ronakbîr ci ne?...

## Zelalkirina bêjeyê

Zelalkirina bêjeyê jî girîng e. Hindek “Rewşenbîr” dibêjin... Ev bêjeye şaş bi kar têt. Di farisî da “Roşenfikir” tête gotin. “Roşenfikir” tekabulî “Ronakbîr” dike. Lî ev “Rewşenbîr” manayê nade û xelet e. Demê em bêjeya “Rewşenbîr”ê ji aliye morfolojiya ziman ve jêk derêxin û mana bikin eve jê derdikeve: “Rewş” manaya “weziyet, hal”ê dide, “en” jî paşkît e û “bîr”ê jî li ser bikin; hingê “Rewşenbîr” manaya “halbîr” anjî

“wezyetbîr” dide ku çend manayake keş e! Di bingehî da, “Rewşen” forma xirabbûyî ya “Roşen”ê ye. Lewma divê ev bêjeya “Rewşenbîr” bête terk kirin. An bila wekî forma farisî anku “Roşenfikir”ê bi kar bînin; anjî bila forma “Roşenbîr” bi kar bêt ku bi soranî jî “roşenbîr” tête gotin neku “rewşenbîr”! Anjî bi kurdîya pake nûjen anku “Ronakbîr” bi kar bêt... Li vê derê bingeha bêjeyê “Ronahî” anjî “Ronak” e ku tam beramberiya “Roşen” a farisî dide û herdu jî manaya ronahiyê didin ku di ferhenga Pehlewî da jî “rosn” e û diyare an “roşin” anjî “roşen” tête xwandin. Herweha di ferhenga Avesta da jî ronahî anjî ronakî wekî “roçine” û “roxşine” derbaz dibe. Vêca li ber van nimûneyan jî xuya dibe ku di kurdî da bingeha bêjeyê ya rast “ronahî” ye anjî “ronak” e ku hemu jî “roj anjî ro” û ronahîya wê hatine afirandin. Ji xwe wekî bêjeyek tête çêkirin, li ser manaya bingehîn ava dibe. Ronak, ronahî ye. Belêm “Rewş” wekî me li jor jî gotî “hal û weziyet” e... Bîr, li ser ronahiyê tête ava kirin û bêjeya ku manaya “ronakbîr” dide tête çêkirin. Gelo bo ci nebûye “ronahîbîr”? Ew li milekê, belêm wekî term “ronakbîr” çêtir lê hatiye ku ji xwe di kurdîya nûjen da jî “Ronakbîr” bi kar têt. Vêca tercîha me jî dê li ser bêjeya kurdî be û ya rast jî ev e: Ronakbîr!.. Ronakbîr, ew manaya ku em li hêviyê ne, di-de; anku kesê anjî kesa ku bi bîr û ramana xwe ronahiyê dide pêşiyê, ronahiyê dijene û diteyisîne... (°)

## Aksiyon û berhemeye mejî

Di xwezayê û sistemên peywendiyêñ hebû-nen jînde da her kiryar xwudan manayek e û beramberî wê kiryara xwe bi bêjeyekê ve tête binav kirin. Di mirovi da navenda aksiyona hiş, bîr û ramanî, organê mejî ye. Aksiyona hiş û bîrî, ji wê navendê diafire û dîsa ji wê derê tête idare kirin. Ji bo jiyana bi mana û aksiyon, rola bingehîn ya mejî ye. Li vê derê tiştê berçav ew e ku hiş û bîr wekî heyiyeke xav, heyiyeke potansiyel di mejîyê mirov da bicih e. Gava mejî bi zanî-nen nû ve tête bar kirin, hingê dikeve aksiyonê û wekî berhem dirije berahîka mirov anjî mirovahiyê û berê mejî êdî wekî hiş û bîr, wekî raman tête bi nav kirin. Jêdera vê xalê ew e ku; hiş û bîr û raman, aksiyon û berhemên mejîyî ne. Ev aksiyona mejîyi, karê mejîyi peyda dike û ev kare jî berê mejîyî pêktîne û ev berhemeye digihe xwezayê û mirovahiyê. Ev berê ku ji aksiyon û kar kîrina mejîyî derdikeve, heke bikêrî nûkirin û pêşveçûna xwezayê û mirovahiyê bêt, hingê ew dibe ronahî ji bo rojê û paşerojê. Ev e karê ronakbîrî. Heke her aksiyon û kar kîrina mejîyî, berê ronahî kîrinê nade. Divê berê mejîyî, berahîk û pêşiyê geş û ronak bike. Kesê anjî kesa ku di vê sirkulasyona karê mejîyî yê ronakkirinê da cih digire, karê wî anjî wê, karê ronak kîrinê anku ronakbîriyê ye. Vêca heke mejî di prosesa berhemdayîna ku pêşî û berahîkê ronak dike da nebe, ew encameke ronak kîrinê na-de. Nîşan anjî pîva ronakî û neronakiyê;

heke berê mejiyî, pêşketin û geşiyê bo xweza û mirovahiyê diafirine hingê ronakî ye. Heke berê mejiyî, di parastina statukoyê da be û xizmeta pêşketin û geşiya xweza û mirovahiyê neke hingê ew neronakî ye. Mirovê ku di kar û xebata mejiyî da; heke ew berê ku ji mejî derdikeve, nede xizmeta pêşketina xwezayê û mirovahiyê, ew mirov ne mirovê ronak kirinê ye anku ne ronakbîr e. Ji ber ku berê mejiyê wî, geşî û pêşketinê, başî û qenciyê ne bo xwezayê ne jî bo mirovahiyê naafirîne, xizmeta tarîkiyê dike.

Xweza û jiyan ne statîk e, dînamîk e û her di aksiyonekê da ye. Ev aksiyone ber bi pêş e. Di vê evolusyona xweza û mirovahiyê da heke kar û xebata ku xizmeta pêşketinê neke, hingê ew aksiyon dibe bend û asteng li ber vê evolusyonê û xizmeta parastina demê têdayî dike ku ev bizave bikêrî hêza ku dixwaze prosesa pêşketina xwezayê û mirovahiyê direng bihêle, têt. Heke mirov, zanîn û têgihîna xwe di xizmeta pêşketina xweza û mirovahiyê da bi kar bîne, hingê ew ronakbîr e. Ev kare dibe ku di warê pêşketina ziman, perwerde, edebiyat, kultur, civaknasî, felsefe, hiquqê da be anjî di warên dî yên zanyariyên pozitîv û teknolojiyê da, bi kurtî di hemû branşen zanyariyê da be ku xizmeta pêşketina xweza, mirov, mirovahî û civatê dikin...

## **Xwandalî û ronakbîri**

Bi giştî tête zanîn ku ronakbîrî di dabeşiya civatê da kategoriyek e. Ev kategoriye ne

homojen e. Zemînê wê ji çîn û kategoriye cuða pêkhatiye. Lewma jî pêkhatina wê heterojen e. Ev rewşê dibe sebebê bîr û ramanê cuða di navbeyna ronakbîran da ku eve tiştekî normal e. Ji kûrahiya sedsalan û pêda û heta iro baskanê peyda bûye di navbizava ronakbîriyê da û eve iro jî heye û dê her jî hebe. Di bizaveke ronakbîriyê da kes li hêviya "yêkdengiyê" nabe helbet! Ji duhî heta iro bi sedan ekol û cereyanen bîrî û ramanî çêbûne di navbeyna ronakbîran da. Ji baskenî filozofî û fizikê bigirin heta dîrok, edebiyat, pişê, huner û gelek mijarên dî, ekol û cereyan peyda bûne, bi sedan mirov li dor van pêkhatina civiyane û van ekol û cereyana, tesîrên cuða li ser mirovahiyê kîrine û ev prosese li goreyî van şertên cihanê hêjî jî dom dike û ev herikîna bizava ronakbîriyê dê heta hetayê jî dom bike. Digel ku ev cudahî û nuansên ramanî ku carina çeperên van cudahî û nuansa gelek xurt in, di navbeyna wan da hene û divê jî hebin, belêm di helwest danîna ji bo xizmeta pêşketina xweza û mirovahiyê da, nêzîkî hev in û di rêza mirov û xelkê hejar, bindest û zorlêkirî da cih digirin. Jêderâ vê xalê jî ew e ku di bîr û helwesta ronakbîr da humanîzmeke bilind heye û divê jî hebe...

Hindî xwandin û nivîsandine; ew bi serê xwe bizavék e. Ev bizave ji bo bizivandina mejî û potansiyela mejî karekî sereke ye. Hebûna potansiyela mejî, bi xwandin û nivîsandinê derdikeve meydanê û ev enerjiya potansiyel dikeve bizavê û dibe enerjiya kinetik. Afiranderiya mejî piştî vê prosesê ber

dide û ev berhem encama bizivandina potansiyela mejî ye. Li vê derê; dereca xwandin û nivîsandinê, ne pîveke bingehîn e. Xala bingehîn pişti bi kar anîna potansiyela mejî, afirandina berê ku di xizmeta pêşketina xweza û mirovahiyê da ye. Mirovekî bi salan xwandî jî dibe ku di afiranderiya karê mejiyî da tiştek ne kiribe. Lê li aliyê dî kesek dibe ku kêm sala xwandibe lê potansiyela mejî di derecyeke bilind da bi kar anîbe û berhemên ku di xizmeta pêşketina xwezayê û mirovahiyê da afirandibin. Lewma her xwanda ne ronakbîr e. Wekî ronakbîr bi hejmara xwandyiya hatiba hejmartin hingê welat hene li cihanê ku civata wan nêzîkî seda sed xwanda ye. Vêca xwandyâ karekî bingehîn e, belêm bi serê xwe ne nîşana ronakbîriyê ye... Heke mirovekî xwanda, di prosesa xwandina xwe da tişte ku hûbûyî û zanî, di pêşketina xwezayê û mirovahiyê da bi kar bîne hingê ew ronakbîr e. Ji ber ku bi hiş û bîr û ramana xwe xizmeta ronakî û pêşketina xwezayê û mirovahiyê dike.

Heçî nivîskarî ye; helbet di ragihandina bîrî û ramanî da karekî girîng e. Kes, bi vî awayî bîr û ramanen xwe dirêje ser kaxezê û bi mirovahiyê ra digihîne. Lewma nivîskarî karekî wisa ye ku bêyî aksiyona mejiyî nabe. Nivîs encama vê aksiyonê ye. Nivîskarî, parçeyekî ber dana mejiyî ye. Belêm, ew pîvana ku me li jor gotî bo nivîskari jî derbaz dibe. Gava nivîskar bi berê xwe yê mejiyî ve ku eve helbest, çîrok, novel û roman anjî lêkolînek dibe, xizmeta pêşketinê

û geşiyê bike hingê dibe ronakbîr ku eve jî herweha helwesta ronakbîriyê ye.

Eve ji bo rojnamevan jî derbaz dibe. Heke rojnamevan bi ragihandina nûçe, lêkolîn û komentarên xwe xizmeta vê prosesa pêşketin û geşiyê bike û helwesta xwe bi vî awayî nîşan bide, hingê dibe ronakbîr. Herweha hunermendên tiyatro, sinema û muzîkê, wêneçêker û filmkêş û kesen dî yên li ser branşen cuda kar dikin jî bi van norm û elementa dixin ronakbîr...

Mirovek dibe ku di branşa xwe da gelekî xwanda, zana û jîr be, belêm heke bi encam û ber dana karê zanahiya xwe, xizmeta rawestandina pêşveçûna xweza û mirovahiyê bike, ew ne ronakbîr e!

Her zana jî ne ronakbîr e. Di dîroka mirovahiyê da li ser hemû branşan, bi sedan “zana û alim” derketine ku bi zanîn û kiryarêñ xwe bûyne asteng li ber pêşveçûna mirovahiyê. İro jî hene û karê wan ne xizmeta ronakiyê ye, xizmeta tarîkiyê ye. Ev kese çawa dixin ronakbîr! Eve bi timamî tarîkbîr in! Belê, tarîkbîr!

Ronakbîr jî ber ku di nav bizava bîrî û ramanî da ye; hingê divê di nav têkoşîn û berxwedanê jî da be. Ronakbîr bi encama bizava bîrî û ramaniya xwe hem şertên têda, hem jî yên berê û paşê, hildigire bin projektor û zirbîna xwe û dide ber pirsa ku bo xweza û mirovahiyê encamên pozitîv jê derêxe. Ronakbîr nikare serî li ber şertên têda biçemîne. Ji xwe heke çemand hingê ew ne ronakbîr e. Yêk ji hêmanen sereke yên ronakbîriyê ji xwe ev serhildaniya dijî

şertên heyî ye. Ronakbîr divê çu cara statukoyê nepejîrîne. Ca an bo serast û durust kirina wê statukoyê, anjî bi timamî rakirina statukoyê divê têbikoşe. Li vê derê divê encamek baş bête xuya kirin; berxwedan û têkoşîn divê firşikê bîr û ramana ronakbîr be. Ronakbîr bi hiş û bîr û ramana xwe divê ï azad be û li hemberî hemû tabuya, helwesta xwe nîşan bide. Ji ber ku ronakbîr pirs-ker e û di vê pirskeriya xwe da divê hem ï bi rik hem jî serbest be û ne di bin bandûra desthilatên fermî da be û li goreyî wan pozisyonê wernegire. Anku divê ne di bin kontrola otorîteya dewlet û hukumetê û hetta partiyên politîk da be. Helbet ronakbîrek jî dibe ku meyildar hetta aktivîstê organizasyoneke politîk be ku iro digel welatê me, li welatên dî yên cihanê jî gelek ronakbîran di nav bizava politîk da cih girtine. Belêm dîsa ronakbîr, di bîr û helwesta xwe da heke ï girêdayî be, hingê nikare erkên xwe yên ronakbîriyê bi dilê xwe bîne cih. Di bingehî da biçûk mezin hemû organizasyonên politîk ku digel partîyan, dewlet û hukumet jî organizasyonên politîk in, di vê vî zemînê azad û demokratik peyda û amade bikin daku riberizên bîrî û ramanî çebin ku pêşdaçûn pêkbêt. Lê dîsa, li goreyî pratîka heta iro, bi baweriya me ronakbîr, di zemînên statukoyî da nikare erkên xwe yên ronakbîrî û normên ronakbîriyê bi dilê xwe, bîne cih. Helbet ev xale bi serê xwe mijarek e, lewma em vê çendê niha derveyî riberizê dihêlin... Ya girîng ew e ku divê ronakbîr ne tenê di çarçova bîrî û ra-

manî da be, herweha bikeve prosesa pratîkê ku ew jî berxwedan û têkoşîna di rêza gel da ye. Ronakbîr bêyî van hêmana nayê bîr û divê neyê bîr...

### **Erkên ronakbîriyê**

Ronakbîr bi van xasyeta, rûmet û namusa civatê û demê ye. Ronakbîr bêyî wan hêmanen ku me li jor hejmartî nikare erkên xwe yên ronakbîriyê bîne cih. Ji aliyê van hêmana ve ronakbîr divê komple be. Ronakbîrê ku xwudanê van hêmana nayê wê manayê ku kesekî bêtixub û dijî her tiştî ye anjî agresîv e. Dibe ku sistema politîk û civakî ya ku ronakbîr têda, ew sistem be ku ya wî xiyal dikir. Lê ew bi wê qonaxê jî di vê ï têr nebe. Divê wê sistema ku bi dilê wî jî bide ber pirs û tîrên ramanî daku sistem di nav xwe da nerize û her ber bi pêş biçe û xwe nû bike. Jiyan ne rawestek e. Jiyan bi serê xwe bizav e, têkoşîn e. Li gorî vê prensibê ronakbîr divê destâ ji erkên xwe yên pirskerî û riberiziyê bernede ku xizmeta pêşkevtinê û ronahiyê bike.

Ronakbîr kedkarê mejî ye. Ew bi karê mejiyî ve mijûl e. Di vî kar û xebata mejiyî da divê individualist nehizire. Eve nayê wê manayê ku ronakbîri jiyanâ individualist na-be. Helbet jiyanâ kesînî ya ronakbîr jî dê hebe. Belêm ronakbîr divê individualist ne-be. Ew divê tenê bo xwe nehizire û bijî. Ew adeta pêdiviyê civatê û xwezayê ye ku di aksiyona mejiyî da berhemên mejiyî bide û bi vê encamê xizmeta gesî û pêşketina xwe-

zayê û mirovahiyê bike. Eve tête wê manayê ku ca an di xwezayê da anjî di civatê da çi nebaşî hebin divê beramberî wan bi zanahî raweste û ne tenê rawestan, herwisa çareseriya asteng û nebaşîyan jî bibîne anjî mil bide wê bizavê... Demê mirov berê xwe dide van erk û hêmanên ronakbîr û ronakbîriyê, bivê nevê tiştek tête ber çavan; gelo ev fotografê ideal yê ronakbîr di rastiya jiyanê da heye anjî dê hebe? Helbet divê relativîteya her baskên jiyanê ji ber çavan neyê dûr kirin. Belêm digel hindê jî, ev portreya ideal divê hebe anjî divê bête xwastin. Hetta mirov dikare bêje ku di nav van sedsalan da, gelek nimûne di nav civatê da peydabûne. Heke xweza û mirovahî iro gihiştibe vê qonaxê, digel kanunên xwezayê û xizmeta mirov, belêm bi taybetî jî bi xizmeta bizava ronakbîran hatiye vê qonaxê. Kesên ku di her baskên zanyariyê da xizmeta pêşketinê kirine, keda wan heye di vê qonaxê da. Evolusyona xweza, jîndeyî û mirovahiyê dom dike û mirovahî hêj jî negihiştîye dereca têriya ku bo xwe kiriye armanc û ideal. Ji xwe ideal wekî heyva ser hesuyê ye. Demê mirov bi şev heyyê li ser hesuyê dibîne ku çend nêzîk xuya dike, belêm gava digihe wê hesuyê, heyy diçe hesuyeke dî. Îdeal jî wisa ye.

Ronakbîr gava gihişte idealâ xwe, ideal dîsa jê dûr dikeve û vêca divê bo wê idealê têbikoşe. Anku ideal bêtixub e û divê ronakbîr her di bizavê da be bo wê idealâ bêtixub. Îdealâ baş ew e ku gava mirov nêzîk bû dîsa dûr bikeve... Eve ji xwe prosesek e

û bi têkilbûn û aktîvbûna kedkarê bîrî û ramanî dê bikeve xizmeta mirovahiyê û timamî jîndehiyê li cihanê. Li kî derê neheqî, bêdadî, nerewayî hebe, ronakbîr divê bi dîtin, gotin û helwestê, xwe nîşan bide û bo dadî, rehetî, serfirazî û rûmetiya mirovahiyê û pêşketin û xweşiya xwezayê têbi-koşe.

Ronakbîr li beramberî dem û civata ku têda dijî û hetta digel xwezayê beramberî hemû jiyanâ jînde berpirsiyar e. Dîsa heke em bipirsin; gelo çend realist e ku kesek wisa bi erkên hinde giran ve bête bar kirin û berpirsiyariyê hinde mezin bêne dan? Belê, realist e. Ji ber ku ronakbîr ne tenê kedkarê mil û dest e. Dibe ku kedkarê mil û dest jî be. Belêm karê wî yê sereke kedkariya mejîy ye. Ew kedkarê mejî ye û karê wî hizirîna bo pêşketina mirovahiyê û ges û nûkirina xwezayê ye ku bikeve xizmeta mirovahiyê. Vêca demê mirov ronakbîr hinde idealîze bike, dibe ku wî anjî wan adeta dûrî civatê bike û dane ser tahtê çiyayê beresman. Heta derekê ev nêzîkbûne jî rast e. Ji ber ku ronakbîr, digel hemû dilnizmî û sa-detiya xwe, lê dîsa bi kar û berpirsiyariya xwe li beramberê xweza û mirovahiyê di pozisyonike elîtî da ye. Bivê nevê ronakbîr bi kiryarê xwe yên berhemdayîna mejîy, dikeve pozisyonike elîtî. Helbet demê em dibêjin "elît", ne bi manayeke negatîv bi kar tînin ku xwe ji civatê dûr bikin û xwe li ser ewra bibînin. Nêxê! Digel ku ew mirovîn bijare ne di civatê da, belêm eve ne imtiyaz e û ji xwe yêk xasyeteke herî girîng

hetta mirov dikare bêje ku yêk hêmaneke herî girîng ya ronakbîr jî ew e ku heke bi zanîn û têgihîna xwe bi dilnizmû û sadetiya xwe jî nebe nimûne, ew nikare bibe ronakbîr. Ew digel têrzanîna xwe herweha bi xasyetên xwe yên baş û qenc jî bijare ne û divê wisa bin. Bi vê portreyê ronakbîr nakevin dereca "melayket, ewliya û derwêsa"! Ji xwe ev bêjene, bêje û xasyetên mîstîk in ku ronakbîr bi van xasyetan nayêni bi nav kirin. Li vê derê xalek dî jî derdikeye ber çavan: Ew jî; ronakbîr bi têriya zanîna xwe herwisa dilnizmû sade ye jî...

Ronakbîrî, di her baskên zanyariyê da heye. Mirov nikare ronakbîriyê anjî ronakbîr tenê bi baskêkî zanyariyê ve çarçove bike û izole bike. Ji xwe ronakbîr ne ew kes e ku tenê bi edebiyatê ve mijul dibe anjî tenê nivîskar e. Di kîjan kar û xebatê da be û di kîjan baskê zanyariyê da bispor be bila bibe, ya girîng helwesta wî anjî wê ye. Li vê derê xaleke dî jî ya girîng derdikeye ku belkî xala herî girîng e: Helwesta ronakbîrî! Ji ber ku di pratikê da nîşana ronakbîr, bi helwest danînê derdikeye meydanê. Anku ronakbîr bi kiryara xwe anku bi helwestê, xwe nîşan dide. Herweha ronakbîr, di helwesta xwe da divê ne î hişk, asê, agresîv û negatîv be, lê herwisa divê ne î nermo, paşîf û belêgo jî be! Divê teraziya bîrî û helwesta xwe di pratikê da baş ragire...

Li aliyê dî; ronakbîrî û xwemsarî jî dijî hev in. Ji xwe ronakbîrekî anjî ronakbîreke xwemsar nayê hîzirîn! Kesekî anjî keseke ku xwe ronakbîr dizane, divê çavêni xwe li

pirs û pirsgirêkên civata ku têda dijî negire û pişta xwe nede bûyerên li dorberê xwe. Ji xwe heke kete xemsariyeke wisa, êdî cu ronakbîriya wî kesî anjî wê kesê namîne. Ronakbîr, afiranderê bîr û ramanê ye û ew bîr û raman divê xizmeta pêşketinê bike û herwisa xwudanê wan bîr û ramana divê li paş wan dîtina raweste û têbikoşel.. Ronakbîr, bi hiş û bîr û ramana xwe ya bijare û bi nîşan dana helwesta xwe, divê adeta gerillayê bîrî û ramanî be. Xweza, mirovahî û civat bi têkoşeriya bîrewer û ramanweran pêşdikeye ku ev çende rola wan jî mezin dike. Lewma heke mirov wan bi bêjeyeke leşkerî ve jî bi nav bike di cih da ye...

## II.

Di civata Kurdistanê da rewş çawan e? Daku riberizeke li ser tayê subjektîvî dernekeve em dê di vê birê da jî çarçoveyeke giştî danin. Gava çarçova teorîk hate danîn dibe ku herkes fotografekê têda bi cih bike. Eve jî awayek e! Heke bi vî awayî nebe, ji nav nayê derketin. Filankes anjî bêhvankes ronakbîr anjî ne ronakbîr e! Eve jî dibe, belêm ne metodekî rast e. Tiştek bingehîn danîna çarçova teorîk û nîşan dana helwesta pratik e. Êdî kî xwe di wê çarçovê anjî helwestê da dibîne ew dizane!.. Belêm tiştek heye ku divê mirov bi dengekî bilind bîne ziman; kesê anjî kesa xwe ronakbîr dizane; nîşan, zemînê pratikê ye û helwest e! Ev helwest danîne jî berçav e û ji aliyê xelk û civatê ve tête dîtin û sengandin...

Tiştekî giştî ye ku ronakbîr awêneya ci-

vatê ye. Civat di kîjan dereca pêşketinê da be, ronakbîrê wê jî paralelî wê pêşketinê ye. Heke mirov bi nimuneyekê piçekê konkret bike; mirov nikare li Kurdistanê li prototîpê ronakbîrê Fransayê bigere. Ji xwe lêgerîn û li hêviyê maneke wisa, bi serê xwe tiştekî şas e. Welatekî dagîr û neteweyekâ paşdahêlayî! Hetta dereceyekê ji aliyê hêman û heyiyên ronakbîriyê ve hatiye asimile kirin, bê xwandin û nivîsandin û gelek tiştên dî... Vêca ev e rewşa civata Kurdistanê. Helbet ronakbîrê ku di van şertan da gihiştî dê î çawan be? Di rewşeke wisa da hem li tîpê ronakbîrê welatên pêşketî geryan ne rast e, hem jî xwe biçûk dîtine. Her civat li gorî rewş û şertên xwe ronakbîrên xwe derdêxe. Digel hinde dezavantaja rewşa gelê Kurd û welatê Kurdistanê, lê dîsa ne cihê pesimizmê ye. Ji nav gelê Kurd bi hejmareke kêm jî be ronakbîrên di standarda cihanê da derketine. Gerçi eve jî ne hewceye. Bo ci ronakbîrê me divê di standarda welatekî gelek pêşketî da be! Divê li vê hêviyê jî neyê mayîn. Eve jî bi serê xwe kompleksek e, xwe kêm dîtine. Belêm wekî me gotî digel hinde dijwariyên gel û welat jî, ronakbîrên derece yêk derketine û bi têriya zanîn û bizava xwe dews û şopên xuya û baş li paş xwe hêlane ji aliyê bîr û ramanî ve. Di vî warî da heke navê Ehmedê Xanî bête gotin, xwepesinî nabe; hem jî ronakbîrekî bikalîte. Derketina ronakbîrekî wekî wî jî sedsala 17an, ku bi gotin û kiryarên xwe ve ronakbîrekî komple bû, bo gelê Kurd serbilindîyeke mezin e. Ew tam ked-

karê mejî bû. Ew xasyet û hêmanên bo ronakbîrekê me gotî li jor, yêk bi yêk di Xanî da têne dîtin. Wî bi bîr û ramana xwe ne tenê ew demê ku têda jiyaye, iro jî ron kiriye û ew ronahiya bîr û ramana wî dê dom jî bike... Heta sedsala zoan jî gelek ronakbîrên Kurd derketine ku li demê têda jiyanê dewseke baş hêlane.

Di demê modern anku sedsala zoan da jî nimûnê wekî Xanî têne berçav. Heke di serî da mirov, navêni Celadet Bedir Xan û Kamiran A. Bedir Xan bîne ziman di cih da ye. Herwisa Cegerxwîn û gelekên dî hene. Lî bo nimûne ev sê nave adeta sembolên ronakbîriyê ne di vê sedsalê da ji aliyê gelê Kurd û welatê Kurdistanê ve. Xanî jî, ew herdu birayên Bedir Xanî jî, Cegerxwîn jî, hem bi hiş û bîr û ramanên xwe, hem jî bi pratîkên xwe ronakbîr bûn. Bo gelê xwe hizirîn, bo gelê xwe li rîyên xilasiyê geriyan û bo gelê xwe sistemên rizgarbûnê pêşniyar kirin. Her di serî da jî, şerê tarîkiya li nav civatê anku nexwandahiyê kirin. Wan her ji destpêka hizirfîna xwe anku berhemdana mejiyî ve, xwe li beramberê gel û welatê xwe berpirsiyar zanîn û têkoşîn.

Lî belê, iro digel ku bizava gelê Kurd qonaxên mezin dayne pêşıya xwe û hetta derceyekê pêş jî ketiye, lê dîsa ji aliyê ronakbîriyê ve lawaz e. Mixabin ku eve realîteyek e! Hejmara xwandaya dibe ku zêde bibe û zêde jî bûye, lê ne teyisiye ser ronakbîriyê. Lewma iro hejmara ronakbîran kêm e di civatê da. Heke iro ronakbîrên di senga Ehmedê Xanî, birayên Bedir Xanî û Ce-

gerxwîn da kêm derdi kevin bête gotin eve neheqî nabe û hetta nîşan kirina rastiye kê ye. Nîşan kirina vê rewşê, tête wê

Manayê ku; Kurdistanê û bizava gelê Kurd hewcehiyeke mezin bi ronakbîran heye. Hem bi kesînî, hem jî bi rêxistinî. Helbet ev rewşa stewr divê nebe sebebê pesimîzmê. Rast e, civata Kurdi ji aliyê ronakbîran ve stewr e, lê li aliyê dî jî avisê ronakbîr û bizava ronakbîriyê ye.

Di dawiyê da divê tiştekî dî jî bête gotin ku; her ji sedsala ıyan bigrin heta vê sedsalê jî hevpişkiyeke ronakbîren Kurd heye ku ew jî dûriya ji xelkê ye. Ronakbîren sedsalê borî digel ku piranî di nav gel da dijîn, lê ji aliyê komunikasyona ronakbîrî ve dîsa jî dûrî gel bûn. Em bêjin ku wan sedsalê berê rewşê xirab bû, civat geleke paşkevtîbû, danûstandina xelkê bi hev ve kêm bû, sistema civakî û politîk ya civatê dest nedîda bizivînê, hat û çûn adeta nebû, aletên ku di vî warî da bêne kar anîn nebûn anjî kîmbûn û gelek sebebên dî... Ronakbîren wê demê ji ber van sebeb û dezavantajan nedîşyan gelek nêzîkî xelkê bibin. Belêm vê sedsalê û taybetî jî di çarêka dawî ya vê sedsalê da, ronakbîren Kurd bi piranî li ba-jér û metropolan dijîn ku imkanên komunikasyona ronakbîrî û nêzîkbûn û ketina nav xelkê bi zêdehî ve peyda bûne ku kabilîmukayesa demên berê nabe, lê dîsa ve ji xelkê dûr in. Eve bi serê xwe problema ronakbîren Kurd e ku bi sedsalane dom dike. İro divê ji vê çendê ders bête wergirtin û ronakbîr xwe nêzîkî xelkê xwe bikin ku bi

berê mejiyê xwe, wan ronak û geş bikin da-ku pêşkevtin çêbe û roja serketinê nêzîktir bibe.

Di hevoka dumahîkê da heke em gotinê piçek dî jî konkret bikin, eve forma nivîsa-rê xirab nake. İro meydana şoreşa Kurdistanê, nîşana rengdana helwesta ronakbîr û ronakbîriyê ye. Ronakbîren Kurd nikare ji vê erkê bireve. Heta ku ronakbîren Kurd li hêviya helwesta ronakbîren Tirk, Ereb anjî Faris be, divê di pêşiyê da helwesta xwe nîşan bide û organîze bike. Gava axivtin tête ser vê çendê bi taybetî helwesta ronakbîren Fransî û bo nimune jî ya J. P. Sartre tête dan ya di bûyera Fransa û Cezayîrê da. Rast e! Divê eve bête gotin. Belêm digel van, divê mirov li xwe jî vegere û pêşiyê xwe bibîne. Di kaře ronakbîriyê da helbet riberiz û jimnastîkên ramanî dê hebin û di-vê jî bêne kirin. Belêm, heke ev erke neyê-ne cih û li riberizên ser ewran bête geryan û dem bi van riberizên pûç û bêbin bête kuştin, eve revîna ji erkên welatparêziyê ye. Heke ronakbîren Kurd, di nav xwe da riberizê germ û kûr bike, bi vê yêkê xizmeta pêşketina şoreşê bike, hingê heq e ku li ser hemû mijar û baskên ronakbîriya cihanê jî biaxive û riberizê bike. Ronakbîren Kurd di-gel gotin û axivtina xwe; bi nivîsîna çîrok, novel, helbest anjî romanekê evînî û romantîk anjî yên sosyoreel anjî leyizeke ti-yatro û sinemayê, kêşana wêne û filmekê û riberiza li ser cereyanê cuda yên felsefi yên cihanê, dîrok û gelek mijarê dî, divê helwesta xwe ya ronakbîrî di warê rizgar kirina

gel û paşve standina welatê xwe ji destê da-gîrkeran da jî nîşan bide. Heke wisa neke, rewşa gel û welatê xwe li ber çava negire, vê yêkê nedane serê rojeva xwe û karê ronakbîriya xwe; hingê ew di nav karekî gelekî "luks!" da ye ku eve jî hêjayî ronakbîriyê nîn el..

Îro welatê Kurdistanê û gelê Kurd di demekî engizisyoneke nû da dijî. Ronakbîrên di demê kevne engizisyonê da ci li dijî zordariya desthilata dêrê û sistema politîk ya wê demê kirine, ronakbîrên Kurd jî divê hêj zêdetir dijî van sistemên neoengizisyonist yên îro bikin. Rûmet û namusa ronakbîrên Kurd di vê helwestê da ye.

Li milê dî; digel wêne û filmên xwezayê, jiyanê û mirovan û civatê yên sosyoreel, mijarê fantazîk, evînî û romantîk jî bila bêne kêşan, belêm wê zanyarî û jêhatiya xwe di rêza gel da û dijî dijmin jî divê bi kar bînin. Çîrok û novelên fantazîk û ser-pêhatiyan jî bila binivîsin, belêm rewşa gel û welatê xwe ya li ber çava jî bila birêjin ser kaxezê. Romanê eventurîst, evînî û romantîk jî bila binivîsin, belêm çalakî û berxwedaniya gelê xwe jî bila bikin destan û roman. Helbestê evînî û romantîk jî bila binivîsin, belêm yên rastiya jiyana gel û welatê xwe jî bila bi heyecaneke bilind rêz bikin. Bila tenê edebiyata rebenî û perîşaniyê nekin; bila li ser pêşketina gel û welat jî rawestin û gelek tiştên dî...

Belê! Li Kurdistanê ronakbîrî karekî zor e! Belêm, cu tişt bêyî bedelê bi dest nakeve. Dibe ku nivîskar û rojnamevanekî ronak-

bîr, di warê nivîsîna çîrok, novel, destan, helbest, nûçe, lêkolîn anjî romanekê da, hunermend di gotina stran anjî çekirina film û tabloyekê, leyizeke tiyatro û sinemayê anjî kêşana wêneyekê da; ronakbîrekî li ser branşen dî, di kar û xebatên branşî da negihe ya dilê xwe. Dibe ku demê xwe yê hizirîn, nivîsin û çekirinê ne bi timamî jî, lê nîvenîv bide ser karê rizgar kirina gel û welat. Belêm li hember vê berzehiya nîvenîv ya roman, novel, çîrok, nûçe, helbest, destan, stran, lêkolîn, tabloyeke rengîn, filmekî bi heyecan, wêneyekî balkêş, axivtin û karê xwe; welatekê bi dest diêxe. Welat û gelekî rizgarkirî eve hemû ne! ■

*Hezîran 1996*


(\*) Pahlawi Dictionary, D. N. MacKenzie

Ferhenga wêjeya Avesta, İhsan Behramî

**Nota Nûdemê:** Li ser daxwaza nivîskêr, em têkilî zimanê wî nebûne.

# Întellektuel û Întellektuelîzm

*Şahînê Bekirê Soreklî*



Pirsa întellektuelîzmê yeke kevnar e û bi hebûna merovan ve girêdayî ye. Merovê întellektuel xwediyê pêkaniyeke taybetî ye ku jê re "întellekt" tê gotin. Fêhmkirina vê pêkaniyê û analîzkirina mentiqî merovan ji lawiran cuda dike. Bi pêşveçûna dîroka merovan re pirsa întellektuelîzmê ji xwebêja xwe ya berê kûrtir û firehtir bû. Ev bûn bi hezaran sal ku zanyarên di civateñ gihîstînî şaristaniyeke bilind de xwe bi wê pirsê ve mijûl dikine, gelo merov dikare kê wek kesekî întellektuel bi nav bike.

Li gor Enseklopêdiya Britannika, hîn di dema Sokrat û Plato de, dora 400 sal b.z., ev pirsa ji bo zanyar û filosofên Yewnanistana kevnar yeke grîng bûye.

Di nav çarçeveke herêmî û teng de, pirsa întellektuelîzmê ta radeyeke mezin bi baweriya gelempar ya civatê û kesan ve girêdayî ye. Ji bo civateke olperest rêber û feqîyên olan kesên întellektuel in. Ev baweriya hîn di dema Misriyên kevnar de jî li holê bû. Napoleon ji haliyê xwe de întellektuelan wek afirmendên îdeolojiyê bi nav dike. Marksizm, li milê din, întellektuelîzmê bi îdeolojiyê ve girê dide. Lê Karl Mannheim (1893

- 1947) xwebêjek din dide û intellektuelîzmê. Li gor wî (Enseklopêdia Britannika, 1974, cild 9, r. 195), kesê intellektuel ê bikaribe ramanên xwe ji îdeolojiyê û çînatiya civatê biparêze. Bi dîtina wî, kesên intellektuel endamên komeke taybetî ne di nav civatekê de ku xwe naxin bin bandora metodolojiyê û îdeolojiyê, kesên wisa ne ku bîrêya zanibûna xwe, xwe dikin layiqe cîhekî bilind û dikarin bandoreke pozitîv li civatê bikin.

Gotinê naxwaze ku pirsa intellektuelîzmê di rojêne me de ta radeyeke mezin bi pêşveçûna civatê ve peywendîgir e. Di nav civateke ji perwerdebûnê bêpar mayî de, heye ku kesê pênûs di ber re, kesê dikare nameyekê binivîsîne wek kesekî intellektuel bête pejirandin. Wek nîşe, ta berî kurtemekê merovekî ku dikaribû bixwîne û binivîsîne ji haliyê gundiyyêne Kurd de wek "Mamosta" dihat binavkirin. Di nav civatine din de, kesê ku bikaribe di derheqê siyaseta herêmî û navneteweyî de çend gotinan bike merovekî "intellektuel" e. Lê di nav civatêne di warê perwerdekariyê de pêşve çûnî, em bibêjin di civateke wek ya Swêdiyan de, heye ku kesekî xwendina xwe di zanîngehê de kuta kiribe ji li gor pîvanên wê civatê ne kesekî intellektuel be.

Wek em dibînin ev pirsa yeke kûr û fireh û eger merov wê têxe munaqşeyeke akadêmî û felsefi ew ê ji hev bikişê û bidomîne, wekî ku bûn bi hezaran sal wisa ye, lê eger ji min bête pirsîn ka merov dikare di nav civata kurdî ya îroj de kê wek intellektuel bi nav bike, heye ku ez vê bersîva li jêr

bidim:

Merovê intellektuel ew kesa ye ku dikare pirsên civakî û siyasî yên gel û herêma xwe bi şêweyeke mentiqî fêhm bike û di derheqê cîhana me de xwedan zanistîyeke berfîreh be. Lê intellektuelekî wisa dikare wek zanyarekî bête binavkirin. Bi gotineke din, ew wek golekî ye ku ava xwe ji çeman digire û di nav xwe de kom dike. Întelektuelê mezin, li milê din, ew kesa ye ku dikare tiştekî pozitîv bide civakê, wek gola ku ava xwe bi rêya çem û rûbaran li nav zeviyan belav dike û bi encama vê yekê ev zevî şîn dibin û dibin çavkaniyêne xêr û bêrê.

Di nav Kurdan de pirsa intellektuelîzmê yeke nû ye. Bi dîtina min, wekî ku bindestbûna Kurdistanê bandora xwe li hemî haliyê jiyana me kiriye, herweha li vê pirsê ji kiriye. Pirsa intellektuelîzmê ji ta radeyeke mezin xwe bi siyasetê û têkoşîna neteweyî ve girêdaye. Wek mînak, berî çend salan hevalekî ev pirs ji min kiribû: Ma gelo kî rewşenbîr e (bi xwebêja intellektuel), pêşmergeyê li serê çiyan lê profesorekî Kurd yê di zanîngeheke Tirkan de di kar de?! Wek tête bîra min, min bersîveke bi vê xwebêjê wê demê dabû, "Profesorê Kurd, eger intellektuel be, yan na, ez nedizanim, ji ber ku wî û berhemên wî nedinasim, lê fersenda ku ew merovekî intellektuel be ji ya pêşmerge bêtir e. Pêşmergâyeti ne pîvana intellektuelîzmê ye. Heye ku em pêşmergeyekî wek merovekî azadîxwaz û têkoşer bidin nerxandin lê binavkirina her kesê pêşmerge wek intellektuel ne tiştekî di cîh de ye." Heye ku kesek li vir bipirse: Lê serokên rê-

xistinêni siyasi, yan dewletan? Ez ê bersîva vê şewepirsê bi pirseke din bidim: Gelo kî ji van herdu merovêna navdar yên neteweya frensi intellektuel in, Charles de Gaulle lê Jean-Paul Sartre? Hewceya bersîvdanê na-ke; tişte grîng ew e ku ji bo her yekî ji wan cîh û şaxekî taybetî heye di dîroka frensi de. Bi dîtina min, merov dikare Ehmedê Xanî wek intellektuelekî dema xwe bi nav bike ji ber ku wî berhemine pozitîv afirandine ku hîn îroy jî bandora wan li civatê he-ne, li gel ku di dem û dewrana wî bi xwe de heye ku van berheman ci rola rîk û pêk nelîzibin. Celader Bedirxan, bêguman, merovekî intellektuel e, bi xwebêja tevahî ya peyvê. Di nav civata me ya îroyin de bi hezaran intellektuel hene lê her yekî ji wan pîvaneke xwe heye û radeya intellektuelizmê dikare li nik hindekan ji wan ji ya li cem hindekên din bilintir be. Weki ez dibînim, merov nikare hemî intellektuelan bike xwediyê eyîn pîvan û radeyê. Girani-ya her yekî ji wan li gor xebat û berhem û pejirandina pêşerojî dê bête diyarkirin. Merovê di şaxekî zanistiyê de pispor li gor berhemên xwe, nerxê wan berheman û bandora wan ya pozitîv li civatê, yan li cîhanê, cîhê xwe di pîvana intellektuelizmê de digire.

Li vir pirseke din jî tê holê ku gellek grîng e. Gelo intellektuelizm tenê bi karê edebî, felsefi û zanistiya civakî û siyasi ve girêdayî ye, lê gelo xwebêjeke hîn mezintir dide?! Bi dîtina min, bersîva vê pîrsê jî bi rol û xebat û berhemên merovan ve girêdayî ye. Ez bi xwe merovekî wek Hesen Cez-

rawî wek dengbêjekî bi rûmet dibînim ku layiqe cîhekî taybetî ye di dîroka Kurdan de, di şaxê dengbêjiya stiranê gelêri de, lê ne wek intellektuel. Hunermendêne wek Şivan Perwer, Nizamettin Ariç û Nasir Rezaî, li milê din, dikarin di eynî demê de wek hunermend û intellektuel bêyên binavkirin. Merovê wek Kendal Nezan, Necmeddin Kerîm, Umer Şêxmûs û gellek kesen wek wan ku bi saya zanyarî û xebata xwe sûd li derive gîhandine pirs û civata kurdî ye, bêyî ci guman kesen intellektuel in.

Civata kurdî di teorî û pratîkê de hîn bi gellek şeweyan civateke paşvemayî ye lê di nav çend salêna borîn de hejmara intellektuelên Kurd hema hema roj bi roj zêde bû. Berhemên di gellek rojname û kovarê kurdî de, herweha derketina berhemên hunerî yên layiqî nerxdanê şahidên vê yekê ne. Lê cîhê gotinê ye, ku pirsa neteweyî pêşveçûna intellektuelizma bi şeweyeke serbest û li gor pîvanen navneteweyî di nav Kurdan de bi sînor kiriye. Hindek kesen me her di wê baweriye de ne ku hemî berhemên me pêwîst e xwe rasterast bi pirsa neteweyî ve eleqedar bikin, ew jî bi şeweyeke gîrgînî û propagandîst, bi şeweyeke wisa ku eyîn raman dîsa û dîsa bête dubare û sedbarekirin. Nêxweşiyêne me yên civakî, rola jin û mîr di nav civatê de, gelşen ciwanan, pirsa hawîrdorê, gellek problêmên rojane, heta afirandina berhemên piştgiriya têkoşînê lê bi raman û rengên nû, hema hema ji zayînê dûr, yan bi tevahî li dervayê munaqşekirineke bi intelekt, mane. Stira-

nên me, filimên me, berhemên me yên edebî, wêneyên me û her tiştê ku xwe bi zanyarî û intellektuelîzmê ve girê dide xwe bi pirranî bi şewebabekî tengaso diyar dîkin, bi baweriya ku ew xwediyên xwe dikin "têkoşer," û va tengasobûna ye ku ne tenê eynî benîst dixe gellek devan, razekiyê û rotînê di berheman de dike xewan, lê di eynî demê de asoyê intellektuelîzma kurdî li hember yê navneteweyî disînorîne. Bi encama vê yekê berhemên nûşewe û nûjenbabet ku bi bedewetî û taybetiya xwe ya serbixwe xwediyên xwe bigihînin intellektuelîzmeke bilind gellekî bi sinor in. Hindek kesen me gotineke wisa dê wek yeke qels û kêm bidin zanîn ji ber ku ew ê careke din wê li gor pîvana "bindestbûna me" û "têkoşîna li dij neyarê hov" binerxînin. Bi hêviya ku mebest şas neyê têgihîstin, bala xwe bidin van navan: Sokrat, Leonardo De Vinci, Goethe, Xelîl Cibrâl, Picasso, Sartre û bi sedan yên wek wan. Berhemên van kesan ne tenê navên neteweyên wan di dîroka cîhanê de bilind kirin lê bûn beşekî ji berhemên cîhanî. Berî çend heyvan filima İbrahim Selman, Karwanekî Bêdeng, di tîlvizyonê de, li Australia, hat raberkirin. Tevê di rojnameyekê de, di besê bernameyên tîlvizyonê de, kurtenivîsarek li ser filimê hat weşandin ku wisa dest pê dike, "hema hema her tiştê li ser Kurdish digihê me xwe bi tadeyên li wan dibin ve eleqedar dike,..." (Sydney Morning Herald: 28/8/1995). Bi gotineke din, eger ne tadeyên li Kurdish dibin bûyana kesekî dê tiştek li ser wan nizanibûya. Divêt em êdî tê bigihê ku afiran-

dina berhemeke baş ya ku belkî tew behsa siyasetê neke ji, dikare Kurdish û pirsa wan ji şehîdbûna hezar têkoşerî bêtir bi cîhanê naskirin bide (li gel qencitîrîn rîza min ji can û giyanê şehîdîn neteweya Kurd re). Hêvî dikim, yên "di ava gemarî de nêçirvaniyê dikin" vê gotinê wisa wernegerînin ku nivîskarê vê gotarê ci giraniyê nade têkoşîna neteweyî. Û hêvidar im ku ew berhemên wî yên salên heştîyan nefirrinin û hindekîn ji yên îtroj negorînin.

Nayê veşartin ku beşekî mezin ji neteweya kurdî heye ku hewcedar e propaganda û hêvotina siyasi be, ji ber ku hesten bi sedhezaran ji wan bi encama bindestbûn û bêhaydariyê teziyane yan benc bûne. Lê wek li jor hat diyarkirin, her tiştekî war û şaxekî xwe heye; ne tiştekî di cih de ye ku hemî şax li hev bigerin û bibin gulokekê. Bi gotineke din, rewşa siyasi ya gelê Kurd pêwîst e nebe hacetê derxistina fetweyên li dij intellektuelan, û navêt ku her kesê nûpêketî ji her intellektuelî hêvî, yan daxwaz, bike ku bila her û her li ber mîlodîyeke yektone rabe dîlanê û xwe bihejîne, yan di eynî gola herêmî de avjiniyê bike. Heye ku intellektuelek di kûraniya deryaya jiyan û têkoşînê de bi aramî û bi serê xwe avjiniyê bike bêyî ku li ser ava wê çelpeçelpa milên xwe bide bihîstin, lê di eynî demê de ji bo sûd û armancê heybeş.

Neteweya kurdî hewcedariyeke bêhempa bi intellektuelan heye, intellektuelên ku bi dayîneke zanyarî û mentiqî bikaribin bandoreke pozitîv li civatê bikin da ku endamên wê gavêne bezatir ber bi şaristaniyê û

jiyanek xweşter biavêjin û da ku ev gav wan hîn zûtir ji bin barê bindestiyê û ji nav tarîbûna şeva drêj bigihînin qonaxeke di jiyanê de layiqî pesindanê, yan bi kêmasî layiqî jiyînê. Têkoşîna neteweyî layiqî pesindan û nerxdayîneke bêyî hempa ye lê bi serê xwe civatekê nagihîne mebesta herî bilind. Rewşa bi dehan ji neteweyên li Asya, Afrika û Emerîkaya latînî vê yekê baş diyar dikin. Ma kî ji gelê Kambôdyayê bêtir ji bo serxwebûna xwe têkoşiyaye?! Ma kî wek Afxaniyan ji serbestiyê hez dike?! Ha rewşa wan di berbanga sedsala bîst û yekemîn de li pêş çavan e.

Mixabin, li pêş intellektuelên kurd gellek asteng û dijwarî hene, wek nebûna demokrasiyê li hemî beşen Kurdistanê, dûrbûna civat û rêxistinêñ kurdî ji tradisyonên demokratî, kêmbeşîna xwendevanan, cudabûna alfabayê, nebûna zimanekî standard, kêmbeşîna rojname û kovarêñ rojane û heftane yên objektîv, bisînorbûna munaqşeşenêñ di nav intellektuelan bi xwe de û gellekîn din. Bi encama vê rewşê hejmareke ne biçûk ji intellektuelên Kurd iroj dilsar û bêdeng in. Hindekîn din bi tirs gavan radinin da ku xwe ji gîrû rexneyêñ dewletan, rêxistinan, û heta endamêñ civata xwe, biparêzin. Lî li gel hemî kêmsî û astangan jî hejmareke biçûk ji intellektuelên Kurd gavine bi wêranî diavêjine û berhemine laiyqe dem û dewrana iroyîn diafirînine. Berhemêñ wan bikaribin di rewşa iroyîn ya dijwar de çîqa bandor li tevahiya civata kurdî bikin, pêşeroj ê xuya bike.


Pêwîstiya gotineke din jî li vir heye, ew jî

ew e ku tiştên intellektuelîzma merovekî dixin pîvanê berhemêñ wî merovî ne, ne siñciyêñ wî yên şexsî. Wek mînak, alkoholîzma kesekî ku berhemêñ çak ji bo neteweya xwe, yan ji bo cîhanê diafirîne nikare li pêş binavkirina wî merovî wek intellektuel bibe asteng. Heta ku civaka wî ya iroj wî nepejirîne jî dîrok ê rojekê mafê wî lê vegeŕîne.

Bêguman xwendevêñ ê di çav xwe re kîribe ku di warê binavkrina kesan de nivîskarê gotarê gellekî miqayit e. Li nik me Kurdan nerxdana merovan, heta gotina rastiyê, hindek caran ne tiştekî hêsan e. Sedem erf û toreyên eşîriyê, yên olî û yên siyasî, herweha yên herêmî, ne ku pirr caran ji objektiviyetê bêtir bi hestêñ atîfi û zihniyeta mirîditiyê ve girêdayî ne. Bala xwe bidin rexneyêñ baş û xirab ku di kovarêñ me de têyên weşandin. Hema hema tevahiya wan bênav, yan yeknav in. Ez lêborînê hêvî dikim, ji ber ku navêñ gellek kesêñ layiqî binavkirina wek intellektuel ji gotarê der man. Yekem, ji ber ku nav pirr in, û duyem ji ber sedemine li jor hatînî diyarkirin. Herweha ji intellektuel û xwendevanêñ jîn lêborînê tika dikim ji ber ku wisa dixewine, wekî ku gotar tenê ji bo mîran, yan camêran, hatibe nivîsandin. Mebest, gotinê naxwaze, ne ew e, lê wek diyar e zimanê me jî yekî mîrşêwe ye. ■

# Întelligent-întellijansiya întellektuelî

*Edîp Polat*



Mana bêjeya întellektuel ji mana întelligent reh stendiye. Aqil, zanahî û zîrekî pê tê şirovekirin. Ji vê gotinê bêjeya întellijansiya çêbûye. Ev, di wateya çîna întellektuelan de tê bikaranîn.

Bi rastî di her welatê dinê de, mirovên pêş-veçûyî û rewşenbîr hene. Lê belê, hin mirov ji hene ku ji rewşenbîran jî bêtir zana û xwedî berhem in. Anglo bêjeya rewşenbîrî û ronakbîrî tenê wan kesan nade nasîn. Seba ku ew ji rewşenbîran jî zêdetir zîrek û çeleng in. Ew pirtûkan dînîvisin, wêneyên bi rêk û pêk çedî-

kin, helbestên wan dibin gotinên stranan. Filman dikşînin, heykelan çedîkin. Fîkrên ecêb, gotinên wilo çivir dibêjin, ku ewil mirov şaş dibe, civak ji ecêbmayî dimîne. Lê belê dûv re mirov dibîne ku ew ramanênu wan gotinê, gelekî rast dertên. Kesênu wilo, ne di dewletekê de dibin walî, ne dibin qeymeqam, ne jî dibin wezîr û berpirsiyarên hukûmetê. Na, ew tu carî vati niyênu wilo nagirin ser milênu xwe, wê giraniyê hilnagirin. Ji sedemê ku mêtîjî û zîrekiya wan jêhatiyan kesayetiya wan tenê besî wan e, ew ji mewkî, meqam û quretiyê hez nakin. Anglo ew li hespekî wilo siwar bûne ku li bayê bezê diçin û riya wan tu carî naqede. Ne şev li wan şev e, ne roj li wan roj e.

Ji lewma ew ji xwe gelekî hez nakin: Por û  
rih dibe bihostek...

Ev sewdaliyên pêşdeçûyinê, xwenuhkiri-  
nê, ramaniyê kî ne gelo? Çi kes in? An jî  
divêt kesên çawan bibin întellektuel?

Carna mirov li bajarêن mezin hin însa-  
nan dibîne ku ew ne mamûrê dewletê, ne  
xebatkarêن cihekî an jî ne siyasetgêr in. Lê  
belê civat li gor hewqas bêşiklî û bê vatinî-  
ya wan jî cardin nirxek û girîngiyekê dide  
wan. Civak, di derheqa gelek pirsên netewî  
û politîkî de guhê xwe dide axiftin û nivîsa-  
rên wan kesan. Ne zengîn in, ne jî xwedî  
meqam in ew. Bi tenê xwedî qabiliyet in.  
Nanekî tişî, tasek ava querî besî xwarina  
wan e. Qedehek çay û simîtek carna bes e  
ji têrbûna wan re. Mirov dinêre pirtûk di  
destêن wan de ne, carna pere di bêrîka wan  
de nîn e ku xwarinê bixwin, dîsa ci dikeve  
destêن wan ew didin bi rojname û pirtû-  
kan. Gelo me ji xwe pirsî ye: dibistanek întel-  
lektueliyê heye an na? Metod û rîç ji bo  
hînkirina întellektueliyê heye? Dibe ku  
diplomeyek an jî metodeke întellektueliyê  
tunebe, lê belê şert û şirûten vî karî hene,  
serê hemî tiştî ev in: Heke mirovekî zana  
hay ji dinyayê tunebe, ango nûçe ji derive, ji  
têkiliyên însanan, ji çûyin û hatina dinyayê  
negire, ew kes nikare bibe întellektuel. Yanî  
komunîkasiyon an jî ragihandin pêwîst e.  
Însanek çiqas zana û zîrek be, çiqas xwedî  
qabiliyet be jî, heger xeberê ji dinyayê negi-  
re, rojnameyan nexwîne, li radyo-tv'yan  
guhdarî neke, ne tenê ji welatê xwe, ji hemî  
dinyayê agahdar nîn be û zimanê biyanî bo

vê yekê nizanibe, ew kes nikare bibe întel-  
lektuel. Tenê ev jî têr nake, divê vê agahda-  
riyê, nûçeyên dinyayê bi lez, zû hîn bibe,  
fahm bike. Heke dereng bimîne, berjewen-  
diya wan namîne û ew nûçe tu menfeetê  
nadin.

### Komunîkasiyon ji bo ci şert e?

Întellektuel ramanên xwe, nivîsarên xwe û  
hemî berhemên xwe divê bi hemdemî, bi  
çavekî nûjen ava bike û binivîsîne. Heger  
gotinên wî bi derengî bikevin, wê gavê ew  
gotin her çiqas rast û xweser bin jî, seba ku  
kevin dibin tu nirx û girîngiya wan namî-  
ne. Bi vê gotinê em naxwazin bêjin ku pê-  
wîst e di mala her întellektuelî de faks,  
komputer, kanala înternet û hw. hebin.  
Dibe ku aboriya wî/wê têr neke. Lê hindik-  
tir divê rojnameyan bixwîne, medyayê bi-  
şopîne û guh bidêre. Ji bo mirov pirtûkekê  
binivîsîne, berhem di kîjan babetî de dibe  
bila bibe, divê mirov zane be da berî vî karî  
kê ci gotiye an nivîsiye divê mijarê de. Mi-  
rov wêneyekî çêbike, mirov stranan bibêje,  
mirov heykelekî çêbike û hwd. şert e mirov  
zanibe berî mirov xelkê ci gotiye an çêkiri-  
ye. Ango divê mirov dîroka karê xwe biza-  
nibe. Bona vê yekê jî divê komunîkasiyon  
hebe. Guhêni mirov her dem mûç be, çar-  
çavêni mirov hebin.

Komunîkasiyon di mîjîyê întellektuelan de  
sekin û statukoyê ji holê radike. Ew bi vê  
riyê xwe nuh dike. Ji aliyê din ve di çîna  
entellîjansiya de ci heye tuneye hîn dike. Bi



Serhed Bapîr, "Ismail Beşikçi" 1990

vê riyê ew dibîne di nava derya vê çinê de peşkek ava kesayetiya xwe. Belê zîrek û intellektuelên dinyayê behr in, ew jî dilopek ji wê behrê ye. Bona mirov bûyerekê şirove bike, pêwîst e mirov pêşî wê bibihîze.

Sekin û statuko neyarê mêtî ne. Livandin û aktivîte xureke mêtî ye. Aktivîte bêî komünîkasiyon çenabe. Tevî vê babetê ez dixwazim bêjim ku, ji bili zimanê zikmakî zimanekî biyanî ji intellektuel re şerd e. Ev pêwîstî, bona komünîkasiyonê pêdivî ye. Gava mirovekî lêkolîner bi zimanekî ewrûpî an wekî din nizanibe, dê çawa berhemên xwe bi nûçeyên teze bimeyine? Karê intellektuel mast, divê bi zimanekî biyanî qeymax bigire. Gava ziman tunebe, ew dê di xebata xwe de dereng bimîne. Ev derengî

kalîta wî/wê dixîne. Zimanekî biyanî ne tenê bona komünîkasiyonê ji intellektuel re pêwîst e, herweha bona xwenuhkirinê û dostaniya bi mirovên derveyî welêt re jî şert e. Pêsiyan gotiye, zimanek mirovek e, du ziman du mirov in.

Lîsan bona pêşdeçûyina mêtîjiye însen ji aliyê biyolojîk de jî divê. Gava mirov zimanekî biyanî dielime, bergeha yekî, asoya yekî vedibe û nêrîna mirov dûrahiyê dike he-defa armancê.

Bi vê gotina xwe, em naxwazin bibêjin ku mirovên bi zimanekî biyanî nizanibin nikare bibin intellektuel. Na, şertekî weha tuneye. Lê belê ger ziman hebe, ew ê bi hêsanî karibin bi pêş de herin, lêkolînên xwe çebikin û xeberan ji dinyayê bigirin.

Digel vê yekê intellektuel, însanekî ku statûkoyan xera dike û angajeyî îdeolojiyan nabe ye, ji aliye din ve ji divê mirîdî û koletiya serok û rêberan ji neke. Gava îdeolojî bibe mîna dîn, divê mirîd ji jê re hebin. Fikir û raman herçiqas rast bin ji, intellektuel nikare wan bi xwezahiya wan bipejirîne. Divê ew kîmasya wan bibîne, bona muke-meliyê hişê xwe bixebitîne. Gava tiştekî nû dertê û bi şoreşgerî belav dibe, gel li pey wê ramanê diçe û şiyar dibe. İntellektuel, divê alîkariya vê şiyariyê, vê heyecanê bike, lê belê ew bi xwe angaje nebe û di nava wê girseyê de wenda nebe. Partîzanî û intellektuelî naçe ber hev. Ev averû ji hev cihê ne. Şoreşgerî ji tiştekî din e. İntellektuel bi guhertin û her dayim bi pêşdeçûyinê ve girêdayî ye. Fikrek şoreşgerî, helbet bona intellektuel ji divê. Lê gava ev fikir kevin bû, divê ew hespê xwe biguhêre û wî bi çargavî dîsa bajo. Seba ku riya wî dûr e, derdê dilê wî kûr e. Romantîzma kesayetiya wî nahêle ew bibe mirîdê partiyekê, an ji rîkxistinekê. Ji vê gotinê mana ku intellektuel bê armanc û hedef in dernayê. Na, ew ji dikarin bona îdeolojiyekê şer bikin, bi dewletê re pev biçin, lê belê divê ew nebin evd û kole.

Em di vê mijarê de dixwazin bêjin ku, însanên intellektuel ne xwedî Xweda ne. Belê, Xwedayê wan nîn e. Wan benikê xwe qetandine û ew bê xwedî û Xweda ne. Tirs û îdeolojî Xwedayê gelek mirovan in, lê ne yên intellektuelan in! Mêjiyekî azad, divê tiştekî nehebîne, di bin tesîra kesen mezin û alim de, di bin tesîra fikir û rîkxistinan

de gelekî nemînin, ji dûr ve, ji jor ve li tiştên erêni û neyêniyan binêre û di şopa pêşdeçûyinan de gav bi gav here. İro di civaka qırnê bîst û yekê de gelek Xwedayê mirovayetyî çêbûne. Emperyalîzm Xwedê ye, zanyarî Xwedê ye, îdeolojî Xwedê ne. Tewra qezayên trafikê Xwedê ne. Tirsa mirinê Xwedê ye. Carna ji tirsa polîs û işkencê Xwedê ne. Pêwîst e intellektuel van hemiyan bişkînin. Dema mêmî û zîrekiya însen bi pirsgirêkan ve were girêdanê, qabiliyetê însen dixetime, aso tarî dibe, bergeh teng dibe.

Tevî vê ramanê ez dixwazim bibêjim ku iro li gelek cihên dinyayê dewlet zordar in. Zilmê dîkin, azadiya ramanê ji holê radîkin. Ji lewma organizasiyona dewletê bi xwe Xwedêyek e û hemî hemwelatî jê re taetê dîkin. İntellektuel gava li hember dewletê nîn be, li hember hêza wê sînga xwe veneke û ne şerûd be, nikare mêmîjî xwe ji bin tesîra qanûn, nîzam û zordariya weki din derbixe. Seba vê yekê lazim e ku li hember dewletê fikrîn xwe veneşêre û her daîm rast bibêje. Li dadgehan, li hember zagonan fikra dilê xwe bibêje, xwe li gor ramana baweriya dilê xwe bipolarêze. Bona vê yekê ji ceza û hepsan netirse. Mirovekî ku ilegal bixebite, çiqas zana be ji ew nikare bibe intellektuel. Ev kar, karekî eşkere ye, ne bi dizî ye, lewma ji ji aliyeke de legal e, meşrû ye. Dewlet, li her deverê pêşdeçûyinê naxwazin, li her devera dinyayê konservatîv in. Seba vê yekê pêşî rewşenbîr li hember vê dertê. Ango intellektuel "dîn"

in. Civak pêşî wan jîr nabîne, wan dîn dibêne. Hêç in, ji ola xwe der in. Hem humanist in, hem jî şerûd û bêînsaf in. Her gav bi tenê ne. Ew bi piranî li pey civakê naçin, civakê li pey xwe tînin. Asî ne, serê xwe pêl nakin. Tenê dimînin, lê dev ji ramânê xwe bernadin.

Bernard Shaw, Robespier, Shakespeare, Robson intellektuelên dema xwe bûn. Nûjeniya welatên rojava, li ser fîkrê Bernad Shaw bingeh digirin gelek rewşenbîrên mîna wî li rojava derketine. Ew intellektuelên dema xwe ne. Ew bi piranî li dijî dewletê bûn. Çendan ji wan jiyana xwe wenda kîrin, xwe kirine qurban.

Adet û toreyêن civakan hene. Ger intellektuelek li gora wan toreyan bimeşe û ji rîçika kevneşopiya wan derneyê, ew nikare bi ser civakê bikeve û tiştên nû derxe holê. Berî her tiştî, bi dijîtiyê dest pê dike. Ango divê intellektuel hemî adetan nepejîrîne, wekî adetên mîletan neçe. Ger ew weke hemî kesî bin, nexwe cihêtî çenabe, guherînên sosyolojîk çenabin. Di vê ew serî li ber hînbûyinên kevin netewînin. Dewlet, tore, dîn, eşîrî û malbatî zîrekiya kesayetî dikujin. Kesê ku bixwaze bi serê xwe li hember van averûyan derkeve, divê pêşî gelekî ger nas be, jêhatî be. Divê babetê de mirov dikare bêje ku intellektuelî ji tenêtiyê û digel vê jî ji canaciziyê bingeha xwe digire. Ji xwe însan tenê nehatiye dînyayê û ew dê tenê neç? Gerînek, kortik û nixteyên her mêtî cihê ne. Rewşa kesayetî jî cihê ye. Intellektuel vê cihêtîyê zêde dike, jê tiştên nû


derdixe.

Bona van fîkrê nû, pêwîst e ew zanyariyê jî bizanibe. Çawa zanyarî? Rewşenbîrek gava ji fizîk, kîmya, bîyolojî, matematîkê fahm neke, felsefeyê nizanibe, hinekî sosyolojî nexwendibe, nikare bûyerên dînyayê şirove bike. Zanyarî metod û rîçika ramanî ye. Gava intellektuel ji vê rîçikê fam bike, li gora ilmî bifikire, ew dê bikaribe ji bin pelçiqandina dewletê, tirsa zordaran ji aliye psîkolojîkî de derkeve. Zanyariya reel (fizîk, kîmya, biyolojî) bergeheke cihê vedike. Tesîrên politîk kêm dîkin. Civak û menfeeta însen, fîkrê subjektîvi, niyet û xwestek wenda dibin.

Intellektuel ne însanên nîvco ne. Bi her hawên xwe ew profesyonel in. Bi amatoriye tiştek çenabe. Şert û şîrûdên me li jor behs kîrin, gava hemî bi cih werin, yek dikare bibêje ez êdî intellektuel im? Helbet ev averû ne bi qeide û şertan ve girêdayî ye, lê mirov dikare bibêje bi kultureke bingehîn, qedîm ve têkiliya vê çînê heye. Kultureke bi gelempêrî berî hemî tiştî divê. Eva, rewşeka profesyonelî dide ronakbîr. Amatorî, prîmîtîvi gelek tiştekî paşverû ye ji intellektuelan re. Bona hostayıyê jî divê ew berhe-mên xwe derxe ber çavên civakê. ■

# Rola rewşenbîriyê di rêkxistinên kurdî de

*Derwêş M. Ferho*



**D**i van demêñ dawîn de gelek nivîsar li ser rewşenbîran û wezîfa wan hate nivîsan-din. Hemî jî balkêş bûn. Ev balkêşî hem di aliyê negatîf de û hem jî di aliyê pozitîf de baş xuya dikir. Hêvî ew e ku ev munaqşe berde-wam be û di pêşerojê de bibe xwedî berhem.

Babeta nivîsara me rola rewşenbîriyê di rêxistinên kurdî de ye. Çarçewa ku emê rêxistinan tê de bi cî bikin fereh e. Rêxistinên xwendekaran, karkeran, hunermendan, nivîskaran û hwd. Akademî, enstitu, weşanxane, kovar, rojname û dezgehêñ din, mîna radyo û televizyon, partî û hêzîn siyasi, tev dikevin nav vê çarçewê de.

Rewşenbîrî xwedî hebûna ramana jîr e. Xwedî bîr û baweriyeke fereh e ku amanc û berhemên merovatiyê bi awayekî realist dibîne. Guhertin û bûyeran pirralî analîz dike. Dûrbîn û rêzan e. Xwedî berhem e. Kesêñ ku van şer-tan jî pêk tînin rewşenbîr têne qebûl kirin.

Rastiya me kurdan ci ye? Rola rewşenbîriyê û rewşenbîran di rêxistinên kurdî de çawa ye? Meriv dikare bê goman bêje ku kurd xwedî rewşenbîriyêke xurt in. Ev rastî ji çanda kurdan ya kevn û zengîn tê. Di bin her dijwariyê

de çanda kurdî xurtbûn, zengînî û bêhnferhiya xwe ji guhertinên dora xwe re xerîb nehiştiye. Xwe li gora xwezayê reng kiriye. Herçend berhemên xwedî hesa neteweyî têr nakin jî meriv ne bêhêvî ye.

Lê dem teng e û ev rewş divê bê guhertin. Gelek berhemên xwedî hesa neteweyî û ji pêşerojê re ronahî pêwîst e. Kêmasî û bêberhemî divê cihê xwe bidin pêwîstiyo rojê: berhemên bi her tiştê xwe ve kurdî û xwedî ramanên jîr.

Divê rewşenbîrên kurd wezîfe û rola xwe di nav rêxistinên kurdî de baş bidin xuyanî kirin. Ev rol divê ji bo pêşerojê rêzanî û ronahiyeke hêja be. Heta vê rojê kêmasiyeke gelekî mezin heye. Rewşenbîrî heye. Rola xwe ya pêwîst nalîze. Hin caran xwe bi xwe dikeve şaşîyan û barê ne karê xwe li ser milî xwe dike.

Keşmekêsiyeke mezin di nav rêxistinên kurd de heye. Pirraniya rêxistinên me, xebata çandî, siyâsî, agahdarî û hetta li ser xebata lêkolînan jî diaxivin. Komeleyeke karkeran li Ewropa, xwedî 30-35 endam, dikare li ser stratejiya têkoşîna azadiya kurdan biaxive.

Daxwaz û û pêwîstiyêk karkeran li wela-tê ku ew lê çareser nake lê doza welitekî dimeşîne! Partiyêni siyâsî dikarin di her warê jiyanê de pozê xwe bixin nav kar û xebata rêxistinên din yên kurdî de. Xebata siyâsî, çandî, rewşenbîrî û hetta karên akademîk jî dikin! Akademî û Enstitûyen me xebata li ber xwe weke ku pêwîst e nakin, bi dûvî siyasetê û karêne ne karê wa ye ketine!

Yekîtiyêni Nivîskar û Pen Kluba Kurdî jî li nivîskar û nivîskariyê napirsin, ketine duv karêne din! Yekîtiyêni jinan karê xwe nakin dibezin karê mîran. Mamoste karê textoran, textor karê xwendekaran, hunermend karê siyâsî û siyasetvan jî karê hunermendan dikin! Ango, her kes her tiştî dizane û dike! Tiştî balkêş jî ev e ku her kes li her cî û di her fersendê de, ji bo ev serberdayîtî nemîne, bang û hewara hevkarî û yekîtiyê dike.

Daxwaza her kes û her rêxistina kurdî hevkarî û yekîtiye le ci ecêb e ku pêk nayê! soranî kurmancî naxawze, dimilkî (zazakî) ji kurmancî direve û kurmancî xwe ji her du aliyan diveşêre.

Divê ku rewşenbîrên me di vî warî de rola xwe bilîzin. Hebûna xwe bidin xuya kirin û zanîna xwe, ramanên xwe ji van rêxistinan re bikin çira ku ew kar û xebata xwe bi berhem bikin. Divê her rêxistin erk û amancêni xwe bizane û wan bi cî bîne. Bêyî vê yekê rewş baştir nabe.

Divê Enstitûyen Kurdî ji rewşenbîrên kurd re vekirî bin ku ew bikarîbin bir û baweriyêni xwe belav bikin. Xebata çandî ji Enstituyan tê xwestin (Erk û amancêni Enstituyen hene di vê çarçewê de ne. Dibe ku di pêşerojê de Enstituyen xwedî erk û amancêni cihê bêne ava kirin) û ev jî ji aliyê rewşenbîran mimkin e. Divê Weqfîn Kurdan karê xwe yê sereke bizanin. Eger na hebûna wan ci kar dike?

Eger her rêxistin rabe û siyasetê bike baştir e navê xwe ‘partî’ deynin ku em gelê

xwe jî şas nekin. Divê partiyên me yên siyasi jî karê xwe yê siyasi bikin û serê rêxistinê din rehet bihêlin. Yan na ew rêxistin jî di xebata xwe de dikevin çewtiyên mezin ku dîtina dermanê wan dijwar dibe.

Di havîna 1979'an de civîneke balkêş li bajarê Cenevre pêk hat.\* Ji her çar aliyên Ewropa besdar hatibûn û pirraniya wan xwedî bîr û baweriyên siyasi bûn. Hin ji wan nûnerên partiyên siyasi bûn. Hin ji wan jî nûnerên komeleyên çandî bûn. Hin kesen din jî ji rêxistinê karker û xwendekaran hatibûn. Di vê civînê de munaqeşeyên girîng hatin kirin. Amanc ew bû ku partiyekê siyasi bê damezrandin. Temamîya besdaran jî rewşenbîr bûn. Dema meriv li vê rastiyê dinêre dikare rewşa me ya tevlîhev ji hev derxe. Çand, siyaset, komeleyetiya karker û zanyariya akademîk bi hev re ye û daxwaz eynî kar e!

Di navbera civînê de hinek ji besdaran dev ji civînê berdan. Lê berhema wê civînê "Partiya Yekbûn" bû. Vê partiyê çend salan hebûna xwe bi xebata belavok, çend hejmar kovar û weşanên din domand û li ciyê ku ava bû qediya jî. Şaşıya mezin li vira rastbijartina amancê ye. Em çi dixwazin bikin û çi berhem ji bo pêşerojê pêwîst e?

Dema *Kurdistan Press* li Swêd dest bi weşana xwe kir gelek kes bûne xwedî hêviyên inezin. Dewleta Tirk bi hemî çapemeniya xwe, diplomasî û hêza leşkerî hêrîş anîne ser vê bûyerê. Hêza berber (hember) bi yek dengî, bi hesa neteweyî li dijî *Kurdistan Press* der ket. Hemî imkanên xwe bi kar

anîn ku vê weşanê bide qedandin. Navêni nivîskar û hevkarên wê yek bi yek li rojnameyên xwe dane çapkirin. (Nîşan; Tercuman, 21.10.1986) Ew hemî kes mîna dijmnan, terorîstan, xayinan dane naskirin. Kurdistan Press çi kir. Di ciyê ku karê xwe yê rojnamegerî û agahdariya tejî hesa Kurdî bike, kete serê munaqeşa siyasi.

Bê guman, munaqeşe li ser her tiştî pêwîst e. Lê ew munaqeşe nabe ku bibe sedema xerabûnê. Eger munaqeşe alikariya xerabûnê bike, meriv neke. Ji me re pêşveçûn û avakirin lazim e.

Wezîfe û rola rewşenbîrên Kurd jî gerek e xuya be. Hedef ne Kurd û hesa Kurdî ye ku xera bibe. Hedef peydakirin û pêşdebirina wê hes û hêza Kurdî ye.

Di sala 1986'an de Kongreya Enstituya Parisê pêk hat. Rojnameyên Tirkîye bi dijiminayıyeke mezin hember vê kongrê nivîsandin. Diplomasîya dewletê xebateke mezin dijî Enstituyê kir. Li her derî astengê mezin peyde bûn. Heta alikariya diravan bû babeta dijayetiya Enstituyê û xebata wê ya çandî! Li hember wan hêrişan çend rêxistin û rewşenbîrên kurd bi hesa neteweyî bersivek nivîsand yan li ciyekî protesto kir?

MED-TV hate girtin. Ci bersiv ji me kurdan hat. Rêxistinê çandî di vî warî de ci dîkin? MED-TV bi xwe ci difikire? Haya kesî ji kesî nîne. Her kes karê xwe dike û siyaseta ava bin kayê dimeşîne.

Ji salan û vir de PEN KLUBA KURDÎ heye. Haya kê jê heye. Kî weha bêberpirsiyariyê dike û qet jî ne xema wa ye kî ci di-

bêje. Çawa meriv dikare li ser vê rastiyê bifikire?

Rewşenbîr çi dikin û ewê çi bikin? Nivîskar çi dikin û ewê çi bikin?

Divê ev çend mînak baş nîşanî me bidin ku em çawa gerek e xebatê bikin. Hesa neteweyî di her xebata me de pêwîst e. Divê em rola xwe di xebata xwe de baş nas bikin û bi kar bînin. Yan na emê her tim bi ax û wax bijîn.


Divê rewşenbîr li berpirsiyariya xwe xwedî derkevin. Di destpêkê de jî rôexistinên mîna Enstituyêñ Kurdî divê li berpirsiyariya xwe xwedî derkevin. Divê di her xebat û gavavêtinê de hesa neteweyî û hebûna ramana neteweyî ya kurdî hebe. Bi axaftina xwe, weşan û çapemeniya xwe, çîrok û helbesta xwe hesa Kurdî pêwîst e.

Eger ez û dinya li dora min, heta niha jî Cegerxwîn, Hejar, Mihemed Arif Cizrawî, Meryem Xan û Miradê Kinê nas nakin û Mahmut Baksî, Firat Cewerî, Mustafa Düzgün, Mehmet Uzun, Celîlê Celîl nexwînin dor nagihê ser Nazim Hikmet, Tewfîk Fikret, Rûhî Su, Azîz Nesîn û yên mîna wan. Nasandin û agahdariya li ser hes û hebûna neteweyî, di her aliyê xwe de, di vê kîliyê de dikeve ser milên Enstitu û Weqfîn Kurdî de. Anglo, amanc, di her gavavêtinê de bîreweriya kurdî şert dike. Ziman çi be ferq nake. Rôexistinên din divê karê xwe bikin û amancêñ xwe jîndar bikin. Her awayê xebata din xwexapandin e. ■

\*Beşdarêñ wê civînê: İsmet Şerîf Wanly, S.A. Muhammed, Omar Ahmed, Kerîm Faruk, Sait, Memo Yetkîn, Abdo Yillik, Hemreş Reşo, Derwêş M. Ferho, Z. Farhan, Hosseng Sabri, Remzi Ala, A. Bareş, Duran Üste, Iskender Hamma, Dr. Nureddin Zaza û Pervîn Jamîl.

# Pirsgirêka û Intellektueliya kurdî

Cemşîd Bender



Ez ê hewl bidim bi gelempêrî naveroka  
hinek terman ji jiyana xwe û serpêhati-  
yên xwe derxim. Ji ber ku tu termêr sosyo-  
lojîk û polîtîk ne dûrî jiyana mirov in, bi ji-  
yana mirov ve girêdayî ne. Ew di dilê mirov  
de ne. Loma ez dixwazim pirsgirêka û intellek-  
tueliya kurdî jî ji jiyan û serpêhatiya xwe bi  
rê bikevim û wê derxim holê. Ancax em di-  
karin bi riyeke wilo vekirî û zelal bigihîjin  
hin netîcayan. Wekî din jî, bi gelempêrî mi-  
rov dikare ji pirsên û intellektuel kî ye? Berpir-  
siyarên û intellektuelan yên li hemberî civatan

çî ne? Divê çî bin? Mirov dikare ji kî re bibêje û intellektuel? û hwd. bi rê bi-  
keve û zelaliyekî ji pirsgirêka û intellektuelan re bîne. Lê, em dizanin ku ev di  
dema me de, di hundurê perspektiveke fireh de hatine munaqşekirin. Di  
vê derheqê de bi koman pirtûk û gotar hatine nivîsandin. Em dixwazin di  
vê nivîsa xwe de li ser pirsgirêka û intellektueliya kurdî ku gelekî hindik li ser  
tête axaftin û her tim di plana dawî de dimîne, rawestin. Wê nivîsa me, bi  
intellektuelên kurd ku di tixûbên Tirkîyeyê de ne, bi sînor be. Li vî welatî  
berî her tiştî şerdên "intellektuelbûnê" pir zehmet bû. Hemû dibistan di

bin karbidestiya sistemeke yekpartîtiyê de bûn. Hemû weşanên ku derdiketin bi fikra jiyandina mentalîteya karbidestan derdiketin. Întellektuelên ku bi partiyê û bi dewletê ve girêdayî derdixistin. Ev celeb întellektuelî paşê di nava xelkê de bi navê "Welat-Milet-Sakarya" bi celebekî karîkatorîzekerî hate navandin. Têkiliya ku pêşî bi kultura roava re hate danîn di dema "Wekîlê Marif" Hasan Alî Yüçel de dest pê kir. Hinek berhemên girîng bi alîkariya vê wezaretê hatin wergerandin. Di wê demê de hejma-ra kesênu ku xwendin û nivîsandina wan tu-nebûn digihîste ji sedî heyşteyî. "Ensîtuyê Gundan" ku riya întellektueliyê vedikirin, ji aliyê wezîrê eyñî partiyê Reşat Şemsettin Sîrer bi sûcdarkirina ku ew propogandaya komunîzmê dîkin ve hate girtin.

Li gelek günden kurdan dibistan tunebû. Xortênu kurdan li eskeriyê fêrî tirkî dibûn. Ji ber ku wê demê hemû weşan; pirtûk, kovar û rojname bi zimanê tirkî bûn, hinek kurd di medreseyêni bi dizî de li riyanê zanebûn û hişyariyê geriyane. Di demeke ku peyivandina bi kurdî qedexe bû û kurdîtî qaçax bû, avabûna întellektueliya kurdî dûrî aqilan bû. "Bijî yê ku dibêje ez tirk im" hê di wê demê de li ser çiyan, li ser riyan dane nivîsandin.

Di navberê de tam 73 sal derbas bûne. Hebûna gelê kurd, zimanê wî, dîroka wî, stranê wî, bi riya têkoşına kurdan a salan dîsan hatiye holê. Xebatênu zanistî bi pêş ketin. Digel vê mirov dikare behsa întellektueliyeke kurdî ya gelekî derengmayî bike.

Em di nav çerxa perwerdeya serdestan de ku bi zorê empozeyî me dikirin de, bûne întellektuel. Di dibistana destpêk de em bi gotina "ez tirk im, ez rast im, ez jîr im" ve diketin sinifan. Em bi siloganê "Tirk, serbilind be, bixebite, bi bawerî be", "Tirkek bedelî dînyayekê ye" mezin bûne. Wan tu malûmat û zanebûneke ku bi gelê me ve girêdayî be nedan me.

Ez mîna zarokekî mahcir li Konyayê hatim dînyayê. Min li wir xwend. Di dibistanê de tu zehmetiyêni me çênebûn. Lîseya Konyayê bi serê xwe navenda neh wîlayetên dorhêlê bû. Zarokên ku ji wîlayetên din dihatin, diviyabûn lê razana (yatılı). Bê dibistanî problema hemû Anatolyayê bû. Qet guh nedidan vê mijarê. Bi qasî tirkan kurdan jî para xwe ji vê neyînîtiyê distandin. Di dema me de nivîskar û şârîn ku navdar bûn ev bûn: M. Emin Yurdakul, F. Rıfki Atay, Halide Edip, Orhan Seyfi, Yusuf Ziya, Reşat Nuri Güntekin û Ömer Seyfettin. Di dînyaya weşanê de jî, Burhan Felek, Va-La Nureddin, Peyami Safa, A. Emin Yalman ve H. Cahit Yalçın serî dikîşandin. Ev hemû tê de, bi taybetî jî xwedi-yê kovara Varlikê Yaşar Nabî, ji bo ku îdeolojiya Kemalîzmê bide dewamkirin, pir dixebeitîn. Di vê hengameyê de gotina "kurd" hîç nehat bikaranîn. Ji bin ve hate înkarkirin. Hate tunekirin. Ji ber zilm û zora ku dibû, ez fêrî zimanê xwe jî nebûm. Gava di nava civatê de bixwestina min bi hinekan bidin naskirin, digitin "lawê Sebiyê kurd", lê ger min bigota "ez lawê Sebi-

riyê kurd" im, wê ez rexne bikirama û bigotana "ev peyva kurd jî ji ku derket". Ev heftê sal in ku ev durûtî berdewam e. Întellektueliya kurdî, derketina întellektuelên kurdan di şerdên gelekî zehmet de pêk hattiye. Me pir bi derengî Serhildanê Çiyayê Agirî, Şêx Seîd, Dêrsimê bihîst. Em pir bi derengî pê hesiyan. Karbideстия Kemalîzmê em kerr û kor kiribûn. Me ev agahdarâ jî ji kesên ku sîrgûn bûbûn, bihîst. Kominikasiyon pir hindik bû. Ger dinya xerab bibûya haya kesî nedîgîhîstê. Sazûman wilo bû.

Min întellektuelê kurd yê pêşî, di sala 1948'an de li girtîgeha Afyonê dît. Ez di wê dîrokê de li Stembolê diçûm sinifa dudan ya fakulteya huqûqê. Bavê min ji bo Nûrcîtiyê hatibû girtin û ew xistibûn girtîgeha bajêr. Ez tam bi hejmara wan nizanim lê bi texmîna min em 60 Nûrcî bi hev re girtî bûn. Bedîuzeman Seîdê Kurdî şal û şapik li xwe dikir. Wî ew kincen xwe yên dîrokî di salonên dadgehan de jî ji xwe nedikirin. Xweparastinên wî yên li dadgehan, celebê xweparastina wî, mîrxasiya wî û hezkirina ku nîşanî şagirtên xwe dida, zanebûna wî ya kulturî, nîşana întellektueliya kurdî bû.

Ger ez tesîra vî întellektuelê kurd ya ku li min bûye, şirove bikim - ez ê berhemên wî jî bigirim ber çavan - û van bibêjim:

Bedîuzeman Seîdê Kurdî bi her awayî li dijî ideoolojiya Kemalîzmê bû. Wî pir ji gelê xwe hez dikir. Lê piştî ku wî serîhildanê Diyarbekir û Dêrsimê dîtibûn, wî hêviya xwe ji bin de wenda kiribû. Bi gotina wî,

wî "Seîdê kevin" danîbû aliyekî û kirasê "Seîdekî nû" li xwe kiribû. Ew di riya dîn de diçû û wî dixwest ku ew zikê rejîmê yê nerm biqelše. Lê wê ev fikra wî di şerdên nûdem de tu netîce nedaya. Ez qet bawer nakim îro di têkoşîna demokratik ya gelê me de tu pareke wî hebe. Berî destpêkirina tevgerekê bi demeke dirêj, ya ku tesîrê lê bike heye. Lê mirov nikare sifateke weha bide Bedîuzeman. Wî hemû jiyanâ xwe li surgûnê û li girtîgehan buhurand, lê hemû xwesteka wî bi avakarina sistemeke îslamî ve bi sînor ma.

Ez dixwazim behsa întellektuelên kurd yên hevdemê xwe ku min ew nedîtine jî bikim:

Ez dikarim bi kurtî van navan bihejmîrim. Veterîner Nûrî Dersimî, General Îh-san Nûrî, Kamûran Bedir-Xan, hozanê navdar Cegerxwîn û Nûredîn Zaza. Yên ku ez gîhiştîm rûmeta naskirina wan jî şehîd Mûsa Anter, şehîd Huseyîn Denîz, İsmet Şerîf Vanlı, şair Abdurrahman Durre, Feqî Huseyn Sagnîç, Melle İsmet, Yaşar Kaya, Selîm Ferat, Huseyîn Kartal, Haydar Işık, Mehmet Uzun, Fîrat Cewerî, Ethem Xem-gîn, Suha Bulut, Mehmet Bayrak, Serdar Baran, Lütfî Ballikaya, Dr. Huseyîn Nazlîkul û M. Dûran Şeker. Lê ez ê navê wan întellektuelên kurd ku em ji hev re nameyan dinivîsinin û ez li konferansan pêrgî wan hatime nedim. Loma ez hêvîdar im ew ê li min negirin. Sedema bibîranîna van navan ew e, ku bi raya min ev hemû jî întellektuelên kurdan in, hemû hêjâyî pesnê

ne.

Ev e, piştî ku ez bi salan dûrî pirsgirêka kurdan jiyan, ez gihîştin rûmeta naskirna van intellektuelan û bi wan re bûm heval. "Sir" û "sêhra" ku em anîne ba hevdu, têkoşîna gelê me ya demokratik e. Ger ev têkoşîn tunebûya wê di navbera me de jî ev pevgirêdana hezkirinê tunebûya. Me ê qet hevdu nas nekira. Ger gelekî bi derengî be jî, di warê edebiyat û politîkayê de êdî típekkî intellektueliya kurdî şekil distîne. Li we'lêt û bi taybetî jî li Ewrûpayê kovar û rojnameyên bi kurdî têne weşandin. Yê ku di van weşanan de berhemên nivîskar û şâîrên me diweşînin, ne bi tenê di warê ziman û edebiyatê de keda wan çêdice, herweha di warê gîhandina intellektueliya kurdî de jî kedeke wan ya bêhempa çêdice. Ev yeka han mirov pir kêfxwêş dike.

## Di pirsgirêka intellektueliyê de hin neyînitî

Intellektuelên welatên bindest, ji ber perwerde û terbiya ku ji serdestan distînin, gelekî di bin tesîra wan de jî dimînin. Pêdaneketina pirsgrêka neteweyî, van celebîntellektuelan bi hêsanî ber bi menfeetê ve dajo. Bêşexsiyeta ku ji înkarkirin û qedexebûnê hatiye pê, carinan bi kêtî van celebîntellektuelan tê.

Nivîsa nivîskarê pirtûka Ehmedê Xanî, hevalê min Medenî Ayhan, ya di derheqa intellektuelên kuradan de min gelekî dide fikirandin:

"Întellektuelên kurdan li hemberî hêjayîyen gel sar û bêberpirsiyar in, ew ji bedel-dayin û ji rîskê direvin, jê ditirsin. Rîsk tu carî danakeve sifirê. Întellektuelên kurdan li bende ne ku rîsk dakeve sifirê. Vana yên hazixur in, şîretker in, bi navê rexneyan tişîn ne qenc dibêjin. Ev genî ne, şer na-kin, êrîşî derewîn, neheq û neqengan na-kin, ew li dû fêda xwe û hesaban in..."


Nivîskar bawer nake ku wê bi intellektueliyeke wilo ronesans çêbibe, ew pêwîstiya celebekî nû yê intellektueliyê dibîne. Bêî ku em tu şiroveyê li ser vê dîtina Medenî Ayhan bikin, em wê dispêrin xwendevanan.

Em li ba hinek intellektuelên me vê neyîniyê dibînin. Ji xwe em naxwazin vê nêrîna jor gelempêrî bikin. Ya ku me herî pir xemgîn dike ew e ku hin derûdor hin kesan derdixin û bera pêxîla kedkarên ku li ser kulruta me, edebiyata me, dîroka me û zimanê me lêkolînan dikin, didin. Ew dixwazin ku ji van nivîskar û lêkolînerên me re bibin kelem. Rewşen wilo di demên bisserxwevehatina gelên bindest û şiyarbûna wan de derdi Kevin holê. Em hêvîdar in ku di demeke wilo ku tevegera intellektueliya kurdî li ber gesbûnê ye, wê pêşî li hemû neyîniyan were girtin. ■

Ev nivîsa ku Cemşid Bender ji bo Nûdemê nivîsandiye, ji tirkî hatiye wergerandin.

# Rewşenbîrên polîtîk

Şerefhan Cizîrî



Tevgera netewî ya xelkê Kurdistanê iro rewşenbîran munaqeşe dike. Rewşenbîrên Kurd hene an jî tune ne? Girêk di vir de asê bûye. Heger rewşenbîrên Kurd hebin jî, wê çaxê wezîfeyên wan yên polîtîk ci ne? Helbet hemû kes di vê navê de li gora daxwaziyên xwe yên polîtîk, ideolojîk û rojane, ji rewşenbîran re xeftanan ditefsilînin. Rewşenbîr divê xwe li gora wan daxwazîyan eyyar bikin. Yan na ew hêzên polîtîk, wana weke rewşenbîran napejirînin. Ev şası û tirs heye.

Tirs jî pirr caran dijminê aqil û rastiyê ye. Carna munaqeşe dibe weke pirsa mirîşk û hêkê; Ma gelo hêk ji mirîşkê ye an jî mirîşk ji hêkê ye? Pirs hene ku bersiva wana tenê nikare yek be. Lê pirr kesên ku besdarî munaqeşayan dibin, zor didin xwe ku di derheqa rewşenbîran de tenê bersivekê bidin. Lê ew bersiv tenê nikare pirsgirêka me ji gelek aliyan de zelal bike. Kes hene dibejin; Rewşenbîr divê bi partiyên polîtîk ve girêdayî bin û ew bes e. Kes jî hene dibejin; Rewşenbîr divê serbixwebin û bi tu partiyên polîtîk ve ne girêdayî bin. Hinekî din jî hene dibejîn;

Rewşenbîr divê bi rêxistin bin, lê belê di ramanê xwe de azad bin... Di gotûbêjan de tu dibêjî qey ew daxwazî ji sedî sed li dijî hevdû ne. Lê di rastiya xwe de ev yek ne wilo ye. Di warê rewşenbîran, politika û rewşenbîrtiyê de, nezelaliyek ramanî heye. Berî hemû tiştî divê ev raman werin zelal-kirin. Mij û ewrên ku di vê tevgirêdanê de hene, divê bêne belavkirin. Di ezmanekî sayî de, ancax mirov bikaribe tiştan ji hevdû baş bitefsiline...

Li Kurdistanê gotina politika, ji aliyê semantîk û praktîk de baş nehatiye vejandin. Li gora ferhenga Kurdan ya kulturî politika; di pîr manayêن cihê cihê de tê bikaranîn. Him xerakirin him jî avakirina civatî, di praktîkê de weke bûyerên politika hatine pejirandin. Diziya mirîşkan, talan, mîrkujî, xêrxwazî, mirovantî, xerabî, ziyan, birakujî, sextekarî, fen û fût, nivîskarî, hunremendî, erê hemû kirinên pratîk weke polîtikayê hatine nişandan. Di civata eşirtî de mirov çi bikira, ew yeka weke politika eşîrê dihate pêşkêşkirin. Ev têgihiştina çewt irojî di nava politika Kurdan de, baş cihê xwe girtiyê. Ma gelek kesên ku bazirganiya malên spî, di bin navê polîtikayê de didin meşandin tune ne? Mînak di vî warî de pir in. Li aliyê din; di bin navê polîtikayê de, mişkê xelkê dihatin dizîn, fitneyî di nava hêzên feodal û eşîrî de dihatin sorkirin, famîle li bin guhê hevdu dixistin, destê xwe davêtin nava problemên jin û mîran û gund berdidan hevdû... Navê van hemû tiştan weke politika dihate pêşkêşkirin... Ji niha û

pê de divê tevgera Kurdan ya polîtîk, di van waran de xwe baş zelal bike. Ci polîtîka ye û ci ne politika ye? Tixûbêن civatî, şexsî û sosyal divê ji hevdû baş werin veqtandin. Eşkere ye ku Kurdêñ modern nikarin bi metodêñ eşîran, polîtikayekê ji bona welat bidin meşandin. Kirinêñ ku li gora îdeolojî û exlaqê partiyêñ politîk ne rast bin, divê ew kirin vekirî werin mehkûmki-rin û ricimandin. Ev helwest ewê bi xwe re exlaqekî praktîk jî biafirîne. Niha gelemşe heye...

Di gotûbêjêñ li ser polîtikayê de Kurd, pîr caran gotinêñ xwe zelal bi kar nayînin... Em hemû baş dizanin ku politika, him dikare di mana teng de him jî dikare di mana fireh de were bikaranîn. Polîtika bi mana teng, politika rêxistinî ye. Ew rêxistin dikare partiyek polîtîk be, dikare eniyeke polîtîk be, komeleyek demokratîk be, an jî kulturî be, dikare rêxistineke meslekî be, an jî parlamentarîst be, dikare rêxistineke mîlîter be ûhw. Mirov dikarin bibin endamê van rêxistinan û di hinek waran de politika wana bidine meşandin. Ew politika han, tenê ji bo beşike civatê ye. Lê belê ne ji bo polîtikayekê civatê ya bi giştî ye. Ew ku bêje; ez polîtika ji bo hemû kesan dikim, di rastiyê de politika nake. Di civateke çînayetî de, polîtika bi tenê dikare endam û hevalbendêñ xwe girê bide. Heger mirov bixwaze polîtika komeleyekê, an jî rêxistinekê li hemû civatê ferz bike, wê gavê mirov ji armancêñ xwe yên rêxistinî pîr bi dûr ketiye. Ma mirov dikare hemû

kesî bike endamê partiyeke politik? Ew daxwaz li tu deverê pêk nehatiye. Ji xwe ev daxwaz li dijî ramana partîtiyê jî disekine. Ji ber ku partî an jî komele ji bo hinek mirovan e. Heger hemû kes bibin endamê partî an jî komelyekê, wê gavê mana partîtiyê û komelayetiyê nema dimîne. Di van tevgeran de zor nikare zêde biserketî be. Endametiya partî û komelan divê ji dil pêk were. Di hilbijartinên xwe de, divê mirov azad bin. Bi taybetî li vir, divê mirovên Kurd karibin politika bi mana teng û bi mana fireh ji hevdû veqetînin... Bi mana fireh politika, li ser hemû şaxên civatî dikare were meşandin. Hemû mirov di mana îdeolojî, kultur, ekonomî, dîrok û felsefê de, xizmetê ji hinek refîn civatê re dîkin. Di van xalan de politika bi mana fireh tê meşandin. Ev divê ji bona hemû kesan zelal bibe. Heger mirov endamê rîexistinekê be jî, dîsa eşkere ye ku xizmet ji hinek hêzên sosyal re tê kîrin. Ewê ku ne endamê partî û komeleyan bin jî, di xala dawî de dîsa xizmetê ji hinek refîn civatê re dîkin. Heger em bikaribin politika bi mana teng û politika bi mana fireh, ji hevdû baş veqetînin, wê gavê ez bahwer nakim ku tu Kurdê intellektuel wê bixwaze xwe durî politikayê bigire. Ma dûrî ji bona çi? Ji xwe karê intellektuelî bi mana fireh politika ye. Ma politika bêyî felsefe, huner, zanyaî, edebiyat, muzîk, rojnamevanî ûhw dibe? Ji xwe politika bêyî van çalakiyên intellektuelî, ji binî de nikare baş bimeşe. Ma politikayeyeke ziwa çîqasî dikare biserketî be? Ma

girareke (savareke) bêrûn, bêav û xwê dikare bi navê girarê were binavkirin?

Kesên rewşenbîr (intellektuel) nikarin li dûrî politikayê bisekinin. Rewşenbîr bixwe, weke ku Marksîstê İtalî Antonîo Gramscî jî dibêje; "Fonksiyonê desthilatê ne. Wezifeyê wan idarî ne, îdeolojî afirandinîne, politikî ne û ji ber vê yekê jî serekî ne. Hemû fonksiyonê serekî, bi gotineke din, fonksiyonê rewşenbîrî ne." Bi raya min ew dîtina Gramcsî, dîtineke rast e û zanyarî ye. Heger mirov karibe fonksiyona tebaqa rewşenbîran baş analîz bike, di destê dawî de ewê mirov bibîne ku xebata wan xizmetê ji çînên civakî re dike. Ewê ku vê rastiyê încar bike ne durust e û haya wî jî dîroka rewşenbîrtiyê tuneye. Xebata rewşenbîrî li ser hîmîn civateke xûyayî pêş ve diçê. Ev civata xuyayî tijî nakokiyên politik in. Mirov nikare di ser vê civatê re xwe bîqevize û li rewşenbîran bigere. Ma kesê ku xwe di ser çem re bîqevize û here li avê bigere çiqaşî biaqil e? Ji ber vê yekê jî, divê rewşenbîrî rola xwe di nava civatê de baş nasbikin û li gora vê yekê jî tevger bikin. Problemên ku politika dixwaze çareser bike, problemên rewşenbîran in jî. Ma azadî, demokrasi, pêşketin, tolerans, pêşxistina ziman û alfabeya Kurdî, ne problemên rewşenbîra in jî? Ma jiyanekê têr û tije ji bo rewşenbîran jî ne lazim e? Ma tolerans di civatê de tenê ji bo rewşenbîran dibe? Bi qasî tebaqa rewşenbîr, politikyan jî hewcedarê toleransê ne. Bi raya min tiştê ku ji bo rewşenbîran têne daxwazkirin, divê ji bo hemû civatê

werinê daxwazkirin. Di vî warî de, divê tu cudayî an jî imtiyaz ji bo rewşenbîran neyêne xwestin. Daxwaziyên ku ji bo rewşenbîran derbas dibin, divê ji bo şivanekî Kurd jî derbas bibin. Azadiya ramanî û tolerans ji bo şivanekî jî, bi qîmet û bi rûmet e... Ji aliye mirovî de divê tu cudayî, di navbera şivanekî Kurd û rewşenbîrekî de pêwîstî tûnebe. Cudayî dikare tenê ji aliye fonksiyonan de, di demeke dîrokî ya kin de were pejirandin. Heqê hemû kesan heye ku dilê xwe bibijînin vê fonksiyona rewşenbîrî...

Heger mirov cudayiyê ji bo tu rewşenbîra nepejîrîne, wê gavê divê tu polîtikvan jî, ji bo xwe tu cudayiyê daxwaz nekin. Ev rastiya hanê, ji bo hemû kesan divê derbas bibe. Lê li Kurdistanê û li pirr welatê din, polîtikvanan tenê ji tebaqa xwe re cudayî daxwaz kirine. Pirraniya caran problem di navbera xebata polîtikî û xebata rewşenbîrî de, di vê xelekê de li bin guhêne hevdu dikeve. Wexte ku desthilata polîtik, li karê rewşenbîriyê tenê weke karekî "rojane" an jî karekî rûtîn meyze bike, wê çaxê şashiyeke mezin li navê peda dibe. Pirtûkek, tablo-kek, perçayek muzîkê, şanoyeke pêşketî û rojnamegiriyeek modern, tenê bi daxwazên ajîtatîf nayêne afirandin. Heger mesele ew-qasê hêsanî be, rêexistinê polîtik dikarin di vî warî de pêşengiyê ji Kurdan hemûyan re bikin. Berî hemû tiş ev karê ku me navêwan li jor hejmartin, ne karê hêsanî ne. Bi salan konsanrtasyon û perwerdekirin, ji van karan re pêwîst e. Carna ew kar pirr wextan tenêbûnê dixwazin. Lê mirov baş diza-

ne ku, rewşenbîrê Kurdan heta niha ji tenêbûnê pirr tirsîya ne. Ji bona ku tenê nemînin, ew dikarin carna pirr tiştên bêre jî qebûl bikin...

Heger tevgera rewşenbîran ji aliye ramanî û prensibî de baş xurt ba, ewê bikarîba bi xwe tesîreke pirr baş li jiyana polîtik jî bikira. Lê belê rewşenbîrtiya Kurdî dûrî vê yekê ye. Nakokiyên prîmîtîf (paşdemayı) ku di nava polîtika Kurdistanê de hene, rewşenbîran bi hêsanî derbasî nava karê rewşenbîrtî kirine. Nivîskarek, hunermen-dek û zanyarek ku ne ji grûba te be xerab tê pêşkêşkirin. Karê mezin û baş jî wî kiri-bin, ew dîsa biçûk têne dîtin. Lê heger ew birader ji grûba te be, wê çaxê ava çeman disekine. Kevir dikarin di atmosferek wiha de bibe penêrê kesidandî! Heger ji grûb an jî ji partiya te, mirovek bê hemdê xwe tişte-kî biçûk jî kiribe, tu dikarî wî bibî ber parê ezmana. Ma kî weke wî nivîskar, huner-mend, zanyar û rewşenbîr heye? Di atmos-fereke wiha de, pîvanê rast nema derbas dibin. Kî karibe gavêne xwe zêde baveje, kî karibe qumaşê xwe zû bicirîne, kî karibe zêde dengê xwe bilind bike û gotinên tiro-viro bêje, wê bêhnikê ew bi ser dikeve. Rexnegiriya rewşenbîrên Kurdan, bi xetêن qalind li gorî van prensîban dimeşe. Min di tu mijaran de nedîtiye û nebihîstiye ku rewşenbîrên Kurdan, bi awayekî xurt piş-girtiya hevdu kirine û xwedî li berhem û sebatêne hevdu derketine...

Li aliye din di nava rewşenbîran de mu-naqaşeyeke, bê ser û ber heye. Mirov li ko-

var û rojnameyên Kurdan dimeyzîne ku, her kes ji xwe re li daholekê dixin. Rewşenbîrên Kurd bi hevdû re baş munaqše na-kin, baş guh nadin hevdu, ji bo ku hevdu baş fahm bikin xwe naêşinin. Ev ne sixle-tên rewşenbîriyê ne. Carna mirov meye-dike ku problemên rewşenbîrî, politîk û şexsi tevlîhevdû bûne. Hemû kes ji aliyê xwe de, dixwazin ku niqurçkan bidin hevdu. Mirov li vê derê li pirr kesan dinêre ku hîna zîxan in, lê dixwazin ku zû herin ser sergo û bang bidin! Her çiqasî bangdana van ne xweş be jî, hema ku keysekê li dere-kê dibînin, wê gavê bazzidin ser sergo û dest bi bangdana xwe dikin! Weke gelek caran ku bav û kalên Kurdan gotine; "Dengê dîkê me li hewa, bangdana wî jî bi derewa ye!". Di pirr waran de qelsî hene. Em bi vê baş dizanin. Ji ber wilo jî ez dibê-jim Kurd, hergav hewcedarî hevkarî û pişt-girtiya hev du ne. Hey heta niha kes zêde alîkariya Kurdan baş nake, hema wê çaxê Kurd dikarin xwe bi xwe alîkarî û piştgir-tya hevdu bikin.

Rewşenbîrên Kurdan divê politîk bin. Him bi mana teng û him bi mana fireh, rewşenbîr ji pirr aliyan de dikarin nêzîkî politîkayê bibin. Politîka ji bona Kurdistanê weke nan û avê ye. Divê rewşenbîrên Kurdan bikaribin bi hêsanî xwe nezîkî komele û partian bikin. Kî xwe nêzîkî kê dibîne, divê bê tirs derkeve pêş. Ma li welatên Ewrûpa bi hezaran rewşenbîr ne di nav politîkayê de ne? Ez gelek filozof, zanyar, nivîskar û hunermendant dinasim ku, di

nav partiyên politîk de cih girtine. Bi tay-beti partiyên çep û sosyalîst, di vî warî de gavêñ mezîn avêtine pêş. Ekonomên weke Ernest Mandel, Filozofen weke Louis Al-tusser û Lucien Coletti, sosyologên weke Göran Therborn û Nikos Poulantssaz, nivîskarên weke Jean Paul Sartre û Nikos Ritssoz û bi hezaran rewşenbîrên din, di nava politîkayê de aktif cih girtine. Her yek ji van kesan di warê xwe de pisporekî cîha-nî ye. Wan him xebata xwe him jî xebata hevalbendêñ xwe yên politîk pêş de xistine. Politîka bi mana fireh kûr kirine. Dogmatîzma politîk şikenandine. Wan hewl dane ku poltîkayê weke çalakî, ji atmosferên dînî dûr bixînin. Hetta ku ji wan hatiye wan hewl dane ku poltîkayê ji fen û fûtêñ bi-çûk, sextekariyan û ji otorîtaya serokan derxînin. Politîka bi hemû awayî diviyabû li ser prensîbêñ wekheviyê û demokrasiyê bi rê ve biçûya. Li gora van rewşenbîrân politîka divê li ser hîmê zanebûnê, li ser durustiyê, li ser xebata bi aqil, li ser hevalbendiyê û li ser bingehê ideolojiyek zelal bimeşîya. Hinek ji van rewşenbîrên çep û sosyalist, di hêla zanyarî û nivîskariyê de, ekolên nuh ava kirine...

Vêca hindik û rindik mirov dikare wuha bibejê; Rewşenbîrtî û politîka divê bi hev re werin meşandin. Di vê xebata prensîbî û politîk de, ji bo rewşenbîrân tenê prensîbêñ rewşenbîrî divê bibin bingeh. Rewşenbîr divê rewşenbîrtiya xwe zanibe. Ev yeka di-vê ji bo hemû kesan zelal be. Lê ji bo ku prensîbêñ rewşenbîrtiyê werine rûniştan-

din, divê kesên rewşenbîr ji, bi hêsanî kari-bin jiyana politîk biserifînin. Divê mirov bi xwe karibin bi hêsanî rastiyêن xwe yên politîk bipejirînin. Politîka di xeyal û xewnan de bi rê ve naçe. Politîka li ser nakokiyêن ekonomik, ideolojîk û sosyal şikil digre. Hêyanê xwe ji vê rastiyê digire. Bêyi vê rastiya politîkayê, tu hêz û mirov nikarin politîkayeke zanyarî bidine meşandin. Ar-mancêن politîkayê tenê ne ji bona politîkayê ne, politîka bi xwe çalakiyek mirovanî ye. Di politîkayê de nakokiyêن mirovantiyê û civatan hene. Ev nakokî divê li gora hin-ek prensîbêن zanyarî û sosyal werin çare-serkirin. Yan na politîka dibe çalakiyek vala û bêmane. Rewşenbîr divê rastiya politîkayê qebûl bikin û politîka ji divê hurmetê ji prensîbêن rewşenbîrtiyê re bike. Em weke mînak bêjin; Ewê ku bixwaze di deryayê de here seyda kewan, ewê xwe bixapîne û vala vegere. Ji ber ku di deryayê de masî hene lê kew tunene. Di politîkayê de ji, nakokiyêن mirovî, sosyal, kulturi, netewî, navnetewî û çînayeti hene. Ji ber wilo ji divê rewşenbîr bixwazin van nakokiyân bi metodêن rasyonel û zanyarî çareser bikin. Zanebûn û xebata xwe di vî warî de konsantre bikin. He-ger ku bi vê armancê rewşenbîr werin nava politîkayê û aktîf cih bigirin, wê gavê ew bi xêr hatin. Na heger rewşenbîr ewê politîkayê hîn bêtir bilewitînin, wê bikine weke gellaciya gundan û berberiya eşiran, wê ga-vê ew li cihê xwe rûnêن bi raya min baştir dibe. Ez bi xwe di wê bahweriyê de me ku rewşenbîrêن Kurdan dixwazin, bi awayekî

aktîf di nava xebata politîk de cihê xwe bi-girin. Xebata ji bo welat ji bo wan e ji. Lê ez bi xwe hîna ji ne bawer im ku, rêxistinêن Kurdan yên politîk xwe ji bo vê yekê ama-de dibînin... ■

# Bêdengî mirina rewşenbîran e

Medenî Ferho



*"Ez mirov im, hember tiştên têkilî mirov be  
nikarim nitirandî bimînim"*

*Terentius (B.İ. 190/159)  
Helbestvanekî Romayî*

Mirovanî li kuderê tê perçiqandin û tê qirkirin rewşenbîr li wir e. Helbet, bi raman û mejûyê dilrewanî ku bi stewihan-dina pêñûsa xwe sîtemkariyek hawarî di nava têgihiştinek humanîstî de tê pêkanîn. Mirovên xwedî bawerî û xwedî diljîn ku navekî taybet li xwe dikin pêwistî hinek baran û hinek karbendîyan e. Li mala xwe radaî, li ser kursiyê xwe rûniştî ne bar tê hilgirtin, ne karbendî tê pêkanîn. Têkiliyek giştî bi demedoran re, bi dorferehî bi cîhanê re pêwist e. Beqa di çalê de, di vê demjiyana teknolojî de êdî kor û kerrende bûye. Belê, helbet her mirov hember jiyanê, hember xelkên di nava wan de dijî berpirsiyar e. Lê hinek mirov hene ku bêhtir ji her kesî milkul û binbar in. Lewra jî navekî taybet li wan hatiye kirin. Tukesî jî ew mirov ne êxistine bin wî bar û karî. Bi dilxwaziyek xas, bi hewngîriyek ji xwe qayil pêşîra xwe vekirine û sînga xwe dane ber barê jiyanê, ber karê rêberiyê. Ev navê taybet jî rewşenbîrî ye. Mîna her

geli, gelê kurd ji xwedî rewşenbîr e... Bêguman hejmara rewşenbîrên kurd (ne li gorî pîvan û wezna literaturî) pîr in. Bêhtir ji yê her gelî ne. Her kesê ku gergûnek kire stuwê xwe, bedlekî útikirî li xwe kir, por û simbelê xwe, heger hebe riha xwe pîpikan-dibe rewşenbîr e. Di civîn û civatan de her wîlo xuya dike û hejmarek neqam derdike-ve hemberî me. Helbet ev dilşahiye k. Zê-debûna kesen xwedî bîrûbawerî, xwedî hewnekî xas û taybet nîşaniya sexlemî û qe-wîniya bingehê çand û huner û zanistê ye. Sexlemî û qewîniya bingeha çand û huner û zanistê, ji bo komên xelkê rûmet e. Nenêrin ku dîroka mirovaniyê her behsa mirovîn xwedî şûr û mertalan dike. Nenêrin ku rûpelên dîroka cîhanê bi dabaşa zalim û dilpolayên serkêş hatiye dagirtin. Rûmet û xîreta jiyanê, mirovîn xwedî ked û xwehdan û mirovîn zanist û xwedî huner in. Cîhan bi saya van kesan hewqasî xweş û têr nîgar e. Hewce nîne ku em mînakän li ser kes û kûsan bidin. Bêguman di vê derheqê de her kes xwedî zanînek e ku dîroka iroyîn di refîn pirtûkxanan de cihê herî mezîn û girîng digire, pirraniya van berheman ji (ji sedema qirkirin û kuştin û wêrankirinê) rûreşiyek mirovaniyê ne. Lî, hinbihin kar-bendî û pêkanînên rûmetî ku cîhan pê têr nîgar bûye bi nirxandinek mezîn cihê xwe di pirtûkxanan de digirin.

Gelo cihê rewşenbîrên kurd di vê qonaxê de çiye? Çiqasî xwedî rûmet û xwedî ked in? Berpirsiyarî û karbendiya xwe çiqasî pêk tînin? Ev her sê pirs û bersiv nasname-

ya rewşenbîrê kurd e.

Di demjiyanê berê yên kevnare de bû-bû adet... Dema mirovîn çê derdiketin û serkêşıya komên xelkê dikirin, bi pesin û wesifdanê têr sirri û saloxdanê hêzên winda yên mîtolojîk ku biryar û hinart ji wan re dihatin, karê xwe dimeşandin. Komên xelkê bi van biryar û hinartê nediyar ku gotin û galgalên efsanewî û mîrxasiya xwedayî di nava wê de pîr bûn, xwe pê-wistî sertewandina benderî didîtin. Her bû-yer û çalakî di encama mîstîkî de pêk dihat û birûsk û çirîskên felekî tevlî hevûdin dibûn û di kefa mista wan mirovan de dibûne bênderên gulbijêrkan, ku stran, çîrok û çîvanokên wan heya îro ji dijîn. Heger di van bûyer û çalakiyên ku di berhemên ku-rebavan de di encameke gilûgazinî, di hû-nandinek têr yarî de hatibe îdealîzekirin ji, avahiya îro ya modern ku dikarin erka xwe di ser rûwê cîhanê bidin meşandin, hatiye pêkanîn. Shakespear, pirraniya caran di berhemên xwe de dabaşa pêkhatina şer û aştiyê, di jêhatbûn û serkeftina malbatê qeranê bi hêz de daniye meydanê. Şerrên hundirû bi vê temtêlê tîne ziman. Helbet di vir de naverok bi zimanê wêjeyî, di enca-ma komaleyetî de, di nava komên xelkê de bi tevger kiriye û li hevûdin pêça ye û bi zi-manekî girêdanê daniye masetê. Ne bes gotinê kelevajî û kelmemanî!... Wêjeyî û hewngîrî bûn... Helbet wê gotin û galgalên wîlo xwedî bandorek bin. Di jiyana berde-wam de wê bijîn, û rêzaniyê bikin. Rêzan, ew kesen xwedayê wan berhemên têr yarî

afirandine û rîbûwar nişanî komên xelkê kirine ne. Mînak: Xwedayê Gargantua û Pantagurel, Françoîs Rabelaus... Yan jî Shakespear... û hwd. Lewra rewşenbîrên kurd pêwistî berhimbêzkirina têkoşîna kurd in ku bi hêz bikin, di rîbûwariya sivîlîzasyonê de rînas û dorfereh û bixwedî bikin. Mînaka Nerûda ji bo vî karî ya herî nêzîk û baş e...

Her dem rîzanî nabe war, yan jî nabe armanc... Hewngîrên rîzan di karê xwe de bi yek temtêlê karbendiya xwe nayînin cî. Mîna felsefa Frensî ku rîçik û rîbûwariya mirovaniyê berhimbêz kiribû, ronakbîriya Almanî hişk û bêpalk di encama teoriyê de xwe ava kir. Hişk bû... Bêşik, bi hişkiya xwe, zaboq û navberên reş jî derxistin hemberî xelkê Alman. Lê bû bingehek ji bo pêşerojan û avaniya civakî ku îro di hêla teknolojî de neqam e derxiste meydanê. Rêzaniya rewşenbîrên Alman jî, yên Frensî jî, ji komên xelkê re bû serfirazî. Li gorî mînakîn cîhanê tê xuyakirin ku rewşenbîrên gelan teva, bilî rewşenbîrên kurdan, populasyonek di nava komên xelkê de çêkirine. Piştî ku populasyon hate pêkanîn bandor çêdibe, rîzanî pêk tê.

Di vê qonaxê de rewşa rewşenbîrên kurd çiye?

Bi rastî, rewşenbîrên kurd di hêla elîtîzmî de baş in, lê di hêla populasyonê de cawê zivir in. Ku em dêhnê xwe didine rewşenbîrên xwe tevlî gelê kurd nekirine û derî gelê xwe mane, vê hêza ku ji elîtîzmê tê, di warê neqam û pêkhatinên hampan

de bikar tînin û pirr fêdê didin dora xwe. Rêzaniyek xurt dîkin, serkêsiyek jîr dîkin... Mixabin ku berê wan kete rastiya kurdî de dilqermîçi dimînin, milkulî dibin, qof û kor û şîlûşatî dibin. Ne rîzanî dimîne, ne serkêşî... Karûbar dimîne rexneyên têr gotin û galgalên kelmeman û kelevajî...

Gelo çîma ev xewna ji xelkê re jiyan dibîne, dibe serpêhatiyek çavdarî rast ku şaxû-perr dide, çîma ku ber kete teref kurdan de, ev xewn kor dibe, felûş û şas dibe? Gelô, pêkhatinên sedsalan û di nava ezayên laşê me de hatine hûnandin bandorê li me dîkin? Ji bo xelkê jiyanek profesyoneli heye, di vê profesyoneliyê de karên mezin pêk tê. Lê ji bo xelkê kurd ev profesyoneli ci-hê xwe dide Oblomoviyê... Îro, behsa sistêma nirxên nûjen tê kitrin. Cihan di tevgerék nû û xwepêçandinek politîk ya têr qerqeşûn de ye. İdeolojiya hemdemî kapîtalizm... Zanistiya hemdemî xilmetî (karbîdestî) gelê kurd di navbera xwe de diperçiqîne, hêdî hêdî berê wî dide helandin û windabûnê. Bêhtir ji demê, îro pêwistiya kar û barê afirandinê heye. Afirandinên zanisti, wêjeyî, çandî di vê hêlê de wê rolên pirr mezin bileyizîn. Divê ku rewşenbîr hewl bidin xwe û di nava vê guhertin û hûnandinê de bi rîkûpêkî rîzaniyê bikin. Serkêşî ne bes di warê leşkerî û politîk de ye. Ew serkês û rîzanîn politîk û leşkerî hewceyî rîzanî û serkêsiya rewşenbîran e ku di hêla hewngîrî û zanistî de berheman bidin. Helbet guhertin di yek rengî bi tenê de çênabe. Rastiyek bi tenê jî tune ye. Her kes

gavê li gorî rastiya xwe biavêje, li gorî ramان û çavdariya xwe cîhanê bide zîvirandin çenabe. Divê guhdarî hebe. Divê çavdarî hebe. Divê zanyaî hebe. Bi van tevan re divê ku berpirsiyariya hemdemî hebe. Ji yana kurdan ketiye nava gemarek ku ji teref dijminekî dijwar ve her roja ku diçe hê bêhtir gemarî dibe de. Qet şasî di vir de tuneye ku ev gemarî li ser dilê rewşenbîrên kurd jî heye. Di şertên iro de dilpakiya rewşenbîrên kurd çenabe. Em li tewanbaran nagerin, bila kes jî negere. Rewşenbîr ne pêwîst e kesan, yan jî rêxistinan tewanbar bikin. Pêşî xwe... Pêşî xwe... Piştire xelkê...

Divê xweş bête zanîn ku bîrdoza Saint Simon (1700/1829), ku dibêje 'karbidestî (pişesazî) wê kêfxweşî û dilşahiyê bîne', mi xabin ji bo me kurdan weke gotina Bûm ji Kiso re bû 'aqûbet' malkambax ya parvekinin û levakirina bazirganiyê. Pêwistiya li xwe xwedîderketinê derketiye holê.

Pêwîst e... Pêwîst e ku nivîskarên kurd, rewşenbîrên kurd vê demê di nava derya çandê de xewasên ji xwe mezintir bin. Heya dikaribin bersiva demê bidin. Ji ber ku mirovanî, ji destpêkê heyâ iro bêqutebir di nava avaniyek têr guhertin de ye. Iro, bêhtir ji her demê ev rastî derketiye pêşıya me. Divê ku rewşenbîr bêdeng nemînin. Gelê kurd, divê nekeve nava bêhêvîtiyê. Bêhevîti mirina bi saxî ye. Bêdengî jî mirina rewşenbîran e. Lewra dibêjin bêdengî dijminê jiyanê ye.

Rewşenbîrên ji xwe razî û li xwe êmin,

rûmeta mirovaniyê ya xwe dibînin ku bi navê humanîstî tê binavkirin û di ser her nirxî re tê girtin. Ew rewşenbîrê rûmeta gelê xwe neparêze nikare ya xwe jî, ya komên biyanî jî biparêze. Pîvan, digel jiyanê ev gav in. Fîdeîzm nabe berpalik, nabe rêçik û rêbûwar ji kesen xwe bi rewşenbîrî bibîne, nikare baweriyê têxe dewsa zanistê de. Xwedî derketina gelê kurd di vê qonaxê de xwedî derketina li xwe ye, li rûmeta mirovaniyê ye. ■

# Întellektuel

Riza Polat

**L**i ser tarîfkirina întellektueliyê li Fransayê ji bûyera Drayfuss heta nuha munaqeşe nesekinîne.

Întellekt, bi latînî di maneya zekayê de tê bi kar anîn û ji bo mêtîyekî hatibe terbiye û perwerdekirî jî, mêtîyekî întellektuel tê gotin. Mirov dikare bibêje ku di her zimanî de maneya întellektueliyê bi zanîn, kultur û mêtîyekî ku diafirîne ve girêdayiye. Ji ber wê jî ji bo kesekî xwendineke kûr û baş kiribe û bi taybetî li ser pirsekê zanîneke berfireh hebe ew kes bi întellektueliyê hatiye bi navkirin,

Hemû munaqeşeyên li ser ma'ne û çerçewekirina întellektueliyê hatine kirin, li ser bingeh û çerçewa zanîn û kulturê hatine kirin. Di sedsala nozdehan de întellektuelî bi nivîskar, lêkolîner, mamotoe û bi keşîşan dihate çerçewe kirin. Lê munaqeşeyên ku vê paşiyê li ser çerçewe û bi navkirina entellektuliyê hatine kirin, bi pêşketina civakî ya teknîkî, ilmî û aborî ve girêdayiye. Firehgirtina vê çerçeweyê ne li gor "şela siyasi", "wijdan" yan jî "li dij zilmê" ye. Ev çerçewe li gor grûbênuh yên ku di pêşketina civak, teknîk û ilmî de rol listine, zêde û fireh dibe.

Ji bo Antonio Gramsci "sistema sermayedar" her roj ji bo xwe pispoten teknîkî, aborî û huqûqî digihîne. Ji bo Gramsci reklamciyekî baş bi reklameke nuh bikaribe tesîreke mezin li bazarê bike, ew karekî întellektuelî dike. Di jiyana civakî û ya aborî de her keşfeke fizîkê, kimyayê tesî-

rekê li motora li vandina civatê dike. Her keşfeke Alfred Nobel ya di fizîk û kîmyayê de xebateke intellektuelî ya dahiyane ye. Heger mirov li gor pîvanê hinek kurdan û "şêla siyasi" bifikire; Alfred Nobel ne intellektuel e.

Intellektuel bi afîrandina xwe ya fîkrî û hunerî intellektuel e. Ne ji bo şêla xwe ya siyasi.

Di dîroka intellektueliyê de intellektuelên gelek bi nav û deng hene ku di meseleyên siyasi de şel û helwestên gelek cuda stendine hene. Yênu ku bi partî û teverênen "paşverû" û "pêşverû" re helwest gitine jî di dîrokê de ne kêm in.

Hinek Kurd bi rehetî dikarin bibêjin ku terma entellektuliyê ji bo kesen ku bi "karên fîkrî" mijûl dibûn dihat bi kar anîn, lê iro ev dîtin teng e. Ji bo kesen weha difikirin êdî diploma, zanîn, nivîskarî bi serê xwe sifeta intellektueliyê nade mirov. Ji bo Kûrdêñ weha ji bo ku kesek bi intellektueliyê were bi navkirin, pêwîst e şoreşger, welatparêz û demokrat be.

Heger mirov bi van pîvanan hereket bike Nobel, Mozart, Goethe û Albert Camus ne



*Her keşfeke Alfred Nobel ya di fizîk û kîmyayê de xebateke intellektuelî ya dahiyane ye*

intellektuel in. Çunkî Nobel tenê di fizîk û kîmyayê de keşfên nû kirine, Mozart di hunera mûzîkê de mehareta xwe nîşan daye. Ü tiştên ku ev dahî pê mezin bûne û di qada intellektueliyê de ciyekî bilind stendine, huner û ilmê wan e, ne şêla wan ya siyasi ye.

Li gor pîvanê wan Kurdan Albert Camus ne intellektuel e, çunkî wî li dijî şerê pîs ê Fransayê

(yê li dijî gelê Cezayîrê) helwestek negirt. Filozofê Alman Martin Heidegger ne intellektuel e, çunkî ew bû endamê partiya Nazî û piştgiriya Hitler kir. Lê di dîroka felsefeya Almanî de filozof cih û qedreke bilind didin wî.

Heger tenê li gor şêla siyasi, wijdan û dijî zilm û zordestiyêbihata pîvan bê guman wê navê Zapata yê Meksîki, Omer Muxtarê Lîbyayê û Simko Axayê Şikakî di dîroka intellektulîya cîhanê de cih bigirta.

Min ev mînak hemû ji bo bêñ zanîn ku intellektuelî li dunyayê bi fikir, zanîn û huner ve tê pîvandin. Ne bi şêla siyasi, wijdan, ehlaq yan jî bi heqî û neqiyê tê pîvandin. ■

# TE PIRSIYAREK JI XWE DIKIR

Yawer

I

Ji xamoşıya şevistanê,  
ji welatê tarîkî û bêdengî û taseve,  
ji herêma xem û derdedarî û dûriya welêt  
te gavêن xurt û mezin diavêtin û ber bi tîrêj diçûyî...  
Hêviyên geş û birîskedar di dilê te da  
çîra bûn, çirayên xoşbextiyê,  
çirayên ronahîdar.  
Awazêن germ li ser zarê te  
sirûd bûn, sirûdêن evîndariyê,  
sirûdêن bêsereta û bê diwayîhatin.

Asman bi sitêrêن rûxweş û dev bi pêkenîn  
xemilî bû,  
dilê te jî, dilê te yê mest û xembar,  
nivînan hezaran xewnêن  
kesk û sor bû.  
Te pirsiyarek ji xwe dikir:  
Gelo ev destpêka jîneke teze ye,  
yan tenê bi dumahî hatina demêن bêwelatiyê ye??  
Bersiv kevokeke sipî bû,  
ji kaniya guman û dûdiliyê difirrî û  
di daristana çavnêrrî û hêviyê da  
vedinîşt.

Eger ji te pirsiyara navê çiyayan bikin  
tu dibêjî: Nîştiman.

Temaşeya nexşeşa nîştimanê jî dikâ  
pêlên rondik û birînan dibînî,  
yêñ ku sinûr çê dikin, sinûrêñ reş û tarî.  
Êvaran,

gava te bo welêt nivêj dikir  
digotonin: Êdî destê te keziya mîrgan şeh nake,  
çem û rûbarêñ evîndar  
ji bo şevêñ tenhayiyê sitranan nabêjin...

Lê te dizanî û baş jî dizanî  
di hemû werzêñ salê da,  
li Rojhelat bî yan Rojava,  
yek rûgeya te heye, yek rûge  
ew jî Kurdistan e.

3

Rojên ser bi tem û mij hêdî hêdî  
ji bajarê te derdikevtin.

Baraneka rengareng û bihar e  
mal û der û dîwarêن te şil dike...

Baraneka rengdar,

baraneka xembar,

ax û kevirêن welatê te rengîn dike,  
dilê dildaran xemgîn dike.

Sitrana ba û baranê fêr dibî,

sitrana roj,

sitrana sitêrên ges,

sitrana rengê asman fêr dibî.

Ji bo evîn û azadiyê

awazên te, hemîşe,

awazên xwîn û fidakariyê bûn.

Ji bo evîn û azadiyê

Jîna te, wel pêşmergeyek,

hemîşe evîndara merg bû,  
evîndara merga serberziyê,  
merga bê navûnîşan.

Tirsa te ji şev û ji şepolên tarîtiyê  
tunebû,  
di bahoz û ziryanan da  
dilê te nedilerizî,  
çunke  
te çîrûskeke geş, ji dûrve, didît,  
çîrûskek ku humêd û bawer  
di dilê te da şîn dikirin...  
Azadî bûk bû  
tu jî evîndarekî dilgerm.

4

Hezaran sal  
tu pasevanê dîrokê bûyî, hezaran sal...  
Leşkerên erek û rom û ecem  
welatê te kirin qada şûr û tîran,  
qada top û tifeng û bombayan.

Rûbarêñ te birîndar kirin,  
daristanêñ te di zîndanan da dîl kirin,  
dixwastin ciyayêñ welatê te veguhêzin,  
dixwastin agirê te yê pîroz vemirênin,  
hemîşe her hejar û geda bî,  
hemîşe bêmal û bêbeş û bêwelat bî,  
bê zevî û bê asman bî,  
dixwastin ne tu hebî, ne jî navê te...

Lê  
te navê xwe di dîwanêñ Cezîrî û Xanî da,  
di şî'rêñ Nalî û Koyî da nivîsibû.  
Te çîroka evîna xwe  
li ser berd û tawêrêñ Bêsitûnê,  
li ser lûtkeyêñ Helgurd û Sîpanê nivîsibû.

# Komutan

Serdar Roşan

Cara yekemîn bi cîpa eskerî hat û li ber qereqolê peya bû. Avahiya qereqolê li perê gund li hêla rojhelatê, xaniyekî yek qat bû. Di eslê xwe de wî dixwest cîpa xwe li qeraxa gund bide sekinandinê û bi rêçûna xwe ya eskerî di nav gund de piyase bike, da ku temamê gundiyan, wî bi bejn û bala wî, bi kinc û meşa wî ya eskerî, bi rutbeya wî ya "komûtan" bibînin. Di xwest di roja ewîlî de xofekê têxe dilê wan...

Piştî ku xwendegeha leşkerî di sala şêst û nehan de xilas kir, ev cihê wî yê yekemîn bû ku wî dê dest bi kar bikira. Dilê wî germ, bi daxwaz û bi heyecan bû. Bi şewq û serbilindî dê xizmet bikira. "şaristaniya bilind" ya ku li xwendegeha eskerî fîrbûbû dê li derûdora xwe, li gundan bi reşandana, dê wek çirayekê, di nav tarîtiya newal û çiyan de şewq bida.

Gava di deriyê hewşa qereqolê re kete hundir "onbaşı" yek û deh esker ketibûn rêtê û li hêviya wî bûn. Piştî silav û teqdîmên eskerî ew derbasî bin çardaxa ku di hewşa qereqolê de bû, bûn. Ber êvarê bû, gundi hîn ji karêñ xwe yên rojane venegeriyabûn malê. Ji lewre "komûtan" di dilê xwe de merraq dikir ka gelo çima wî kes ji gundiyan nedîtibû. Hema bêje li ser riya xwe ji bilî zarokan, rastî tu kesî nehatibû. Ji xwe gava çavêن zarokan bi eskeran diket, zarokan xwe didan alî, an jî xwe li pişt daran, keviran, dîwaran vedişartin û bi dizî li rêçûna eskeran dinêhêrtin.

Piştî çend rojan li deverê herkesî êdî dizanî ku "komûtan" ekî nuh hatiye.

Ji gund û gundêñ derûdor kesên ku li qereqolê çay vedixwarin, hatin li “komûtan” bi xêrhatin kirin, “çaya xwe” vexwarin, xwe dan nasîn û çûn. Wî bi xwe jî hemî rapor û dosyayêñ derheqê gund û gundêñ derûdor xwendin. Wî êdî dizanî ka kî tê çaya wan li qereqolê vedixwe.

Ev çend roj bûn ku Filo teví pismamê xwe Mûsa li gundekî nêzî sînor li hêviya “malê” xwe bûn. Roja ïnê xeber dan wan gotin “malê” we dê îşev teslîmê we bibe û divê di eynî şevê de hûn ji sînor derbas bibin... Filo û Mûsa bi alkariya rêberan li ser pişta hespêñ xwe û bergirek barkirî ji sînor derbasî hundir bûn. Herçî Mûsa ev cara çaran bû, lê Filo ev cara yekemîn bû ku dihat kaçaxiyê. Filo hin pere deyn kiribû, hin jî ji firotina çend bizin û mîşînêñ xwe bi dest xistibû.

Ev du hefte bûn ku bi roj li gundêñ nas an jî di şikeftan de diman, bi şev bi dîqet ber bi gundê xwe diçûn. Jibo ji rêçûna hespan deng neyê simêñ hespêñ xwe kulav kiribûn. Niha bi tenê riya çend saetan li pêşıya wan ma bû, jibo ku bigehêñ malê.

Filo zewicî û bavê du zarakan bû, zarok hîn piçûk bûn, nan û xweya çar kesan ketibû stûyê wî. Jina Filo dizanî karê qaçaxiyê dijwar e, gelek kes hatîne kuştin, girtin, an birîndar bûne, wê nedixwest Filoyê wê here qaçaxiyê, lê Filo carekê biryara xwe da bû, dê biçûya. Filo dixwest bi karê qaçaxiyê hin peran bide serhev da ku paşê karibe jî xwe re zeviyekê bikire... Ji jina xwe re digot: “Ma wek herkesî parçeyekî erdê me jî hebe xirab e?” şeva ku sibetir dê Filo birêketana, di nav cihan de Filo li ber jina xwe digeriya, dixwest berê çûyîna xwe dilê wê xweş bike, wî soz da wê got “piştî vegerê ez dê bazinekî zérînî buha ji te ra bikirim.” Jina wî rondikêñ xwe di tariya şevê de bi goşeya lihêfê zuha kirin, xwe nezîkî Filo kir û ket hembêza wî...

Meco bi tirkî digot:

– Komûtanê min, min xeber stendiye ku sibe bi şev dê hin qaçaxçî di newala Kûsiyan re derbas bibin. Pirr mimkune ku barê wan pirr hêja be...

“Komûtan” ji kêfan ne dikarî li cihê xwe bisekine, devê wî ji hev diçû; di bin simbêlan re dikeniya.

Nobedar ji “komûtan” û “mêvan”ê wî re çay anî. “Komûtan” ji Meco re got “pirr baş e, hertim bila welê çavêñ te vekirîbin. Ez ví tiştê te kiriye ji bîr nakim. Aferîn ji te re.“ Derengê şevê Meco xatir ji “komûtên” xwest, ket riya gundê xwe ...

“Komûtan” teví heft eskeran roja dotir ber bi newala ku Meco salix dabû,

bi rê ketin. Hatin di newalê de bi cih bûn, ketin kemînan û li hêviya kaça-xçîyan man. Derengê şevê çend qeretûn xuya bûn. Edî dilên "komûtan" û eskeran bi hêztir lê didan. Piştî ku qeretûn hatin nêzîkî wan, berî ku bi işa-reta "komûtan" li wan bi teqînin, eskerek jibo çîpê xwe yê tevizî rehet bike lingê xwe yê çepê dirêj kir, bi livîna wî re kevirek gêr bû, bi gérbûna kevîrê re Filo û Mûsa ketin tevdîrê, bi "dengê teslîm bibin, dora we hatiye girtin" li wan hate teqandin, hespên wan veciniqîn. Filo û Mûsa berê hespên xwe dan kêleka şiverê da ku di nav daran de xwe winda bikin. Di wê gelemşeyê de bergîr ji dest wan filiti û ber bi pêş çû...

Filo û Mûsayî di nav daristanê de rêça xwe winda kirin, lê bergîrê wan ke-te destê "komûtan" û eskerên wî...

Derengê şevê hîv bilind bûbû. Dinya di bin heyveronê de bû. Piştî çend saetan gihaştin qereqolê. Bi emrê "komûtan" anîn barê bergîr danîn, hejdeh mawzer bûn. "Komûtan" ji kêfan dikir bifire... Eskeran, jê re av anîn ser û çavêن xwe bi ava sar şûst. Li bin çardaxê rûnişt; li hêviya qehwîyê bû.

Sebra wî nedihat, fîkrîn cur bi cur di serê wî de diçûn û dihatin, ne dikarî li ser tu hizrekê bisekine, bifikire; tu rastiyê bêjî ji fîkrîn tevayî bêtir, parçeyên hin ramanan di hişê wî de divejîn û winda dibûn, ew diçûn hinên din peyda dibûn... Piştî qehwe vexwarinê rabû ser xwe, li bin çardaxê çend car çû û hat; her difikirî... Meşıya çû ser banê qereqolê, dest bi piyasê kir. Li ezman fekir, berê xwe da rojhelat, di dilê xwe de "ev roj çîma hilnayê iro" got, hêrs bû; nifirek kir. Ji hêlekê ji serkeftin û bidestxistiyêن xwe serimest bûbû; nedixwest wê serkeftinê bi hinên din re par ve bike; li hêla din ji kêfa xwe re li şîrîkan digerî, dixwest dinya alem hemî pê bizanin; werin, wî karê payebilind bibînin, bibihîzin û wî pîroz bikin. Li çiya mêzekir, di nav tariya şevê de çiya bi xof û heybet dixuya. "Ev çiya jî nahêle ku roj zû derbê" got, bîstekê sekinî, bi gotinên xwe kenîya. "Ez jî ema bûme pitpitok" got û hinek din jî kenîya... Çû li ber kevirên li ber banê qereqolê qûçkirî sekinî, piyê xwe yê çepê danî ser koma keviran, di bin roniya heyvê de li siya xwe temaşe kir... Ji bêrika xwe pakêtek derxist, cixareyeke xiste nav lêvîn xwe, cixareya xwe pêxist, serê xwe piçek bilind kir; niha pişta wî rast, sînga wî nepixî û zik ber bi hundur kişandî bû; cardin li siya xwe fekir; bi kêf û bi temaşekirina siya xwe çend nefes li cixareyê xist... Meşıya hat qeraxa pêşîn ya xêni sekînî, ji jor de ji ser banî li çekîn ber qereqolê fekir; bîbilkên çavêن wî dibiriqîn, eger baskên wî hebana dê firek bidana xwe û xwe bera ser wan çekan bida; mîna

teyrekî ku nêçîra xwe dixe nav pencên xwe dê wî jî her wisa bikira...

Ji ser banê qereqolê daket hat bin çardaxê, fikrek balkêş hate hişî wî, xwe bi xwe “bila bibînin, bila ji wan re bibe ders” got. Gazî nobedaran kir, ji wan re got “van çekan hildin û li pêşıya qereqolê sêpikan çêkin.“

Eskeran sêpik çêkirin. “Komûtan” rabû, ber bi riya ku di ber qereqolê re derbas dibû çû, di nav rê de sekinî û li sêpikan mêmekir, lê ne eciband. Got “çekan li ber dîwêr rêz bikin!” wek wî gote kirin. Careke din çû ji dûr ve li çekan fekir, ji wê derê emir da “ bila piçek ji hev firkbin!“ ... “temam temam îcar çêbû, muhtesem dixuyên“ got û hat li bin çardaxê rûnişt...

Êdî sibe bû. Roj ji pişta çiya bi şewq bilind dibû, tîrêjîn wê ezmanê gund zûde ronî kiribûn. Gundî wek her carî piştî limêj û xurîniyê jibo herin nav zeviyên xwe dihatin û di ber qereqolê re derbas dibûn. Lê wê sibehê guherti-nek balkêş xwe li pêş awêrin wan dida xuyakirin; namlûyên çekên li ber dî-warê qereqolê rêzkirî dibiriqîn û li bin çardaxa qereqolê ling li ser lingan rûniştî, ji cixara “komûtan” duxan hildikişıya... ■

## ŞI'REKE SÊWÎ (\*)


Hêdî pir hêdî  
Ro l' danê rojê  
Cî cî çemek dikene û digirî  
Ji dengê herikandina aveke fusûnkar  
Av û deng û reng di dilan de meşhûr dibe  
Tarî  
Hûr dibe  
Kûr dibe  
Dûr dibe.

(\*) Min vê şî'rê di sala 1965 de bi devkî ji Mihemed Emin Bozarslan bihîst. Sha'irê vê şî'rê nedihat zanîn û ez hê jî pê nizanim. Dibe ku ev di kovar an rojnameke mîna Dîcle-Firat an Yeni Aķış de derketibe, lê haya min jê tune. Lê dibe ku di tu derê de çap nebûbe jî. Bi vê gumana dawî, dilê min dest nade ku ev şî'ra bedew a hunermendiya bilind winda bibe. Ku hinek rojek li derekê çav bi orijînalala wê ya çapbûyî bikevin bila ji kerema xwe re haya me pêxin. **Rojen Barnas**

# Xewna Çelengê Koçer

*Sebrî Botanî*

C  
I  
R  
O  
K



**L**ingê xwe ê rastê bi kirasekî spî hişk pêça bû. Nedikarî li ser bigere. Dilê Şefiq pê şewitî û ji dûr gazî kirê:

– Kuro Çelengo, ci li te qewimî ye? Te bo ci ew lingê xwe pêça ye? Ka were... Were cigarekê têke û çayekê vexwe. Were, were çirokeke koçerî bo civatê bêje, gavekê bi xeyal, me ji vê zîndana wêran bibe derê.

Çelengê çeleng, ji wî rexê hewşa mezin, li ser lingê çepê û bi berdeqanê xwe hilavêt û hat rûnişt... Ev hatina Çelengo bi wî lingê xeliyayî û werimî ve, her ji kesên wek wî tê û bes... Rengê rûyê Çelengo wek bihokê zer bûbû.

Şefiq jê pirsî:

– Kuro Pilingo, kîjän teresbabî ev bi serê te de aniyê? Ka navê wî bide min, da ez rabim niha vê gavê yanzdeh salên xwe bikim panzdeh sal.

Çeleng bi qurték koçerî fîncana xwe ya çayê nîvî kir û got:

– Çelengê ci û Pilingê ci, ezbenî... Silav li sifra hazır e ezbenî... Ez rovikî yekling im, ne çeleng im û ne piling im, ezbenî... Ji Xwedê bawer bike, ezbenî, xewnîn vê xopana zîndanê nahêlin ez xweşiyekê ji xwe bi-

bînim ezbenî. Xew û xwarin li min bûne jehir û quzelqurt, ezbenî... Bi serê wî de bisetimê, yê ez anîme vir. Bawer bike ezbenî, hemû xelkê vê dinya genîbûyî ji mirinê direvin û mirin ji min direve. Min ew divêt, lê wê ez navêm, qey Xwedê ez ji kul û xeman re hiştîme, ezbenî... Min dirêj kir ezbenî... Qenciya te û civatê, ser serê min û yê bavê min, ezbenî... Lê pa bi destê min ev hatiye serê min, ezbenî... Ez ne ew kes im yê ku li ber şerfiroşen zîndanê dest hilînin, an hema carekê ji serê xwe hilda be, ezbenî... Lew jî ez û tu kes berangerî hev nabin, ezbenî... Zilam û hevalbendên çak û hêja ji tê de hene, ezbenî... Xwedê dinyayê ji wan kêm neke, ezbenî... Gelek mirovên bêşûc anîne dakirine di vê xopanê de, û yên pîs û pûçek li derve bi kêfa xwe, wek bi vêni dileyizin.

Şefiq:

– Axavtina te şekir e, Çelengo, car bi car li "qawişa" me jî diyar be loo, an tu bi me razî nabî?

Çeleng:

– Xwezî te ev negotiba, ezbenî.

Şefiq:

– Ji devê min derket, min xeletî kir, ka bo me tiştekî bêje, bîstekê me ji bir veke, loo.

Çelengo:

– Ma ji çîrok û serpêhatiyan zehftir çi heye, ezbenî? Lê vêca qiceqiq ji hînâvê min tê çunkî xewn û xeyalên me koçerên Xwedê hemû her pez û mîreg û pawan û çêre ye ezbenî... Lew çîrok û serpêhatiyen me jî bêtir li ser geryan û barkirinên me ne, hemû berbiharîk û deşt û zozan in, ezbenî. Dêmaniyen wek we vê nizanin, ezbenî... de ka ez ê xewna xwe ya şeva buhurî bêjîm, lê ew jî koçerî ye, ezbenî.

– Xwedê xêr ke, Xwedê xêr ke. Civatê lê vegerand û çav û guhên tevan li ser devê Çeleng man.

Çelengo cigara xwe vemirand, xwe kenand û got:

– Min pif kiribû bilûra xwe û pezê min diçêriya. Du seyên har û gir dihatin min, gelek dijwar bûn, ezbenî... Yek reş bû, yek gevoz bû, ezbenî... Herçend delîva revê hebû jî, lê ez nedirevîm, ma ez dê bi ku ve revîbam, ezbenî... Ez di nîv pawana xwe de bûm, min seyê reş şepirze kiribû, û yê gevoz jî min çoyê xwe yê darberû di serê wî de şikandibû. Beqam tengav bûbû ezbenî. Lê vêca ax û ax, heta dibime ax. Derdê min seyê min bû, ezbenî. Ax

Gewro, ew Gewrokê ku min bi nanê xwe xwedankirî, sal bi sal mezinkirî, ta ji bin mineta derketî, dibû hevalê wan û dihat şerê min dikir. Min dikarî lê wî nedihêla ez wan ji nêv pawanê rateqînim dûr. Ku kësa min li wan dihat, Gewro xwe dikir û dikete navbera min û wan de, lê ku kësa wan li min dihat, Gewro patika xwe dida min. Xwedayo, ez dizanim ku Gevoz û Reşo herdu neyar in, lê Gewro çîma, hey hewar? Ax Gewro.

Ez serê civatê neêşinim, bi saya xinizi û alîkariya Gewrokê me, herdu bi kîfa xwe, bê tirs û pirs di nêv pawanê de digerîyan. Dixwarin, vedixwarin û dileyistin, ezbenî... Ez dirêj nakim, di êrîşekê de ez gelekî tengav dibûm, ezbenî... Hawar hawara min diçû ber felekan, lê kesek li hawara min nedihat. Hêrsê ez digirtim, hawar Xwedê û destê min, ta ji min dihat, min ev lingê xwe yê rastê, vediweşande serê Reşo, da ez wî biperçiqînim, lê pa, heywax li min, li dîwarê qawişê ket û ez ji xew şiyar bûm, hê nû min zanî xewn e û ez di xew de rabûme ser pêyan û ew derd bi serê xwe anîye û zilamek jî bi xwe re êşandiye û hevalên qawişê jî hemû ji xewa şevê rakirine.

Hema Xwedê xêr bike, ezbenî, ez nizanim ka civat bo vê xewna min ci dibêje?

Civat bi hev re:

– Xwedê xêr bike, Xwedê xêr bike.

Silo:

– Heke melayê zîndanê iro hat, xewna xwe bo wî bêje, ew çêtir dizane.

Remokê Aqreyî:

– Qet ne zehmet e, mirov bizane xewna Çelengo ci ye. Gevoz, Ataturk e.

Yonîsê Duhokî:

– Reşo, Nûrîkê me ye.

Şefiq:

– Çeleng miletê me ye.

Cangîrê Botî:

– Gewro, begê me ye, hevalê dijminê me ye.

Şêrgul:

– Pavan welatê me ye.

Haho:


– Pez, mal û samanê me ye.

Çeleng:

– Gopalekî hesin, bo min peyda bikin. ■

# Hewî

Xemgîn Temê



## Kesên Tiyatroyê:

1 - **Şêrîn:** Keça Ehmed Axa, temanê wê hijdeh, esmer e, çavên wê reş in, porê wê dirêj e û kiriye kezî, eprêke hevrêsim, dide serê xwe, fistanê wê dirêj e û reş e.

2 - **Hemo:** Şivanê bavê Şêrînê ye, temenê wî nozdeh sal e, şal û şapika li xwe dike, xortekî zirav û dirêj e, bilûrvan e û carcaran helbestan dinivîse.

3 - **Ehmed Axa:** Axayê gund e, xwedî mal û mewdan e, xwedî xak û erd e, xwedî sewal û pez e, temenê wî cil û pênc sal e, dan û standina wî bi kesên dewle-mend re heye.

4 - **Mele Emer:** Melayê gund e, temenî wî şêst sal e, feqîr e, li ser zikata gundiyan dijî, pir bi ya Ehmed Axa dike û gelek pesnê wî dide.

5 - **Şêxmûs Paşa:** Temenê wî cil û çar sal e, maldar e, li bajêr dijî, xwedî jin û zarok e, ew û Ehmed Axa dostê hevdu ne, kar û barê Ehmed Axa li bajêr rêzgar dike.

6 - **Salar:** Mamostayê gund e, temenê wî bîst û heşt sal e, ji xelkê gund e, xwedî jin û zarok e.

7 - **Silo:** Qehweçiyê Ehmed Axa ye, di nav mala wî de kar dike, bi nanezêkê kar dike û bê jin û bê zarok e, bê pergel e, temenê wî sih û pênc sal e.

8 - **Eslan:** Mitirb e, dengbêj e, zirnevan e, zane li dahol û zirnê bide, zane li tembûr û

kemançê jî bide, aşiqê dawet û dîlanan e, gava dawet û dîlan nebin, li gund û bajaran parsê dike, temenê wî sih û pênc sal e.

9 - **Bêzerê:** Jina Ehmed Axa ye, temenê wê çil sal e, kiras û xeftan li xwe dike.

10 - **Lewend:** Kurê Ehmed Axa ye, temenê wî bîst û yek sal e li bajêr dixwîne, kêm caran tête gund.

11 - **Remo:** Bavê Hemo ye, temenê wî çil sal e, aşiqê kar e, lê qet tiştekî ji karê xwe fede nake, ji ber ku bêhtir ji Ehmed Axa re dike, mîrekî bilind e, xwedî zend û bend e, şal û şapikan li xwe dike.

12 - **Xezal:** Dayika Hemo ye, temenê wê sih û heşt sal e, ew jî di nav mala Ehmed Exa de kar dike, arîkariya jina wî dike.

13 - **Xelo:** Birayê Eslan e, xortekî temenê wî bîst û du sal e, deholvan e, qelew e û zikê wî mezin e, loma dehol li ser zikê wî bi cih dibe.

14 - **Şex Eli:** Şêxekî mezin e, xwedî mirîd e, li bajêr rûdine, gelekî zengîn û maldar e, dostê Şêxmûs Paşa ye, bi şaşık û cîbe ye, temenê wî pêncî sal e.

Rola tiyatroyê li gund çêdibe, kehniya gund li nav daran e, li derveyî gund e. Ava xelkê gund hemûyî ji wê kehniyê ye, li dora kehniyê darêن fêkî ne, dinya havîn e, piştî nîvro ye, pez li ser kehniyê mexel e, Hemo li ser kehniyê rûniştiye, li bilûrê dixe, dengê bilûra wî bi ser gund dikeve, Şêrîna keça Ehmed Axa tê ser kehniyê ku satilên xwe dagire.

## Beşê Yekem

**Şêrîn:** Roj baş Hemo.

**Hemo:** Roj baş Şêrîn, tu îro bikêfî, nûr ji rûyê te dibare!

**Şêrîn:** Tim û tim nûr ji rûyê min dibare. (*Bi dengekî bilind keniya*)

**Hemo:** Diyar e ku dengê bilûra min tu şâ kir? (*Bilûr danî erdê, li rûyê wê mîze kir û keniya, çavêن xwe lê girtin û vekirin da ew bikene*)

**Şêrîn:** Dengê bilûra te xweş e, min dilxweş û şad dike.

**Hemo:** Çavêن te jî min dilxweş dike, kenê te dilê min ges dike, dê ci bikim? Kêlîkê raweste ku li te mîze bikim; gava ez li te mîze dikim, ava vê kehniyê bi min şêrîn dibe, siha vê darê xwêdana min ziwa dike, jiyana vî gundi bi min xweş dibe!

**Şêrîn:** Ha... ha... ha... tu çiqas ji gund hez dikî! Ma li vî gundi ci heye? Jiyana bajaran ji ya gund xweştir e.

**Hemo:** Hemî tiş li gund heye; dibistan, ava sar, bayê hênik, kehnî û cobar, çiyayêن bilind, ma jiyan ci ye? Ev e jiyana xweş.

**Şêrîn:** Şivan û gavan hemî ji gundan hez diken. (*Satilên xwe ji kehniyê tije av kir.*)

**Hemo:** Bê şivan û gavanan, bê cotkar û rençberan jiyan nameşe, rast e ez şivan im lê ez bilûrvan im. (*Ber bi wê de çû û destê xwe avête pora wê.*)

**Şêrîn:** Dixwazim biçim, mêtvanê me hene.

**Hemo:** Raweste, dê bêhnekê li te temaşa bikim, evîniya te min dewlemend dike.

**Şêrîn:** Ha... ha... ha... (*Keniya û li çavên wî temaşe kir.*)

**Hemo:** Ez hez ji te dikim, tu rind û bedew î, nazikbûna te û cemala te ez bê hiş û sewdan kirim. (*Bilez ew maç kir.*)

**Şêrîn:** Şerm e, xelkê dê me bibînin, dû re dê xeber bigihêje bavê min.

**Hemo:** Çima bavê te dê çi bike? Ma hezjêkirin şerm e?

**Şêrîn:** Ez jî hez ji te dikim, lê ji bavê xwe newêrim, zor û zehmet e ku em bigihin hevdû, bavê min Axa ye û maldar e, lê tu kesekî şivan î, dê çawa çêbe, bavê te gizirê bavê min e! (*Li hemberê wê rûnişt.*)

**Hemo:** Evîndarî devwlemendiyê û hejariyê nas nake, dinya dolab e, rast e îro em feqîr û hejar in lê belkî sibehê dê dewlemend bibin.

**Şêrîn:** Çiqas tu dewlemend û zengîn bibî jî tu ê di ferhenga bavê min de her şivan bî! Ew qet qebûl nake ku ez û tu bi hevdu re şû bibin.

**Hemo:** Ne rast e, şivanî kar e, ne şerm e, kar namûs e, kar şeref e, ma çêtir e ku ez biçim parsê bikim, na...na Şêrîn, ez şivan im xwe pê xwedî dikim, ev ne şerm û ne eyb e, şermî ew e ku biçim parsê bikim.

**Şêrîn:** Rast e... Tu rast dibêjî, lê wisa di nav me de bûye adet, zor e dê karibin van adetan berdin, jê re divê, kar divê, kat divê, zeman jê re divê.

**Hemo:** Şûr û rim nikarin evîniyê biperçiqînin, heger bavê te qebûl neke em ê hevdu bire-vînin, ji vî gundî bi dûr bikevin, dê xwe bavêjin tor û bextê ciwamerekî ku me biparêze ji kuştinê. Cîhan mezin û fereh e, cihê her mirovî tê de heye.

**Şêrîn:** Dê çi bikim, bê çare me, jin darê şikestî ye.

**Hemo:** Jin jî weke mîran in, çavê xwe veke û binêre çiqas jiyan xweş e, tiştek li vê derê nîn e ku diyarî te bikim, ji bilî dengê bilûra xwe, ava sar û zelal, bayê hênik, siya daran û tîrêja royê.

**Şêrîn:** Ji wan tiştan xweştir nîn e, ew tiştin ku jiyanê çedîkin, ew in ku mirov dildar dikin, ew in ku mirov şad û xweşdar dikin.

**Hemo:** Ji wan tiştan evîn çêdibe. (*Ew maç kir.*)

**Şêrîn:** Na Hemo, dê me bibînin, ecele meke, nehêle ku xelk me hişkere bikin, tu xweş dizanî ku zimanê xelkê çiqas dirêj e. (*Xwe ji destê wî kışand.*)

**Hemo:** Kes li van deran nîn e, niha dinya germ e, hemû di mal de razane.

**Şêrîn:** Hemû kes narazin, gelek hene ku nobedariyê dikin, dixwazin çi di gunde de çêdibe û çi cénabe bibînin. Kesên wisa pirin.

**Hemo:** Kes ne diyar e, kesî nabînim. (*Li hawîrdor meyze kir.*)

**Şêrîn:** Dengê zarokan tê, ew dileyizin. (*Ji pişt perdê dengê zarokan tê.*)

**Hemo:** Zarok bêguneh in, ji zarokan metirse.

**Şêrîn:** Çima?

**Hemo:** Çimkî haya zarokan ji evîndariya me nîn e, haya wan û bala wan li ser leyistikê ye, mezin tiştê pîs dikin, ewên xeberguhêz, ewên fitne û galaciyê dikin, ewên kuştin û lêdane dikin, mezin in.

**Hemo:** Te got mîhvanê we hene, ji ku hatine?

**Şêrîn:** Ode dagirtî ye, Şêx Elî û Şêxmûs Paşa ji bajêr hatine.

**Hemo:** Ji bo çi hatine?

**Şêrîn:** Nizanim... nizanim, lê ev gelek car in ku ew têñ mêvandariya me, ew dostê bavê min in, bavê min jî ku diçe bajêr, dibe mîvanê wan.

**Hemo:** Diyar e ku firavîn xweş e?

**Şêrîn:** Ne ji zû ve hatine, berî bêhnekê hatin, lewra hatim ku ava sar bibim, helbet tî ne, divê ava sar li malê hebe.

**Hemo:** Tu hez ji helbestan dikî yan na?

**Şêrîn:** Ji helbestan stiran çêdibin, helbet dê hez ji helbestan bikim.

**Hemo:** Min helbestek li ser te çêkiriye.

**Şêrîn:** Ha... ha... ha, dê navê min jî bikeve defter û kitêban. (*Kenîya, bi nazikbûn û beşirê û li wê meyze kir.*)

**Hemo:** Tu dixwazî ji te re bixwînim?

**Şêrîn:** Erê, belê dixwazim. Hemo kaxez ji bêrîka xwe derxist û vekir.

**Hemo:**

Çavê te yên reş kirim evîndar  
bejna te ya zirav kirim nobedar  
rûyê te yê geş kirim hêvîdar  
lêvén te yên xweş kirim koledar.  
Rabe Şêrînê em dest bidin hev  
li warê evînê bidin xweş merev  
xort û keç werin çi zo û çi ref  
li nav mîrg û dehlan maçîkin lêv û dev  
Em şadê bibin bi sema û dîlan,  
biçin rêzgarê li zozan û Botan  
bi evînê bakin li warê dilgeşan  
rêça me bigrin zarokê kurdan.

**Şêrîn:** Te ez kirim qehremana evîniyê.

**Hemo:** Dê te bikim Dilbera Melayê Cizîrî.

**Şêrîn:** Çîma qey ew ji evîndar bû?

**Hemo:** Evînî, mîrev dike helbestvan, mirov dike tembûrvan û hozan, mirov dike nivîskar û çeleng, heger Melayê Cizîrî ne aşiq ba, dê nikarîba wisa helbestên dildariyê binivîsanda.

**Şêrîn:** Heger tu helbestên wî zanibî ji min re bibêje.

**Hemo:** Kêm têne bîra min, dê yekê ji te re bibêjim:

Xelko li min kin şîretê  
ew Dîlbera zêrîn kemer  
hatin ji halê xafletê,  
hat der ji burcê wek qemer,  
hat der ji burc û pencera  
dil girt û da ber xencera,  
ew rengê halê dîlbera,  
lew aşiq im xwe bi xwîn bû ceger.

**Şêrîn:** Ax... ax... pir xweş e, helbestên wî ji yên te xweştir in, bêhna evîniyê bêhtir jê tê û dîlbarê, evîniya wî kûr e, ji dil û cegerê wî der diçe.

**Hemo:** Ew mezin bû, ew mîrê evîniyê û dîlberiyê bû.

**Şêrîn:** Divê biçim, gelek mame dereng. (*Der çû, satilên avê danî ser milê xwe. Bavê Hemo û dayika wî ji pişt perdê derketin û hatin nik wî.*)

**Remo:** Ha, kurê min çîma tu bi tenha xweyî li vê derê?

**Hemo:** Li vê derê xweş e, çêtir e ji hunduro.

**Xezal:** Kurê min çîma tu nayê malê bêhnekê xwe rehet nakî?

**Hemo:** Divê pezekê bibim, da serjêkim, çîmkî mîvanê Ehmed Axa hatine, dixwaze firavînê ji wan re çêbike.

**Hemo:** Dizanim, mîvanê wan hene.

**Remo:** Tu ji ku dizanî?

**Hemo:** Şêrînê ji min re got, hatibû vê derê avê bibe.

**Xezal:** Xwazgîniyê wê hatine.

**Hemo:** Çi? Çi? Çi?

**Remo:** Şêxmûs Paşa wê dixwaze!

**Hemo:** Ji kê re dixwaze? (*Aciz bû û qeherî.*)

**Remo:** Ji xwe re dixwaze.

**Hemo:** Şêxmûs ji bavê wê mezintir e, jîn û zarokên wî hene, ma hevalê Şêrînê ye heyâ wê bixwaze?

**Xezal:** Ciwamêr Paşa ye, ji malmezina ye.

**Remo:** Bawer nakim ku Ehmed Axa keça xwe bide Şêxmûs, keçik biçük e, dê çawa keça xwe bide ser hewiyê?

**Xezal:** Axa ne, keçê xwe didin Paşa, hemî xwedî nav û deng in, malmezin in, ma dê keça xwe bide feqîr û gundiyan?

**Hemo:** Çima nade gundiyan, ma gundî çawa ne? (*Giriya û hêşir barandin.*)

**Remo:** Şêxmûs Paşa weke meymûnekî ye, temenê wî cil û çar sal e, lê gava mirov wî dibîne, mirov dibê qey ew şêst salî ye.

**Xezal:** Çima tu digrî lawê min?

**Hemo:** Ez û Şêrin hez ji hevdû dikin, ew hez ji min dike, ne hez ji Şêxo dike.

**Xezal:** Qey tu dîn bûyî? Em û ew ji hevdû dûr in, em kesin xulam in û ew Axa ne.

**Hemo:** Çima qey hezjêkirin û evînî şerm e yan kirêt e?

**Xezal:** Lê, lê, tu dixwazî mala me wêran bikî, heger Ehmed Axa bibihîze dê me ji gund biqewitîne.

**Remo:** Hema bila me biqewtînê, tim û tim ez gizîrê wî me, ka min ci fêde kiriye?

**Xezal:** Gava berde me, em ê bê av û nan bimînin, em ê bê cîh û war bimînin.

**Remo:** Ma niha ci nan û ava me heye? Em herin ku em ê bikaribin xwe xwedî bikin, me ne xak e, ne cîh û war e, tu ji nanê xwe ditîrsî, li herderî nan heye, mîranî û maldariya ke-sê weke Ehmed Axa û Şêxmûs Paşa li ser milê belengazê weke min e, lê dawî em in yên bê qedîr û qîmet, lê qedrê biyaniya digrin û xwe ji biyaniya biçûktir dibînin, lê gelek xwe li ser serê me mein dikin.

**Hemo:** Bavê min rast dibêje, ne Şêxmûs ji min xweşiktir e û ne ji min ciwantir e û ne ji min mîrxastir e.

**Remo:** Kurê min kîmasiyê ji kesî re meke, tu dizanî bixwînî, dê bikaribî jîyana xwe ber-dewam bikî, bila tu çavvekirî bî û li hawîrdor binêre.

**Xezal:** Hûn herdu dixwazin mala me wêran bikin. (*Derket û çû. Remo ji li pey wê çû û li Hemo meyze kir.*)

**Remo:** Metirse kurê min, metirse. (*Ji pişt perdê deng hat.*)

**Hemo:** Na... na... çenabe ku Şêrin bibe jîna Şêxo. (*Bi tenha xwe ma û dawî dest avête ser bilûrê û li bilûrê da.*) ■

*Perdeya duwemîn di hejmara bê de*

# Mamoste, Mamoste!

Nizar Agirî

Ç  
I  
R  
O  
K

Berî ku derbas bibe, baş li hundirê vîtrînê dinêre. Xwe hinekî ditewîne da ku baştir bibîne. Dûvre xwe serast dike û piçekî vedigere paş. Destmala xwe derdixe. Bêvila xwe paqij dike. Eniya xwe ji xwêdanê ziwa dike. Çend peyvîn ne zelal ji xwe re dibêje û destêن xwe diguvêše. Dikuxe, çavêن xwe li hawîrdorê xwe digerîne û bi lez derbaş dikanê dibe.

Xelk li her çar aliyên dikanê belav bûyine. Xilbxilb ji her derê tê. Karmendêن wek meymûnan bi xelkê re dan û standinê dikan. Kenêن sazkirî li ser lêvên wanin. Destêن xwe bilind û nizm dikan. Rûdinin, radibin, dikenin, li çepikan dixin, lê xelk wek şahan awirêن xwe dûr diavêjin.

Çavêن xwe nîvgirtî dihêlin. Lêvên xwe dirêj dikan. Xwe weha eşkere dikan ku pir bilez in.

Ji lewre çaxê derbas dibe tu kes hajê nîne. Rûyê wî sor dibe. Xûn bi lez di rehîn wî re derbas dibe. Dilê wî xurt lê dixe. Destêن xwe dixe bêrikêن xwe, li dor xwe dizîvire,bihna xwe derdixe û du sê gavan bi pêşve diçe. Nahêle ku çavên wî di çavên tu kesî keve da ku bala kesî nekişîne. Hêdî hêdî ber bi qundera ku di vîtrînê re dîtibû diçe. Dirêj lê meyze dike. Xwêdan ji laşê wî tê xwarê û tif di qirika wî de dizê. Pir çaran xweziya xwe dadiqurtîne. Bi aramî xwe xwar dike û radihêje qunderê. Wê nêzîkî rûyê xwe dike. Baş lê meyze dike. Wê tevdide, wê digurnijîne. Wê di destêن xwe de qulapanî dike. Li binê wê dinêre. Kêfek mezin dikeve dilê wî. Laşê wî dilerize, derê xwe vedike wek ku dixwaze qunderê

bixwe, mîna ku nanekî tenûrê yê germ û taze be.


Qunderê datîne cihê wê. Hindikî bi paş ve diçe û dîsa evîndarê di hizûra dîlbera xwe de ye. Qundere li ber çavên wî dibe wek xivsek xezal. Ciwan, şayik, nazik, xweşik, bedew. Tîrêjên işqê di laşê wî re derbas dibin.

Li hawîrdorê xwe dinêre. Kes ha jê nîne. Herkes bi karê xwe ve mijûl e. Hesabçî her peran dihijmêre û karmendêن din her bi xelkê re dîlana firotinê dîkin. Ber bi qunderê diçe. Ji nûve wê hildigire, dide ber dilê xwe. Hêdî hêdî wê datîne erdê. Şekala xwe ya kevin ji lingêن xwe dike û qunderê nûh dixe lingêن xwe. Bi nermî şekalê daf dide. Wek ku bixe nav ava şîrgermî. Laşê wî sivik dibe. Dixwaze bifire. Tê ku ji kêfê re bîke qîrîn. Bi aramîyek giran ber bi derî diçe û derdikeve bi nermî di kuçê re derbas dibe. Teq teqa qunderê li ser rûyê kuçê dikeve guhêن wî wek awazek mûzîk ji sîmfonîyek klasîk, giyanê wî geş dibe.

– Hawar, ev çi xweşî ye! Digihe serê kuçê, xwe dizivirîne, dikeve ca-deyekê, kêlekê û ji nişkê ve dest bi bazdanê dike. Ji dil û can û bi hemû hêza xwe baz dide. Hest dike ku hezar deng li paş wî têن û bang dîkin. Mamoste, Mamoste! ■

# Bergirî û xweragirtin di helbestên Hemeseîd Hesen de

Xelîl Duhokî



Hemeseid Hesen, helbestvan, rexnegir û welaparêzekî navdarê Kurdistana başûr e. Bi kurmanciya jêri (soranî) û bi tîpên erebî dini-vîse. Ev e ji bîst û pênc salan pêtir e helbestan divehîne û her wesa rexnegirekî bi nav û deng e û bi çendîn pirtûkên wî, baştrîn gewahiyên vê rastiyê ne.


Ew wek tevaya xelkê Kurdistana dagîkirî, di nav şer, kuştin, sutin û wêrankirinê de mezin bûye. Dema firokên dijminî, gund û deverên welatî bombebaran dikirin, ew zarok bû. Dîmen û karesatên hîngê, ji ber çavên wî winda nabin. Aşkera ye, her kesê agehdarî rewşa Kurdistana başûr, baş dizane, ku ev e serê sîh û pênc sala ye, ev beşe dihîte wêran û xopankirin. Lewre wî zaroktî, xortanî û tevaya salêni jiyana xwe di gel van kawdanêni aloz û rûdanêni dilşewat borandîne. Wan bublatan rihên xwe, kûr di dil û mejiyê wî de, kolaney. Vê çendê jî, bi berfirehî di helbestên wî de, serî hildayne. Lewre, Fehed Gerdewanî, nivîskarî û helwêstên wî, hosan destnîşan dike: "Hemeseid Hesenî, rijêma Îraqê, baş naskiriye. Ji ber hindê jî, ew wan, bi xwendkarêni Hêtlerî li qeleme dide."<sup>(i)</sup>

Xuya ye ku, her çi hukumetên dihatine Îraqê, kevnepoerist, şofînist û li dij de-

mokasiyê bûn. Her çend hindekan li jér gurzê xebat û qurbaniyên gelê kurd, pişkeka mafêni wî erê dikirin, lê her dema ew hukumet bi hêz biban, dîsan lêve dibûn û li dij dirawestan û pîlanêni genî d a d i n a n . Nemaze hukumeta beisa faşist, ku

mezintirîn karesatêni Kurdistana basûr, bi destêni çepelêni wê hatine encam dan. Belê, zulma dijmîna gelek bû, nexasime beramber texa hejar û tepeseran. Li ser vê çendê, Fazil Caf dinivîse.” Hemeseid Hesen, bi zimanê xwe yê dewlemend, basî xoşewîstiya Kurdistanê, têkoşîna xelkê wê û xebata karke û hejaran dike.”<sup>(2)</sup>

Sitem berdewam e û mafêni mirovê kurd di bin piya ve didin. Lewre edebê bergirî û xweragirtinê, ji dayik dibe. Gelê kurd ji, mîna tevaya gelên bindest, li dij hukumeten hov û dirrinde, xebat kirîye, lê mixabin



*Hemeseid Hesen*

helbestvanekî navdarê bergiriyê ye. Ew di nivîsîna helbest û babetên rexnê de, xwe dan rîbaza taybetiya xwe ye.”<sup>(3)</sup>

Min berê ji, Hemeseid dinası, lê nasîn û têkelyêni me, di sala 1979-an de, pêtir û bi hêztir bûn. Belê, di wê salê de, li bajarê Silêmaniye, fêstîvala du yê ya helbesta kurdî çêbû. Hîngê dijminê faşî, bi sedan gundêni Kurdistanê dişewitandin û rojê bi dehan xorîn kurd ji, di zîndanan de, li ber ezyet û eşkencê şehîd dibûn. Lî li çiya û deştêni welatî, pêşmergên qareman şerê rizgarî û xweparastinê dikir û di bajaran de ji, nivîs-

hêstan rizgar nebûye û negehiştiye armancêni xwe yên pîroz. Lî li ser xebat û qurbaniya berdewam-bûye. Hemeseiđî li dij ri-jêmên hov nivîsiye û ci car serê xwe neçemandiye. Ew yek ji helbestvanenê bergiriyê ye û li ser vê çendê ji, Sirwe Ezîz dînivîse.” Hemeseiđ Hesen,

karên kurd yên welatparêz, helbestên şorişgerî û berxwedanê dixwendin. Erê, di wê fêstîvalê de, wî helbeteka xwe xwend û esmanê bajarî, ji peyv û ristêng bergiiyê pîr kir. Agir li bin pêñ dijminî hilkir û rihêñ xweragirtinê jî, di dilêñ xelkê de, kûrtir kirin. Belê, wî li ber çavêñ dehan sîxur, kirêgirte û berpirsêñ dijminî, helbesta xwe, bêtirs û bê ku bihayekê bide wan, pêşkêşî xelkê kir. Ji ber helwêstên wî yên li dij faşîyan û ji ber wê helbestê jî, çendîn cara rakêşane dezgeha asayışê û jê re digotin: "Te ji me re gotiye, ku em neviyêñ Hêtlerî ne. Li ser vê çendê, kuştina te rewa ye. Lê ta ku te nehirrifinîn, te nakujîn, çînku em naxazîn palewanan dirust bikîn."<sup>(4)</sup>

Ew di helbesta xwe de, pîlan û nexşêñ dijminî xuya dike, xelkê jî hişyar dike û paldide xebatê. Ew bajarê Helebce, bi Xezzeyê Felistînî, dişibihîne. Ew bi dilekê şewitî û bi ruheka şorişgêr, zarokêñ kurd paldide, ku polisan kevirbaran bikin û dikandar jî, dergeha bi rûyê wan de, bigirin. Ew pêşbîniyê dike, ku eger kawdan bi vê rewşê bice, hîngê wê tevaya gundê Kurdistanê mîna gundê Jêrnîka Ispanî, wêran û kavil bin. Ji xwe piştî çend salan encam jî, wilo bû. Ew dide xuya kirin, ku Saddam jî, xwend-karekê Hêtleri ye û Zehakê çerxê bîstê ye. Rojê mejyê dehan xortan dide marêñ hinavêñ xwe û her têr nabin. Lê li dawiyê bawerî heye, ku roja ges li pêş e û gelê kurd dê gehe armancêñ xwe yên pîroz. Ew di helbesta xwe ya serketî û bi hêz de dibêje:

## DEMA BAJARÊ STÊNGA DIAZIRE

Helebce Xezza xembar e û  
Zarok polisan kevirbaran nakin.  
Dikandarêñ Dokan,  
Bi rûyê postalan de, nagirin.  
Silêmanî Soyoto ye û  
Xortêñ wî bersingê sîxura naçîrrînin.  
Tevaya gundêñ Kurdistanê,  
Çaverêy encama Jêrnîka ye.  
Kovar û rojname, ajansa deng û basan jî,  
Di guhêñ gay de, razaye!  
Azirya ye.  
Bajarê stêngaye û azirya ye.  
Her xwendkarê xwendingeha Hêtleri ye  
Girrê wî li vî cihî alya ye

Stêngêñ har  
Bi vî sinûrî jî razî nabin  
Bapîrê wan nexşê kêşaye.  
Li cem wan weye:  
Dîrok erebaneye û bi arezûya wan  
Dê bi paş de çit û ev kare rewaye.<sup>(5)</sup>

\* Xezze: Bajarekê ereba ye li Felistînê. Li wêrê zarakan polîsen Israîlê kevirebaran kirin.

\* Soyoto: Bajarekê Afrika jêriye, xelkê wî şorişgerin û di gel Mandêlay xebateka gerim dikirin.

Kartêkirina vê helbestê li ser xelkê û pêşmergan gelek bû. Lewran peyvîn mamosta Pişkoy, ku hîngê li devera Silêmaniye, berpirsekê pêşmergan bû, cihê sirincê ne. Ew dibêje: "Ev helbeste, yekem şêlka gullêñ edebê bergiriyê bû ku, bi rûyê dagîrkeran

de teqî. Wî demî vê helbestê, hêz û germiyek xiste dilê şorişgerên bajar û çiya. Dema kasêta wê gehîştiye bingehêن me, di demekê kurt de, dilê pirraniya pêşmergên hişyar, ji bo xwe kire hêlin.”<sup>(6)</sup>

Belê, zîrekî, hişyarî û pêşbîniyêن Hemeşeîd Hesenê helbestvan, cihê xwe girtin û xuyabûn. Çinku piştî hîngê bi demekê kurt, li çendîn bajarêن Kurdistanê, xwepêşandan çêbûn. Zarokan polîs kevirbaran kirin, dikandaran, dikanêن xwe bi rûyê postalan de, daxistin û xortan jî, bersîngê sîxur û kirêgirtan girtin. Her wesa mîna bajarê Jêrnîkayê, bi saedan gundêن din jî, dijminê hov şewitandin û wêran kirin. Belê, faşiyêن Îraqê, ji torinêن Hêtlerî jî, dirindetir bûn û Kurdistan di xwînê werkin. Rûdan û karesatêن çekê kîmyawî li Helebce, Balisan û Gelyê Bazê û heta digehe reva mezin, ji bîr naçin û birînê wan kûr in. kûr in. kur in di dilêن gelê me yê hejar û bêxwedî de.

Erê, ji bo helbesteka howan, dibe mirov hatiba kuştin. Lî dijminîne dixast bi eşkerayî wî karî encam bide, lî diviya welatparêzen kurd bi riyeke wesan berzeke, ku kes pê nezane yan jî li ber xelkê windake. Ji tîrsa girtin û kuştinê, ew neçar dibe, ku Silêmaniyê bi cê bihêle û qesta çiyayêن asê û bilind bike, di nav rîzêن şoreşa kurdî de, xebata xwe bidûmîne.

Wî bawerî bi rîbaza edebê riyalîzmê heye, lewre ew pêtir giringiyê dide naverokê û dixwaze bi nêzîktirîn rê, xwendevanî bigehîne mebestêن xwe. Lî formê jî, ji bîr nake

û helbestêن xwe bi aşopa berfireh, mosîka şîirî, monolog, diyalog, wênêن ciwan û zi-manekê rewan dixemîline. Ew di hevpeyvî-neka xwe de, dibêje: “Huner bi giştî ku (edeb pişka here giring e) divê xodîkeka rastgo û zîndî be, hemî aliyêن jiyanê nîşan bide. Ew hunerê ji jiyanê xerîb be û girin-giyê nede çarenûsa mirovî, hîngê wî ci rolek nabe. Hindek wesan hîzir dikin ku, awirdan li azar û xemêن rojaneyêن xelkê, ne karê nivîskariye, lê ez bawer dikim, ku ew nivîskarê li ser rîbaza realîzmê neçe, ne li welat û ne jî li welatê biyaniyan, dikare hebûna xwe misûger bike.”<sup>(7)</sup>

Belê; helbestvanê rastgo, peyama şoriş-geriyê digehîne xelkê. Ew helbestê dike ti-veng û fişek, dike nan û av ji bo têhnî û birîcîyan, wire û hêza wan bilind dike û wan ber bi hişyarbûn û xebatê dibe. Di vê qo-naxa aloz û dijwar de, gelê kurd pêwîstî bi van helbestan heye. werin bi hevre wê bix-wînîn:

## PEYMAN

Ger wezanî helbesta min  
Ji kûratiya jan û xemên we derneçû.  
Hest bi birçîbûna we nekir,  
Ji hêza dest û lepan nebû.  
Ger wezanî helbesta min  
Helperrist e, tirsinok e.  
Di bingehê çewsîneran de,  
Dilerze û li ser çok e.  
Ger wezanî helbesta min  
Di gel rabûna caddê, sirûda we nevegêre.

Di gel yekem hêrişa we,  
 Sîngî nede ber gulla û dilî pê re.  
 Ger we zanî helbesta min  
 Şehê destê filan keça dewlemendaye.  
 Bi porê dirêj û sistê nazenînekê ve girêdaye.  
 Ger we zanî helbesta min  
 Çeperê we bi cê hêla,  
 Sexmerat şerab, jin û para.  
 Her çi helbesta min gotibe,  
 Mîna gunehkarekê mezin  
 Helawîsin, gerdena wê li sêdara.<sup>(8)</sup>

Ew çend sala di nav rêtêni partiya komunîsta Îraqê de bû, lê ji ber nakokiyên siyasi, her zû jê dûrket û wek kesekî çep di bajar û çiya de, xebata xwe dikir. Wî bawerî bi hêza karker û zehmtkêsha heye û berevaniyê jê dike. Lewra çendîn helbest ji bo wan ve-handîne. Çinku ew dizane, ku hêz û berhemên wan diête xarin û ew kar dikin, lê xuha eniya wan ji hindekên din re diçe. Ew riya xwe ya pirr asteng û kelem dişeqîne û hêştan bê rawestan, ji bo bicêanîna armançên hejaran xebat û bizaveka gerim dike. Di vê helbestê de, rewşa xelkê bindest û rênçber pêşçav dike û xemên wan destnîşan dike.

## WIŞŞÊN

Gula kirâsê li ber te,  
 Xwîna geşa hevalê min yê karker e.  
 Parçêñ tirumbêla te ya xweşik,  
 Tiliya qutkirî, destê birriyê,  
 Endamên din yên laşê hevalê min yê karker e.

Binaxê koçka te ya bilind  
 Li ser laşen hevalên min yên karker ava kiriye.  
 Ew hêskâ di nav de dileyizî  
 Vizzêna xwîn û dengê dilê karkeran  
 Awazê wê vehandiye.<sup>(9)</sup>

Dema mirov helbestê wî dixwîne, xuya dibe ku ew diçine xana edebê realîzma sosyalîst. Lewre berhemên wî jî, rengdana hizir û bîrên karker û hejara ye. Ew mîna edîbêñ tırsinok xwe di bin perda tem û mijyê de naveşêre. Belku; bi hemî hêza xwe diête meydanê û her çi ji bo wê çînê pêwîst be, dibêje û helwêstên şorîşgêre jî werdigire. Ji ber hindê jî, heza hejaran zêde dike û kerba dijminan pêtir dike. Lorka dibê: "Pêwîst e hunermend di gel girîn û pêkenîna gelê xwe be."

Wî bawerî bi vê pirinsibê heye û dibê: "Gelê kurd di qonaxeka sext û dijwar de dibûre û nabe nivîskarêñ wî li benda hindê bin, ku li ser berhemên xwe bijîn. Belku, divê bêtirs binivîsin û çaverê sergêjiya bin û li ser berhemên xwe bêne kuştin. Nabe nivîskar saxte û sazişê bike. Eger nivîskaran jî, serên xwe şûr kirin û ya pêwîst negotin, êdî kî rastiyê destnîşan bike!."<sup>(10)</sup> Belê, ji ber gotina rastiyê û helwêstên xwe toşî çendîn giftariya bûye. Ew di helbesta xwe de, berevaniyê ji çîna hejar dike. Wan hişyar dike û ber bi xweragirtin û serhildanê dibe. Her çend hêştan yên mîna Holako, Cengîzxan, Hêtler û Sedamî li dinê mane û sitema xwe didûmînin, lê hêz û xebata hejaran, kela û koçkên wan biherifîne.

## PÊLA CADDÊ

Di hişke keleka textê sultanê mezin û biçûk de  
Laşê hezaran hejara rêzkiriye.  
Holako saxe,  
Hêtler maye û Cengîzhan hatiye.  
Lê hêstan toza goristanê li ser kargeha raxistiye.  
Bêhna xwînê cadde girtiye.  
Hejarîno:  
Kengî agirdanê hinavên we dê geş be?  
Kengî ewrê bêhna hewe dê deng be?  
Kengî barana we dest pê dike?  
Xena xwînê ji bo dest û tiliyên  
Boka demsaleka nû virê bike?  
Kengî dê dest dine qamçiyê?  
Kengî hespê rabûna we,  
Dê gehînit mizgîniyê?<sup>(11)</sup>

Hemeseîd, wî dîwarê di navbera helbest  
û xelkî de, diherifine û dixwaze wî agehdarî  
tevaya giriftarî û aloziya bike. Wî divê me-  
bestên xwe bigehîne cemawerê rût û hejar.  
Ji xwe ew ji bo wan dînivîcû rolekê di gu-  
herînê de jî dibîne, çinku têdigehe, ku edeb  
çekekê çînayetî û hoyekê xweragirtin û pal-  
vedanê ye. Di vê helbesta xwe de, başî rewş  
û kawdanên jiyana rojane ya xelkê dike, ku  
çewan dibin sitem û zulma faşıyan de dina-  
le. Dixwaze rûdanên diltezin û birînên gelê  
kurd, nişana mirovatiyê bike.

## PIRS

Eger navên hemî teyrîn,  
Di Kurdistanê de, dên û diçin  
Ji zarokên kurd bipirsî

Ew nizanin.  
Lê eger pîrsiyara navên tevaya  
Çekêni li gund û bajarê  
Kurdistanê bi kar têb bipirsî  
Dê hemiyan bêjin.  
Eger ji zarokên kurd  
Navên serokî li xwe kirîn, bipirsî  
Ew nizanin.  
Lê dê navên tevaya quesabxanê bi fermaña  
Serokî ava bîn, bêjin.  
Eger navên karesatê Kurdistanê  
Ji zarokên kurd bipirsî:  
Ew dê bêjin:  
Yekem: Karesata Helebce.  
Duyem: Jehirkirina nanê xelkê müşextê Badînanê.  
Sêyem: Veguhaztina Pişderê.  
Çarem: Dola Mirinê li bajarê Silêmaniyê.  
Pêncem: Birrîna zimanê (tirkê ciya).  
Şeşem: Kemera keska welatê Şamê.  
Heftem: Dozexa li bin sîbera rihê İmamî.<sup>(12)</sup>

Ew zulm û ezyeta dijminê faşî li ser gelê  
kurd dikir, ne Hêtlerî û ne jî Holakoy kiri-  
ye. Rojê bi dehan gund dişewitandin, kani-  
yên avê digirtin ta ku kewal û tewalên Kur-  
distanê jî, mifay jê nebînin û ji têhna bimî-  
rin. Her dema yekê nerazîbûna xwe diyar  
kiriba, yekser gullebaran dikirin. Lê welat-  
parêzen kurd bi vê çendê razî nebûn. Xor-  
tên kurd xebat pêşde birin û ji encama hin-  
dê, zîndanên dijminî tijî bûn. Pêşmergên  
qareman jî, şax û ciyayêñ welatî, kiribûn  
gorristana faşıyan. Belê, di vê riya pîroz de,  
bi hezaran kurd, zarok, jin, kal û xort şe-  
hîdbûn û bi xwîna xwe ya paqij, dara aza-

diyê avdan. Ew di gelek helbestên xwe de, basî rola wan şehîdan dike, ku mîna mér-xasan dicûne ser sêdara. Helbet dê dîrok rûpelên zêrîn ji bo wan xemline. Werin vê helbestê bixwînin.

## JIYANEKA BÊ DAWÎ

*Bo pehid Ekremî.*

1

Di serdemekê tarî de,  
Yekem stêr çavê te bû.  
Yekem dilopa baranê,  
Xwîna te ya rêtî bû.  
Yekem bişkoja li benda gesbûnê,  
Rûyê evîna rasteqîneya hetava te bû.  
Yekemîn pêşmerge bûy  
û te yekem çeper hel bijart.  
Yekem nama agirî, te bo himbêza  
Sar û bêdenga tepeseran hinart.

2

Ez dizanim yê têhnî, çend dil li cem av ye.  
Pel çend hogirê takiye.  
Lasê çend Xezal diviya  
Pelaştîn çend şeydaya gulê ye.  
Lê kî dizane  
Te çend texa karkeran xweş diviya?  
Lê kî heye bikare  
Di navbera evîna te û hejaran de,  
Sinûran deyne û bikuje hêviya?<sup>(13)</sup>

Li çi cihê sitem hebe, ew li dij radiweste.  
Çinku ew mirov e û berevaniyê ji mirovati-ya bindest dike. Her çend bi sedan hezar kurdên bêguneh derbeder bûne û di bin

çadir û xîvetên xerîbiyê de dijîn, lê ew rewş û kawdanên gelên din jî, ji bîr nake. Dilê wî di gel milltên Felistînî, Sodanî, Erjentînî û tevaya tepeserên cîhanê ye. Ew xem û azarên gelê xwe, di yên gelên din de dibîne û girêk û aloziyên hemyan bi yek dizane û divê ji bo hindê, xebateka gerim û bê rawestan bête kirin. Sitem û tedayê li her ali-yekê dinê bête kirin, ew çend dilê wî digi-vêse û derdên wî mişe dike.

## NAV Ú NÎŞANË JI BO VÊ HELBESTÊ BIBÎNIN

Ji min ne pirse: Min kî xweş divê?  
Ji min ne pirse: Min kî xweş diviya?  
Ji min ne pirse: Kerba min ji kê ye?  
Niha kîna here mezin,  
Min ji wî ye, yê min diperist.

Dema mista hova pasewanê dijî asoyê  
Mîna kirmê xwînmij, hewara we diqetîne.  
We bêdeng dîkin û  
Hizir dîkin ku guhêñ kesê nahejîne.  
Di wî demî de, xem bizmarekê geniye û  
Xwe di hinavêñ min de diçeqîne.  
Her Pêxemberê dilsoze dengê dilîrê we diîne.  
Di çadira xêzaneka müşexta  
Telelzeitera xweragirtinê de  
Zarokekî şadî nedîtî  
Dilê wî bo cara dawiyê lê dide  
Tenê ji bo hindê, lêva wî  
Xwe li qurçeka avê nadî.<sup>(14)</sup>

Dema şorişa kurdî, di sala 1975-an de,

şkestî, perdeka reş xwe avête ser Kurdistanê. Bêomêdî û reşbînî di nav xelkê de peydabû. Faşiyên Îraqê jî, dest bi pîlanên xwe yên çepel kirin. Xelkê bêçare û bêguneh, veguhaztine deverên jêriya Îraqê û bi dehan bi dizîve jî kuştin. Dijminî wesan hizir dikir, êdî şoris li Kurdistanê ji dayik nabe û dê gelê kurd di bin postalên leşkerê xwe de, hirrişîne. Belê, herçar aliyên Kurdistanê bi dijminan dagirtî bû û hemî rijêmên dagîrker, pîlan û nexşen kirêt, li dij gelê kurd dadinan. Lê ji nav agir û mirinê, bi dehan xortên aza, derketin û dîsan dest bi şorisê kirin. Yek ji wan qareman û jêhatiyan, dilsoz û evîndarê gel û welatê xwe Aram bû. Wî bi destekê tiveng û bi yê din jî qelem helgirtibû û li çiya û deştên Kurdistanê, mîna kewa diqebî. Lê sed heyf û mixabin zû kete bosên dijminî û şehîd bû û gehîste karwanê nemiran. Belê; Hemeseid di vê helbesta xwe de, wî bi bîr tîne. Xebata wî bi ya Fehedi, Kenefanî û Gîvaray ve girê dide.

## EW TEYRÊ KEHÎ NEBÛY

*Bo şehîd Aram*

1

Li payîzê, te gulên sûrên buharê  
Qefte qefte civandin û cardin  
Çiyayê wêrankirî, kire guldan.  
Te azarêن karkeran û kolanên reş û rûta  
Kirine piştî û cardin  
Te qesta mîrga kir û bûye dostê çiyan.

2

Çavê min li te ye

Rêwiyekê sersextî û di vê şeva tirsinak de  
Li kopekê bilind, yekem momê heldikî û di-  
deynî.

Çavê min li te ye  
Delîvê nadî gurg bêhnekê tena bibin,  
Li her bosteka erdi.  
Tovê vulkaneka nû direşinî.<sup>(15)</sup>

\* Aram: Sekreterê Komela Rencderanî Kurdistanê bû, di roja 31.1. 1978- an de, li gundê Tengîser, devera Qeredaxê şehîd bû.

Edebê bergirî di senger û çeperan de, di-  
ete nivîsin. Di nav şerî de û di gel hêriş û  
pelamardanê, ji dayik dibe. Lê edîbê bi do-  
za xwe ya adil ve girêdaybe, ew di welatên  
xerîbiyê de jî, di gel xem û azarên gelê xwe  
diji. Çinku ew bo xweşî û keyfê nehatîne  
dervey welatî, belku; rewşa aloz û kambax  
ew neçar kirîne. Hemeseid, li welatî û li  
derve jî, rastgo bûye û di pirsa gelê xwe de  
helyaye. Wî li bajaran, li çiyan û li Ewrupa  
jî, xebata xwe kiriye û efrandinê wî hebû-  
ne. Ji ber vê çendê jî, helbestên wî zû dici-  
ne di dilê xelkê hejar de. Wî berdewam  
helwêstên rasteqîne hebûn û li ser hindê jî,  
çendîn caran toşî serêşî û giriftariya bûye.  
Ew dibêje: "Neku ez bê nivîsîna helbesta  
najîm, belku; şîir ji mêje ye ku, gefa û hêri-  
şa li min dike. Ev e çira ez dest ji helbestê  
bernadim? Ji xwe ci nemabû, faşiyên Îraqê  
li ser (Helebce xezzey Xemnak e) û axa jî, li  
ser (Helbest Helwêst e) dawiyê bi jiyana  
min bînin.<sup>(16)</sup> Bi rastî jî, helbest li cem wî  
helwêst e.

## WÊNE

Bîst û çar sal bû  
Li seranserî welatî  
Polisan wênen diktatorî  
Li dar û dîwaran  
Li kevir û sîngan dabû  
Lê gava tirarê xelkê pirr bû  
Sultanê tirsinok.  
Li ber pêla azirîna xelkê  
Kete ser çok.  
Di çend saete û kêm dema.  
Wêneyekê ne dirryayê serokî  
Li tevaya welatî nema.<sup>(17)</sup>

Ew mirovek e û evîna mirovatiyê di kû-ratiya dilê wî de ye. Li cem wî jî, "mirov mezintirîn sermaye ye." Ew ji bo tevaya mirovatiya jérdest dinivîse. Derd û xemên wan himbêz dike. Belê, dehan sal e welatê Felistîniya - mîna yê kurda - dagîr kiriye û sitemeka mezin li wan diête kirin. Her çend helwêstên aliyekê hêzên wan beramber pirsa kurdî lawaz û ne di cê de bû, nemaze di serhildan û reva mezina kurdên başûr de û bi dehan xebatkerên kurd jî, di nav rêzên wan de, şehîd bûn. Lê dîsan jî, zulim li her aliyekê dinê bête kirin, divê xelkê şorîşgêr li dij be, bi taybet milletên tepeser û welat dagîrkirî. Helbestvan, li ser xwe dibîne ku, berevaniyê lê bike. Ew zîrekane kovanên gelê Felistînî dest nîşan dike û kevrên destên zarokên wan dike top û fişek û bi navçavên dijminan de, diteqîne.

## ÇEND RÛPELEK JI DEFTERA DIL

Ey zarokên kevir di destan:  
Berî hevdu bibînîn bi çavan.  
Yekemîn kevir, yekem nûçe  
Min hûn viyan.  
Evîna we:  
Ji berfa ser kopê Qendîlî paqijit e.  
Şerê hewe:  
Ji tevaya rûpelên dîrokê geştir e.  
Evîna we, pêşemanî li pey nîne  
Ger di vî şerî de şkestin  
Ez dê bêjim: Xudê nîne.  
Erê berê  
Kevir li Felistînê nebû!  
Yan jî çiyayê wireya zarokan  
Deşt bû.  
Evê carê birûskek bû, agir berda welitekê.  
Şeva Qedir, serê xwe biçemîne carekê.  
Her ew şev li cem min bilinde  
Di nav davên tîrêjê de,  
Li ber çavên zîqên Qertelekê de  
Komeka stêra bo melbendê  
Silava xwînê û kaniya birîna bifirrin.  
Rasparda Xudê bigehînin zarokan.  
Nama agirîn bibin bo hejaran.<sup>(18)</sup>

Ne ew serê xwe ji bo dijminî diçemîne û ne jî, bi fît û ferманa sultanan dinivîse. Ew nabe zirna û boqa ci hêzên siyasi jî. Lewran ew dibêje: "Dema ez dinivîsim, berjewendî, siyaset, partî, rijêm û sultanekê li ber çav nagirim. Ez dizanim helbest hokarekê mezin nîne ji bo nehêlana rijêmê û herrifandina kela sultanî, lê dikare tiliyê di

çavêن çewsîneran de bike. Ez jî mîna (Herman Hesse) wê çendê pesind dikim ku, bi destên faşîstan bême kuştin, neku bibime faşîst.”<sup>(19)</sup> Belê, di gel ax û nalînan mezin bûye û her ci zulm û sitema faşiyên Îraqê heye, dîtiye û li dij jî, xebat kiriye û helwêstên şorişgêrane wergirtîne. Ew di vê helbestê xwe de, bi vî rengî seng û rola helbestê dest nîşan dike.

## YAXÎBÛN

Masî kengî guh dide  
Sinûrê ava nav welatan.  
Ba kengî guh dide  
Sinûrênd erdê navbera welatan.  
Ewir kengî guh dide  
Sinûrênd esmanê nav welatan.  
Helbest kengî guh dide  
Yasa çêkiriya sultanan.<sup>(20)</sup>

Rewşa kambaxa welatî, sitem û ezyeta dijminê hov, ew neçar kir ku, ji Kurdistanê mişext bibe û bikeve kolanênen xerîbî û namo bûnê. Mezinan rast gotiye: ”Kevir di cihê xwe de bi seng e.” Lewra dema yek ji neçarî welatê xwe dihêle, ew dikeve ber hing û dingên xem û azaran. Xerîbî dilê wî dicirmisîne û jiyanê lê tal dike. Ew dibêje:” Nivîsinê li bajar û li çiyay jî, ji serêsiyê pêve, ci ji bo min neaniye. Lî li vêre, li vê xerîbî û dûriyê, roj nîne kotira xeyal û aşopa min, nefirre û neçe welatî, binarê Gwêje.\* Bi şev û roj, xewnan bi Kurdistanê ve dibînim. Ji ber hindê jî, li dûriyê, di gel tevaya

tiştan xerîb û namo me. Nivîsinê jiyanâ min ragirtiye û bi nivîsinê dijîm û hebûna xwe diparêzim. Eger min nekarîba binivîsim, min wê nekarîba bijiyama.”<sup>(21)</sup> Ew di vê helbestê de, xem û derdêñ dûriyê divehîne. Kurdistan bi hemî xweşî û tehliyê xwe ve, di dilê wî de ye.

\* Gwêje: Nêzikirîn çiyayê bajarê Silêmaniye ye.

## STÊR

Ji Şarbajêrê sext û asê.  
Ji binarê Segirmey,  
Dema çend mîla ji dilê Kurdistanê  
Dûr diketim, bê min bivê.  
Hemî şevê: Çirayêñ esmanê Silêmaniye  
Kaniya şeliya dilê min geş dikir.  
Sîrinca min, her li cem wê ronahiye bû  
Heta çavên min diwestan û xewê dilê min dibir.

Niha dûrim  
Dîtina ronahiya ser esmanê bajarê min  
Dûrtir e ji mehalê  
Li ser agirî, guh veçinîme ji bo nûçeyekê.  
Ne diwêrim:  
Telefonê bo nasekê bikim  
Ne dikarim:  
Nameka çav bi rondik binêrim  
Niha bi şev, li vî welatê  
Di tem û mijê werbûy, her dem û gav.  
Dema esman sahî dibe  
Hemî endamên laşê min dibine çav.  
Di esmanê berfireh de, winda dibim  
Bi çavên xwe yên westiyay

Li stêreka geş digerim  
Ta di xodîka çavên wê de  
Silêmanî, dar û kevirên hemî Kurdistanê  
bibînim.<sup>(22)</sup>

1990

\* Şarbajér: Devereka berfireh e li parêzgeha Silêmaniye.  
\* Segirme: Çiyayekê devera Qeredaxê ye li parêzgeha Silêmaniye.

Her çend ew bi evîna welatê xwe ve girêdaye, lê carna evîna şox û şenkekê jî, wî dihejîne û şevêni wî têk dide. Ew mirovekê hest nazik e û ciwaniya keçekê, wî gêj û sewdaser dike. Ji xwe eger mirov evîndarekê rasteqîne nebe û di derya çavên rindekê de, ne xeniqe, ewê çewan kare vê helbesta nazik bivehîne.

## ÇIRÎSKEK JI TÎRÊJA RINDIYA XUDÊ

Qafkê dilî:  
Gula viyana te tê de ye.  
Xodîka çavî:  
Ruxsarê nûraniya te tê de ye.  
Diya guhêñ min  
Li benda pispiseka lêvên te ye.  
Gola laşê min:  
Masiya giyanê te tê de ye.  
Evîna min:  
Gulek e çi car naçirmise û hişik nabe.  
Dêmê te:  
Tîrêjka Xudayî ye.  
Ava nabe.  
Eger ronahiya evîna te  
Ji asoya bûna min winda be

Jiyana min tarîstan e û geş nabe.  
Baran ji ewran dizê  
Yan tem û mij ji avê tê?  
Tu ji diya evînê bûy?  
Yan diya evînê ji te bûye?  
Min bawerî bi yek yasa pîroz heye:  
Yasa evînê.  
Min bawerî bi yek hêzê heye:  
Hêza bilinda evînê.<sup>(23)</sup>

Hemeseîd Hesen, şorîşgerekî çep e, kurd û Kurdistan di dilê wî de ye û jiyana wî dagirtiye. Çinku sedan sal e, sitem û tadayî li gelê wî diête kirin û welatê wî jî dişetînin. Lewre ew neçare berevaniyê jê bike. Dij-min dixwazin navê kurd ji nexşeya cîhanê derînin û binax bikin û ji bo vê armanca genî pîlanan dadirêjin. Belê; gelê kurd ji du aliya ve, diête çewsandin. Ji aliyê netewî ve, wek karker û hejar. Ez bawer dikim ku, dema edîbekê kurd li dijî xwînrêjekê ereb, tirk û faris, helwêstekê wergire û li dij binivîse, ew wê çendê nagehîne ku, ew edîb li dij wî gelî ye. Gelê kurd qerzarê dehan ronakbîr, siyâsî û edîbêñ mîna İsmâil Beşikçi, Hadî Elewî û Meîn Besîso ye. Wî welatê xwe xweş divê û her kesê wilo neke, ew nikare hez li yên din bike. Ji ber hindê jî, Hemeseîd, di evîna welatê xwe de helyaye.

## DÎMENÊ DAWTYÊ

Ez dizanim rojekê,  
Destê mirinê dê dergehê min hejîne.

Ez çaverê me û min ci tirs nîne.  
 Lê ji hindê ditirsim:  
 Dema mirin dibe mîvanê min.  
 Ew rûyê dawiyê dibînim, yê te nebe, welatê min.  
 Ji hindê ditirsim:  
 Berî çavên xwe deynime serêk,  
 Yê dibînim  
 Dêmê rindê  
 Gund, çem  
 Çiya, quntar  
 Deşt, binar  
 Qefteka gulên te yên sûr nebe  
 Ey welatê min. <sup>(24)</sup>

Wî bawerî bi hindê heye ku, dibe edîb bi  
 giştî û nemaze yê kurd, rastgo be û derew û  
 saxta li cemawerî neke, yan jî ji bo berje-  
 wendiyênen xwe yên kirêt û çepel, xelkê ne  
 xapêne û di serda nebe. Divê ew berevani-  
 yê ji rasytî û edaletê bike, neku mîna hin-  
 deka bibe zirna û deholê ji bo wan lêbidin.  
 Heta niha jî xelk tif û laneta li Izra Pawen-  
 dî dike, çînku berevanî ji faşîzmê dikir û  
 her wesa li Ebdulrezaq Ebdulwahidî dîkin  
 ku, ji bo rijêma Saddamî dinivîse. Ji mîje  
 Feqiyê Teyran gotiye:

“Ez naçim dîwanê mîra  
 Nabim şarûrê koçk û sera  
 Bira li min xen kér û xencera  
 Feqiyê Teyra tenegezarê dila  
 Hebûne degbêj û şâîr  
 Bi rûh û dil va pirr feqîr  
 Mîr û bega ra stirane  
 Bê qîmet û melûl mane.” <sup>(25)</sup>

Belê; pêwîste edîb xodîka geşa xem û ko-  
 vanênen cemawerî be. Wek Nazim Hikmet  
 dibêje: ”Di vê mirov bişewite, da ku rona-  
 hiyê bide xelkê din.” Ew di vê helbesta xwe  
 de, li ser rewşa du şairan dinivîse û helwê-  
 tênen wan jî destnîşan dike.

### CIYAWAZIYÊN ME

Ez û tu herdu jêrfermanîn  
 Tu li ber bingehê partiyê  
 Ez li ber bingehê rastiyê.  
 Ez u tu herdu bi fermanê dinivîsin  
 Tu bi ya Xudayê partiyê  
 Ez bi ya Xudayê Helbestê.  
 Ez u tu herdu guhdarîn  
 Tu bo banka berikê  
 Ez bo hewara wîjdanê.  
 Ez u tu herdu  
 Li benda xelatî ne  
 Tu yê Mîrî  
 Ez yê tepeseran  
 Ez u tu herdu, helbestvanîn  
 Tu di dîwanxanê de  
 Ez di derbederiyyê de. <sup>(26)</sup>

Sitem û zulma li ser gelê kurd diête kirin,  
 bê sinûr e. Dema firokên dijminî, gund û  
 bajaran bombebaran dike, ew cudayîyê di  
 navbera zaro, xort, pîrek û kalan de, nakin.  
 Ew ter û hişkî bi hevre dişewitîne. Ji ber vê  
 çendê jî, ne her zelam xebatê dike, belku  
 afreta kurd jî, rola xwe dilîze, nemaze di  
 van salênen dawiyê de. Afreta kurd, di nav rê-  
 xistinîn siyasî de û di nav rêzîn pêşmergan

de, li hemî aliyên Kurdistanê, xebat û bîzavê dike. Wê pîlanê dijminî têkdayne û di nav xwepêşandan de jî, berevanî ji doza xwe kiriye. Belê; nimûnê afreta serbilinda kurd gelek in. Leyla Qasim, li dij faşizma Îraqê dixebitî û di sala 1974-an de, li bajarê Bexdayê, li sêdarê dan. Sinewber di sala 1982-an de, di xwepêşandana bajarê Qeladizê de, hate gullebaran kirin. Zekiya Alkan di sala 1990-an de, li bajarê Diyarbekrê xwe şewitand û bi laşê xwe yê nazik agirê Newrozê geş kir. Lewre Hemeseid, rola afreta kurd dizane û ji bo wê jî, helbestê divehîne. Ew di vê helbesta xwe de, basî rola keça kurd Sinewberê dike ku, li pêşıya xort û keçen bajarî, li dij dijminên faşî dipeyivî û diroşmên şoriş û xweragirtinê bilind diki-rin.

## SINEWBER

Ho ciwamêrê Girê Yarê  
Agehdar bûy, vê buharê jî  
Carek din,  
Sîngê keçan metal bû  
Bo şêlkên barana gullan?  
Agehdar bûy,  
Leşkerê xwînmij,  
Yê berbûye laşê vî bajarî û hemî cihan?  
Agehdar bûy,  
Xortê hêja, li caddêن bajarî  
Şeytan dane ber kiviran?  
Agehdar bûy,  
Coka xwînê, ji binarê Seywanî re  
Bi lez dihat, ber bi bajar?

Çavên zarakan nîşanbûn bo  
Hêrişa Xertelê har.  
Ho ciwamêrê Girê Yarê  
Ho Pîremêrd: Agehdar bûy,  
Gerden ne ditirsa ji kêrê  
Agehdar bûy,  
Kela wireya Daye Amîn.  
Bilind bû mîna kopê Sefîn.?  
Agehdar bûy,  
Tak û çiqêن serê bilindê Sinewberê  
Gehîştibû beramber ewrî û dikir qêrin.  
Hezaran mişar û tevir  
Bi bejna wê ve westiyan û ne birrîn.<sup>(27)</sup>

Her çend ew wek helbestvanekê bi doza gelê xwe ve, girêdaye û ji bo çîna hejaran dinivîse, lê di van salêن dawiyê de, nemaze dema gehîştiye welatê xerîbiyê, carna dûrî û xemên giran, ruha wî digivêsin û toşî namo bûnû dikan. Bi rastî xerîbî dilê mirovê hunermend dixut û mejiyê wî dihêre. Mirov berdewam xwe bi tenê dibîne. Çinku kultura gelê kurd ji ya ewrupiya pirr cuda ye û ew ji aliyê şaristaniyetê ve, dehan sala li pêşıya me ne. Lewre ne mirovê kurd dikare xwe ji kultura kurdî dûr ke û ne jî tê-gehiştin û rewşa civata kurdan rê dide ku, mirov wek wan bîr bike û mîna wan jiyanê bi rê ve bibe. Ev giriftarî û astengên ci-vatê dibine sedemên xerîbî û diltengiyê, û carna di navbera herdu kulturan de, xwe helawîstî dibîne û nikare biryareka rast û dirust bide. Ev çende jî, ruha mirovê nivîskar diêşîne û derdên wî mişe dike. Wî di vê helbesta nazik de, gelek zîrekane û hişyara-

ne, rewşa xwe dide xuya kirin. Ay mirov çendê bi tenê ye!

## RÊWÎTÎ

Her dema  
Bajarekê, wenatekê dihêlim  
Her dema  
Digehimê bajarekê, wenatekê.  
Karwanê xema  
Warê hinavê min, pirr dike ji janekê  
Hêsta li tevaya rawistgeha  
Li hemî gerac, bender û firrgeha  
Ne şoxekê, ez bi şêlkekâ maça rêkirim.  
Ne rindekê, ez bi qefteka gula himbêz kirim.  
Niza çewan min bi sedan rêuwîtî kirin û  
Ez ji xema nemirim.<sup>(28)</sup>

Lê roj bi roj mirov hest dike ku, xerîbî sertaserî aliyên jiyana wî dagîr dike. Bêzar û bê hêvî dike. Bawerî bi ci namîne û heta digehe wê çendê ku, naxwaze hevalekê ji, peyda bike. Bi rastî cihê daxêye ku, Heme-seidê xweragir û pêşbînê hişyar, pirr reşbîn bûye. Cîhana berfireh û mişt ji tiştên xweş, tarî bibîne û ci sînahiyê nabîne. Bixwînin:

Dijî heza min,  
Ez havêtîme di nav vê jiyana berteng de.  
Bê hele û guneh  
Neçar kirim, hemî jiyê xwe, bibûrînim.  
Di nav zîndana jiyanê de.<sup>(29)</sup>

Ew di gelek helbestên xwe de, mîna ebe-siyekî (absurd) dinivîse ku, jiyanê pîç û bê-

mana dibîne. Ne giring e mirov bijî yan bimire! Hebe yan ji nebe. Werin da van hel-bestan ji bixwînîn:

Di vê cîhanê de, bi tenê me  
Di vî kîşwerî de, bi tenê me  
Di vî welatî de, bi tenê me  
Di vî bajarî de, bi tenê me  
Di vî xanî de, bi tenê me  
Heta di vê jorê de,  
Di nivînê razanê de ji, bi tenê me  
Ez tenha di derûna xwe de, ne bi tenê me.<sup>(30)</sup>

Evro ji bê bihayê mîna:  
Rojêni jiyana min yên berê.  
Evro ji bê bihayê mîna:  
Rojêni min yên dahati!<sup>(31)</sup>

- Bo dinivîsim?  
- Çinku nikarîm bipeyvîm.  
Çinku riyeka din tune,  
Ku ez heme, nîşan bidim.  
Çinku riyeka din tune,  
Ji jiyan û bûnê birevîm.  
Ez bo wan dinivîsim,  
Yen ji min derbaz dibin û di gel min napeyvin.  
Di ber wan re diçim û wan nabînim.<sup>(32)</sup>

Bêguman Hemeseid Hesen, helbestvan û şorişgerekê kurdê navdar e. Wî ne bes bi peyvan xebat kiriye, belku bi helwêstên xwe ji, di çeper û sengerên bergiriyê de, xweragirtiye û ji bo doza pîroza kurdî biza-veka mezin û ji dil kiriye. Ji ber hindê ji, çendîn car hatiye êşandin û li dawiyê ji,

mişext û derbederê welatê xerîbiyê bûye.

Raste edeb dikare, rihên xebatê di dilê cemawerî de, kûr bike û berçavêن wî jî, rohin û xuya bike. Lî divê berhemên nivîskarî, ne mîna raport, gotarêن siyasi û nisîhet û şîret bin. Carna hindek helbestêن wî, ji xana edebî derdikevin û riya xwe winda dîkin. Sedemên wê çendê jî, ew in ku, ew dixwaze bi zûtirîn dem û bi kurttirîn rê, mebestêن xwe bigehîne xwendevanî. di hindek helbestan de, dubarekirina mebesta xuya dibin, wek:

(Helbesta Tiropkî Şeydayî. Helebce Xezzey Xemnak e, rûp 44.) û (helbesta Reşbîn. Haje, rûp 7.)

Her wesa ji aliyê naverok û formê ve, sist û lawaz in, wek:

(Helbesta Çend Pirsîyarêن Asan. Helebce Xezzey Xemnak e, rûp 17) û (helbesta Nemam. Le Sayey Çeqo da, rûp 39)

Zimanê wî sivik, xweş û rewan e. Hevokêن wî, bi hêz darêjînê û ferhenga wî dewlemend û paqij e. Ew bi zimanekê cemawerî dinivîse pirraniya xwendevana bi hêsanî di mebestêن wî digehin. Kêşa helbestêن wî bi selîqa tiliyan deynayne û serwa jî, bi rêk û pêkî xemlandîne û mosîka wan jî, guhêni mirovî naêşîne.

Hemeseîd Hesen, di sala 1950-an de, li bajarê Qeredaxê, ser bi parêzgeha Silêmaniye ye, ji dayik bûye. Di sala 1969-an de, pişka mamostatiyê bi dawî anije. Di sala 1969 -an de, dest bi nivîsinê kiriye û berhemên xwe di kovar û rojnamên kurdî de, belav kirîne. Ew ne bes helbestan dinivîse,

belku rexnegirekê xwedan taqet û şîyanê bilind e û heta niha, çendîn pirtûkêن bi nerx û serketî jî çap kirîne. Helbestêن wî hatîne wergerandin bo zimanê erebî, farisi, swêdî û elmanî jî. Sernivîskarê kovara Xermane bû. Ew di sala 1978-an de, bûye endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd, li Kurdistana başûr. Helbestêن min di vê lêkolînê de, bikar anîn, ji tîpêن erebî û kurmanciya jêrî(soranî) wergerandîne kurmanciya jorî. Mebesta me ew e ku, xwendevan bi dirustî di berhemên wî bigehin û ji nêzêk, serbûrênen jiyana wî ya pirr asteng û derdeserî binasin.

#### **Heta niha wî ev berhemên jêrî çap kirîne:**

1. Tavge û binar. Helbest, Bexda 1978.
2. Şiir helwêst e. Rexna edebî, Silêmanî 1978.
3. Wişekan degerênewe medarî xoyan. Rexna edebî, Bexda 1979.
4. Şepolî şeqam. Helbest, kurdistana başûr 1987.
5. Semay gulale sûre. Helbest, Swêd 1987.
6. Ba swêskey şiir be şeware nekewê. Rexna edebî, Yekgirtin 1988.
7. Helebce xezzey xemnak e. Helbest, Swêd 1989.
8. Le sayey çeqo da. Helbest, Swêd 1990.
9. Mêjûy Swêd. Werger, Swêd 1991.
10. Nawerok û şêwe le çîrokî kurdî da. Rexna edebî, Swêd 1992.
11. Cugrafay Swêd. Werger, Swêd 1992.
12. Sebaret şiirî hawçerxî kurdî. Rexna edebî, Swêd 1992.
13. Çawşarkê. Çîrokên zarakan, wergêran, Swêd

1993.

14. Pepûle payîze. Helbest, Swêd 1993.

15. Yekêtî nûseranî kurd çî be ser hat? Rexna siyasî û bîranîn, Swêd 1994.

16. Goraniye balnekirawekan. Rexna siyasî û bîranîn, Swêd 1994.

17. Haje. Helbest, Swêd 1996.

10. Hemeseid Hesen. Sebaret Şiiri Hawçerxî Kurdi, lêkolîn.

Swêd 1992, rûp 150.

11. Dîwana Haje. Swêd 1996, rûp 31 - 32.

12. Dîwana Le Sayey Çeqo da. Swêd 1990, rûp 52 - 54.

13. Dîwana Semay Gulale Sûre. Swêd 1987, rûp 7 - 13.

14. Dîwana Haje. Swêd 1996, rûp 64 - 68.

15. Dîwana Semay Gulale Sûre. Swêd 1987, rûp 20 - 23.

16. Dîwana Le Sayey Çeqo da. Swêd 1990, rûp 7.

17. Her ew çavkanî, rûp 55.

18. Dîwana Helebce Xezzey Xemnak e. Swêd 1988, rûp 34 - 38.

19. Dîwana Le Sayey Çeqo da. Swêd 1990, rûp 8.

20. Dîwana Pepûle Payîze. Swêd 1993, rûp 5.

21. Hemeseid Hesen. Sebaret Şiiri Hawçerxî Kurdi, lêkolîn. Swêd 1992, rûp 142.

22. Dîwana Pepûle Payîze. Swêd 1993, rûp 11 - 12.

23. Dîwana Haje. swêd 1996, rûp 16 - 17.

24. Dîwana Pepûle Payîze. Swêd 1993, rûp 42 - 43.

25. Dr.Izzedîn Mistefa Resûl. Şiiri kurdi, jîyan û berhemî şairanî, beşî yekem. Bexda 1980, rûp 40-41.

26. Dîwana Pepûle Payîze. Swêd 1993, rûp 45-46.

27. Dîwana Semay Gulale Sûre. Swêd 1987, rûp 24 - 28.

28. Dîwana Pepûle Payîze. Swêd 1993, rûp 50.

29. Diwana Haje. Swêd 1996, rûp 7.

30. Diwana Haje. Swêd 1996, rûp 18 - 19.

31. Diwana Haje. Swêd 1996, rûp 21.

32. Dîwana Haje. Swêd 1996, rûp 22.

## ÇAVKANÎ

1. Rojnama Serdemê Nû. Hejmar 40.

2. Pirtûka biyaniyan. Ji weşanên pirtûkxana giştî li Swêdê. Hejmar 13, rûp 88.

3. Her ew çavkanî. Hejmar 19, rûp 90.

4. Dîwana Helebce Xezzey Xemnak e. Swêd 1988, rûp 6.

5. Her ew çavkanî, rûp 10 - 12.

6. Kovara Nûserî Kurd. Hejmar 1, sal 1990, rûp 73.

7. Hemeseid Hesen. Sebaret Şiiri Hawçerxî Kurdi, lêkolîn. Swêd 1992, rûp 150.


8. Dîwana Tavge û Binar. Bexda 1978, rûp 47.

9. Dîwana Haje. Swêd 1996, rûp 42 - 43.

# **Leheng û têkoşerê sedsala 20'an**

## **Nelson Mandela**

*Mihemed Dehsiar*



Lî ser kaxez û li gorî dîrokzaneyan, koleda-  
rî û kolonialîzma klasîk çaxê xwe dagirti-  
ye; em gîhîstine çerxeke nû, dema pêşveçûnê  
û ya teknîkê. Rastî jî jiyana mirovantiyê tevî  
çend hezar salên xwe, îro gîhîstiye pêvajoyeke  
nû û xweser. Teknîk û ûnformasyon bi her  
awayî ketiye rojeva cîhanê û her quncikê tarâ.  
Guhartinê ku di vî awayî de, bi tenê di vê  
sedsala dawî de qewimîne, me bi bûyerên he-  
rî dûr û di demeke pirr kurt de dihisînin. Ëdî  
bi rastî jî dema koledarî û kolonialîzma klasîk  
(ji Kurdistanê û çend deverên biçûk pê  
ve) derbas bû ye, dema nakokiyêna her-  
du sisteman ji bo demekê be jî bi dawî hatine. Çawa ku salên 1950 ta 70-yî  
dema rizgariya neteweyan bû û dema piştî wê salên hilkişîna ser heyvê  
hat pejirandin, niha jî dema ûnformasyon û teknîkê ye. Neteweyen ku di  
navbera herdu şerên cîhanê de û ta salên 70-yî xwe rizgar kirin, ji proble-  
ma serhildan û rizgariyê xilas bûn. Welatên mîna Kurdistanê jî, di ber  
lingên dewletên serdest û kolonialîstan de bindestiya xwe domardin. Bê  
şik ev ne qeder e û ne jî wê her tim wiha dom bike. Weke ku tê zanîn,  
piştî hilweşandina sistema sosyalîst, pirsgirêkên neteweyî li gelek cîhîn  
din (weke nimûne li Yugoslavia û Rusyayê) xwe eşkere kirin. Her çiqas

dema me çaxê teknîk û ûnformasyonê jî bê hesibandin, pêvajoya nû bi xwe re pirsgirêkên nû û global jî anîne. Nakokiyê civakî û navneteweyî, yên nav dewletê dewlemend û bê şik ên xwezayê û der-dorê, çend pirsgirêkên herî girîng in.

Ger em li dîroka mirovantiyê vejerin û lê binêrin, em dibînin ku koledarî û serdestî bi destpêka xweşkerekirina "ego" ya mirov ketiye dîrokê. Mirovên jîr (!) û çeknas (!), bi gotineke din çavnebar û egoîst, piştî demekê bûne xwedî mal-milk û pişt re jî xwedî erk û selahiyet. Ev erk û maldarî her çiqas li hinek deveran û di hinek deman de roleke pozitif jî leyîstibe, bi pirranî bûye sedemê serdestî û zordestiyê. Mirov li ser mirov zor û tadehiyê kiriye, ew ji xwe re kiriye kole. Weke numûne Împaratoriya Romayê di pêşveçûna mirovan de, di pêşdebirina hacetên jiyanê de bûye xwedî karekî qenc; lê ji hêlekê ve bi erk û hêza xwe, pêşî welatên din bi zorê xistiye bin destê xwe û pişt re jî di nav xwe de, sîtemkarî û zordestiya li ser koleyan girantir kiriye. Împaratoriya Osmaniyan bi zor û şiddetê, ji macirbûnê bûne xwediyê ji çara yekê cihanê. Împaratoriya Brîtanyayê, bi vî şeklî bûye xwediyê "Welatê ku tav lê naçe ava".

Bê şik ev zordestî û sîtemkarî di nav xwe de dijberî û neriheti jî anîye. Li hember Împaratoriya Romayê serhildanêن mezin çebûne. Serhildana Spartakus û koleyê hevalên wî ku di sala 73-an de -berî Nebî Isa- dest pê kir, yek ji wan ser-

hildanêن ku di dîrokê de cîhekî taybetî girtiye. Her çiqas bi ser neketibe jî, ev serhildan jî koleyê piştî Spartakus û ji gelên bindest re bû ye numûne û rê nîşanî wan da ye. Her wiha li hember Osmani û İngîlîzan jî car bi car serhildanêن mezin çebûne û gelek caran jî biserketine, gîhîstine rizgariya xwe.

Di dema feodalîzmê de li hember zordestiyê arîstokratan, mîr û began, serhildanêن curbecur çebûne û gelek caran gihiştine armanca xwe. Nakokiyê navbera mirovan bi xwe, ew gelek caran di rewşen cuda de anîne pêşberî hev. Arîstokratên ku li hemerî koledarî û sistema wê bûn, piştî ku hatine ser hukum, vê zordestiyê bi şeklekî din berdewam kirine. Ev bê şik ji bo burjuvayan jî derbas dibe. Kolonyalîzm jî, şeklekî din û zordestiyê ye; di vê sistemê de ji bilî zordestiyê civakî, zordestiyê li ser netewe û gelên din dikeve dereceya yekemîn. Dewletên herî bi hêz û erk, êrîş birine ser welatên ji hêla serax û binaxên xwe ve dewlemend lê ji hêla hêz û erk ve zeif û ew bi zorê zeft kirine. Çawa ku Împ. Romayê, ya Osmaniyan û Rusyayê di dema koledarî û feodalî de curbecur cîh û welatên bê hêz, bi êrîşen leşkerî zeft kirine û xistine bin destên xwe, Brîtanya, Fransa û Rûsyâ jî di van herdu sedsalêن dawîn de, dinyayê li hev parê vekirine.

Lê ne kole û ne jî gelên bindest li hember van êrîş û zordestiyen bêdeng nemanî, di her fersendê de serî hildane û nera-

zîbûna xwe diyar kirine. Bi taybetî jî vê sedsala dawî li çaraliyê cîhanê (Afrîka, Asya, Amerîkaya Başûr) gel û neteweyên bindest, piştî şoreşê gihîştine rizgariya xwe. Îro ji Kurdistanê û çend cîhêن biçûk pê ve, di awayê klasîk de kolonî nemane. Herî koloniyên dawî jî (Erître, Afrîkaya Başûr û hwd)bi serhildan û tekoşînên xwe, rizgariya xwe zeft kirine. Tekoşîna rizgariya Kurdistanê, hîn jî berdewam e.

Bê şik ev rizgarî ne bi hêsanî hatine bîdestxistin. Tekoşîna rizgarî û azadiyê li hinek deveran deh salan û li hinekan jî 50, an jî nêzî 100 salan ajotîye. Bi dehhezarân, hetta bi mîlyonan mirov hatine qetilkirin an jî xwe fîda kirine. Kolonyalîstan tevî polîs û leşkerê xwe, xwestine van serhildanan bifetisînin û gelek caran jî bîserketine. Bersîva wan kuştin, qirkirin, zîndan û işkence bûye. Gelek mirovên welatperwer û pêşevanên hêja, bêtirs xwe avêtine agirê rizgariyê û ew geskirine; tekoşînê bi pêş ve birine.


Yek ji wan tekoşerê mezin û bi rûmet jî Nelson Mandela ye. Mandela, tevî ku rewşa malbata wî ji hêla aborî ve baş bû û ew bi xwe jî bûbû ewûqat, di xortaniya xwe de besdarî tevgêra rizgarî û azadiyê bû û ji 1/3 temenê xwe (27 sal) di zîndanê hukumeta nijadperest de derbas kir. Ew bi tekosîna xwe û bi pêşevaniya xwe, ne tenê ji gelê Afrîkayê re, lê ji tevahîya gelên cîhanê re bûye sembola tekoşîn û serfiraziyê. Lê tiştê herî balkêş û bi rûmet ew e ku di pey hewqas heps û zîndan, ta-

de û zordarî, piştî serkeftinê bû serokkomarê Komara Afrîkaya Başûr. Em ji vî lehengê tekoşer û bi rûmet re temenekî dirêj daxwaz dîkin û dest bi çîroka jiyana wî dîkin.

Nelson Rolihlahla Mandela di 18-yê tîrmehê de, di sala 1918-an de, li gundê Mvezoyê ku li kîleka çemê Mbaskayê diket û nêzî Umtatayê, paytexta Transkeyê hate dînyayê. Transkei bi qandî 130 mîlan dikeve rojhilata Kapstadê û nêzî 90 mîlan jî dikeve rojavayê Johannesburgê. Sînorêñ wê ji jor ve digîje çemê Keyê û Natalê, navbera çiyayê Drakenê û deraya Hîndê. Firehiya Transkeyê bi qasî axa Swîsrayê ye û nêzî sê mîlyon û nîv nufûsa wê heye. Pirraniya şeniyêñ welêt Xhosî ne û gelek hindik jî Bashoto û sipî dijîn.

Bavê wî Gadla Henry Mphakanyîswa, mîrê gundêñ der-dora xwe bû û ji teref melîkê Thembulandê ve hatibû hilbijartin. Ji ber ku welêt di bin bandora îngîlîziyan de bû, pêwîst bû ku her bîryarê melîkê vî welatî ji hêla karmendekî herêmî ve dihat temsîlkirin, bihatina pejirandin. Mîr an jî melîkekî ku ji hêla hukumetê ve bihatina hilbijartin, xwedî meaş bû û ev meaş mîna mesrefîn ku ji bo heywanan, ji bo derman û aşîyan û ji bo axa giştî, ji gundiyan dihat sitandin.

Gelê Xhosa gelekî serbilind î xwedî tra-disyon û baweriyyêñ jîyanekî bi yasa û xwendin e û rûmeta wan tiştan digre. Ci-vaka Xhosayê xwedî sistemeke bi balans û



harmonî ye û di civakê de herkes cîhê xwe dizane. Her Xhosayek, endamê eşîrekê ye ku mirov bi rihetî dikare wî/wê bigihijîne bav û kalên wan. Mandela bi xwe jî ji eşîra Madîba ye ku melîkê wan di salên 1700-an de, li Transkeyê li ser hukum bûn. Ew ji teref hevwelatiyêن xwe ve, bi navê Madîba tê binavkirin ku ev nav tê maneya *haydar* û *hurmetê*.

Bavê wî ne tenê serokê herêma xwe ye, ew her wiha şewirdar û aqilmendê melîkê Thembûlandê ye jî. Bapîrê wî jî mîr bû û ev ji bav û kalan berdewam dikir. Lê ji ber pirsgirêkeke biçûk, ev mîrîtiya wî hê Mandela zarok bû, ji destê wî tê derxistin. Rojekê pirsgirêkeke herêmî derdikeve holê û gundiye li cem hakimê herêmî bavê wî şikayet dike. Çaxê hakimê herêmî -ku ji teref hukumetê ve hatibû tayîn-kirin- ji bo lêkolîn û çareserkirina vê pirsgirêkê bangî bavê wî dike ku fîkrê wî jî bipirse; lê bav naçe cem hakim. Ew weke wezîfe ji hakim bilindir e û naxwaze here ber destê wî. Her wiha bersîva ku dide hakim jî ne li gora toreyên civakî ye. Li ser vê bersîvê, hakim tevî rûsîpiyêن din ew ji wezîfeya wî diavêjin. Ci mal û milkên wî hene jê têne wergirtin û diya wî Nosekenî Fanny ku ji her çar jinêن bavê wî ya sêyemîn bû, tevî zarokêن xwe diçê li gundê Qunuyê bicîh dibe.

Mandela û her sê xwehêن xwe di nav zarokêن vî gundî de bi leystikêن herêmî dileyîzin û hêdî hêdî mezin dîbin. Mandela li ser dawxaza bavê xwe dest bi

xwendinê dike û her sê salên pêşîn li xwendegeha gund dixwîne. Piştî ku bavê wî diçe ser heqîya xwe, li ser wesiyetên wî diçe Mqekezwenî, paytexta Thembulandê, cem melîkê wir ku pismamê bavê vî bû.

Bavê Mandela li cem melîkê Thembûlandê mirovekî bi rûmet û xwedî gotin bû. Di biryarêñ herî gifîng de, pêşî fikrê wî dihatin pirsîn. Dema rojekê melîkê mezin dimire, li ser pêşneyara bavê Mandela, ji ber xwendin û jîrbûna xwe, ne kurê mezin lê yê navîn weke melîk tê hilbijartin. Li ser vê melîk Jongîntaba ji bili şêwirdariyê, ew dike destebirakê xwe û soz didê heke ew wefat bike, wê ew kurê wî Mandela bîne di mala xwe de, weke kurê xwe xweyî bike û bide xwendin.

Piştî ku bavê wî çû rehmetê, melîkê Thembûlandê Mandela tîne mala xwe û weke zarokêñ xwe xweyî dike. Kurê Jongîntaba Justice ku bi çend salan ji Mandela mezintir bû û ew di yek odayekê de, bi hev re dimînin; dixwin û vedixwin. Çi melîk û jina wî, ci jî zarokêñ wan, Mandela mîna kurekî malê dihesibînin û tu ferqiyetê naxin nav herdu zarakan.

Mandela di 16 saliya xwe de tevî xortêñ herêma xwe, tê sunnetkirin û êdî li gora toreyan ji zarokiyê difilite û dibe zilam. Apê wî piştî xwendina bingehîn, ew dişîne Institutîya Clarkeburîyê; dibistanekê bi cîhê razanê ku ji teref mîsyoneran ve hatibû avakirin û di nava xwendegehêñ afrîkaniyan de yeke herî pêşketî bû.

Xwendegeh bi xwe di norma lîseyê de bû û mamosteyêñ pêşerojê hazir dikir.

Di sala 1937-an de li bajarê Healdtownê, 19 salî dest bi kolleja Fort Beaufortê dike. Ev xwendegeh jî mîna gelekêñ din ji teref mîsyoneran ve hatibû vekirin û bi giranî stîla modela îngîlîzî dida domandin. Babetêñ wê yî herî gifîng, ola xîristiyanî û humanîstî bû.

Di vê xwendegehê de gelek xortêñ ji eşîr û bajarêñ dûr dinase û bi wan re dibe dost. Ji ber ku perwerdekirina wan li gora modela îngîlîziyan tê kirin, pirraniya şagirtêñ van dibistanan di bin tesîra îngîlîziyan û asîmîlasyona wan de dimînin. Xwendin û jiyana wan, hiş û mejûyêñ wan, li gora îngîlîziyan şekil digire û îngîlîzî dîbin îdealê wan. Mandela jî weke pirraniya hevalêñ xwe, ta tewakirina xwendegehê jî hay ji Afrikayê û rewşa wê tune ye; heyranê îngîlîziyan e. Bi tenê yek armanca wî heye; ew jî ew e ku bixwîne û bibe şêwîdarê melîkê xwe.

Lê zêde dûr naçê ku tevgîra rizgariyê dinase; di dawiya tewakirina dibistanê de, besdarî şeva qedandina dibistanê dibe û şâîr û stranbêjekî bi nav û deng guhdarî dike. Ev şîr û stranêñ wî û di dawiyê de axaftina wî, dînyaya Mandela yî biçûk, ji serî ve diguhîrîne. Ew bi tevayî di bin tesîra vî ronakbîrî de dimîne û rihekî welat-perweriyê dide wî û bi sedan hevalêñ wî. Hê fêm dike ku welat welatê wan e lê ew ji teref sipiyan ve, bi awayekê bê însaf têne îdarekirinê. Pirsêñ di serê wî de bi vî

awayî zêde dibin û ew ji bû bersîva van  
pirsan bide, serê xwe zêde diêşîne.

21 salî dest bi universîteya Fort Hare ku  
bi 30 km dikete rojhilata Healdtownê, di-  
ke Ev universîte, yekem instituya ji bo  
reşikên Afrîkaya Başûr bû û ji teref mîs-  
yonerên skoçî ve hatibû avakirin.

Mandela xistibû serê xwe ku bibe ewû-  
qat û lewma jî guh dida xwendina xwe.  
Lê sala dawî bûyerek qewimî ku planêñ  
wî yên ku bibe ewûqat û vegere gundê  
xwe û alîkariya diya xwe, malbata xwe û  
gelê xwe bike, da guhartin.

Mandela di dawiya termînê de ji bo en-  
damiya konseya şagirtan hat pêşkêşkirin.  
Mandela û pênc şagirt hatin hilbijartın lê  
ji ber ku ji 150 şagirtan bi tenê 25 kesan  
ray bikaranîbûn, konseya nû vê ji xwe re  
kêmasiyek dît û xwe bi paş ve kişand. Çâ-  
xê di hilbijartına duyem de jî ev rewş ne-  
guhirî, hevalên wî dest bi karê xwe kirin  
lê Mandela xwe dîsa bi şünde kişand. Wî  
êdî fêm kiribû ku idareya dibistanê dix-  
west konseyê ji bo karêñ xwe bide bikara-  
nîn û wê têxe bin tesîra xwe. Rektorê  
xwendegehê tevî ku ji Mandela hez jî di-  
kir, ji biryara wî gelek aciz bû. Rektor du  
riya da ber wî; ya wê endametiya konseyê  
bimeşandina yan jî wê ji xwendegehê bi-  
hatina avêtin. Mandela nedixwest wezîfe  
bigire lê dixwest li xwendina xwe jî bidomîne.  
Rektor şensekî dayê ku besdarî îm-  
tîhanan dawî bibe û here termînekê bifi-  
kire û hêja were biryarê xwe bide. Ger  
biryarê wî pozitîf bûna, dê karibû xwen-

dina xwe bidomandina.

Mandela vedigere Mqhekezwenî, cem  
“bavê” xwe. “Bira” yê wî Justice jî wê  
hingê vege riyabû malê. Rojekê melîk wan  
dibe cem xwe û biryarê ku dabû ji wan re  
eşkere dike; ew êdî pîr û kal bûbû û berî  
ku bimre dixwest herduyan bizevicîne. Ji  
wan re du keçan xwestibû û qelenen wan  
jî biribû.

Ev biryara ji nişka ve, ji herdu xortan re  
weke şok hatibû. Herduyan jî keçikan baş  
ne dinasîn û ne dixwestin bi vî şeklî bize-  
wicin. Herdu jî xwendevan bûn û dix-  
westin bi dilê xwe, li gora bîr û raya xwe  
bizevicin. Lê melîk her riyê ji ber wan  
girt û ew guhdarî nekirin; biryar hatibû  
dayîn û pêwîst bû ew li gora toreyên he-  
rêmî bibin xwedî jin û malbat. Li ser vê,  
herdu xortan serî dan hev û hatin ser wê  
biryarê ku ji gund birevin û herin li Joh-  
annesburgê bicîh bibin. Çavnêriya me-  
lîk dîkin ku ew ji gund derkeve û rojekê  
piştî ew ji mal diçe, herdu ciwan ji mal  
direvin û berê xwe didin oxira xwe.

Li Johannesburgê, ku ev bajêr ji berê ve  
tesîreke mezin li ser Mandela kiribû û ew  
ber bi xwe ve dikişand, bi alîkariya dost û  
nasîn xwe di ocazan de dest bi kar kirin.  
Piştî karmendêñ ocazan pê dihisin ku  
destura wan sexte ye û ew ji malê reviye-  
ne, ew ji kar diavêjin. Herdu bira bê kar  
bê cîhêñ razanê dimînin. Piştî vê, herdu  
ji mecbûrî ji hev diqetin û her yekê ji bo  
demeke kin li cem nas û dostêñ xwe di-  
mînin. Mandela piştî demekê bi alîkariya

nasekî xwe ku navê Walter Sisulu bû û wê di pêş de bibûna hevalê wî yê herî nêz û baş, li şirketeke ewûqatiyê dest bi karê praktikê dike û bi şevan ji diçe xwendegehê ku dersên xwe yên mayî biqedîne. Wê demê ji bo ku mirov di huqûqê de kar bibîne û ewûqat bê hesibandin, tevî bi da-wîanîna xwendegehê jî pêwîst bû ku mirov çend salan li cem ewûqatekî karê praktikî bikira.

Mandela di cihê kar de mirovekî bi na-vê Gaur dinase û pê re dibe heval. Gaur endamekî girîng ê ANC-ê ye û zilamekî bê xof e. Ew her wiha dîtinêne xwe eşkere dibêje lê ji ber ku di karê xwe de pirr jîr e, kes dengê xwe ji gotinêne wî re dernaxe. Mandela di dîtin û baweriyêne niştîman-perweriyê de di bin tesîra wî de dimîne û di derheqa ANC-ê de dibe xwedî agahdariyeke fireh. Gaur ji bilî endametiya ANC-ê, endamê Partiya Komunist jî bû û ramanêne xwe bi rehetî pêşkêşî Mandela dikir û pê dida zanîn ku tenê rizgariya welêt têr nedikir; her wiha pêwîst bû ku piştî rizgariyê sîstemeke adîl jî bête avakirin.

Lê Mandela van dîtinêne wî yên dawî ji xwe re xerîb û bêmane didît. Dê Mandela piştî ku bikeve nav xebata siyasi, li hember komunîstan xebateke dijwar bimeşîne. Tevî ku pirraniya endamên PK-ê endamên ANC-ê bûn û bi her awayî bi wan re kar jî dikirin, Mandela timî di wan de di şikan de bû. Ew bi tenê ji bo navêne xwe, ji bo ji ANC-ê û alîgirîn wê fêde bi-

bînin û bi vî awayî wê têxin binê însiyatîfa xwe, bi wan re kar dikirin, difikirî Mandela. Ü van dîtinêne xwe li her deverê eşkere jî diyar dikir.

Bajarê mezin, Mandela heyranî xwe kîribû. Bi sedhezaran kes li der-dorê bajêr hatibûn belavkirin. Ji hemû gel û eşiran - Xhosa, Zulu, Swazî, Asyayî, sipî û yên din li cihêne ji hev cudakirî bicîh bûbûn. Çawa ku cihê sipî, reşik û hindîyan ji hev cuda bûn, cihêne eşiran jî ji hev hatibû qet-tandin. Siyaseteke dewletê jî ji hev cudakirin û belavkirina eşiran û gelên din û her wiha li hember hev bikaranîna wan bû. Dewletê nedixwest eşîrên welêt weke neteweyekî bigihîjin ser hev û bi vî awayî, ew ji hev dûr dixist û pirsgirêkên herêmî bikar dianî. Lewma jî pêwendiyêne eşiran bi hev re gelek kêm bûn û wek numûne zewaca bi endamekî eşireke din re, weke tabû bû.

Mandela bi xwe jî weke diya xwe fileh bû (bavê wî qet derbasî ser dînê dijmin nebûbû) lê di van pirsên herêmî û toreyen kevnare de, weke berê nedifikirî. Ji xwe lewma jî ji gundê xwe terkeser bûbû û hatibû li bajarê mezin bicîh bûbû. Piştî demekê kesen ji eşîrên cihê û gelên din naskiribû, dîtinêne wî di vî awayî de bêtir guhiribûn. Têgihîstibû bê dijmin çawa ew ji hev diqetandin û li hember hev bikardianîn. Fêm kiribû ku xwediyêne we-lêt, li welatê bav û kalên xwe di ci belengazî û şerpeziyê de dijîn. Bi dehhezaran reşikên belengaz di xaniyêne teneke de, ji-

yanekê birçî û belengaz diborandin.

Di dawiya sala 1942-an de îmtîhana xwe ya dawî bi serfirazî da û dîplomeya xwe heq kir. Lê wê ev diplomeya wî nebûya bilêta serkeftina wî; ji bo wê diviya ku bi salan xebat bikarana û gelek nanên pijandî bixwarina. Ji hêla aborî ve jî rewşa wî pirr xerab bû û çend şîlînên ku ji cîhê kar jî digirt, ne têrî xwarin û cilên wî û ne jî têrî kirya wî dikirin. Gelek caran birçî diraza û cakêtê wî jî yê berî du-sê salan bû. Gelek caran li cem nas û dostêن xwarin dixwar û her rojêن yekşeman li cem xwediye odaya xwe, zikê xwe bi xwarina germ dadigirt. Rojêن yekşeman, jê re weke rojeke pîroz bû; lewra jî wê rojê li kur buya, vedigeriya malê û diçû cem mazûrvanê xwe.

Mandela bi dostê xwe Gaur re çend caran besdarî civînêن partiyê û ANC-ê dibe û nîqaşen wan guhdarî dike. Besdarî axafîn û nîqaşen wan nabe, tenê weke mîvanekî guhdar ji xwe re rûdinê û pirsgirêkên civakî guhdarî dikir. Cara yekem di sala 1943-an besdarî meşeke protestoyê dibe. Bi dehhezaran mirov li hember zêdekirinabihayê bilêtêن otobusan meşiyabûn û ANC-ê ji bi can û dil piştgiriya vê meşê kiribû.

Wê Gaur -tevî ku xwendengeheke bilind nexwendibû jî di şirketê de weke berpirsiyare wî kar dikir- di pêşejiyana wî de, li ser Mandela tesîreke mezin bike. Gaur tevî ku endamê PK-ê bû jî, car bi car li ser girîngiya xebata ANC-ê radiwestiya û wê

weke motora şoreşa rizgariyê dihesiband. Ew li ser dîroka rêxistinê disekinî û program û struktura partiya xwe bi zimanekî xweş pêşkêşî wî dikir. Çaxê ew û Mandela derdiketin xwarinê yan jî vala diman, li ser pêwîstiya karê bi rêxistinî disekinî û ew bi kesen girîng ên rêxistinê dida nasîn. Her wiha pirtûkên siyasi jî dida wî ku bixwîne û ew teşwîqî besdariya meş û ci-vînêن rêxistinê dikir.

Lê Mandela pişt re li unîversiteyê Olîver Tambo jî dinase û pê re dibe heval. Mandela, Olîver û Walter di vê demê de bi hev re hevaltiya xwe xurt dikin û wê ev hevalti, heta dawiya temenê wan bidome. Her sê heval di nav ANC-ê de temsila xortenê mîltan dikin û xwîneke teze didin rêxistinê. Mandela li ser besdariya xwe ya tevgêra rizgariyê wiha dibêje:

*“Ez nikarim bibêjim ku ez çîçaxî bûm si-yasetvan; lê dema ku min biryar da, min zanibû ku ez ê jiyana xwe ji bo tekoşîna rizgariyê bidomînim. Weke afrikayî, li Başûrê Afrikayê mirov dema ji diya xwe çêdi-be, xwe di orta siyasetê de dibîne. Zarokekî reşik i afrikayî, di nexweşxaneya bi tenê ji bo reşikan de tê dinyayê; bi otobusen bi tenê ji bo reşikan tê male; li cîhêن bi tenê ji bo reşikan dijîn û diçin xwendengehê bi tenê ji bo reşikan, ku ew jî bikaribin bixwînin.”* (N. Mandela; Den långa vägen till friheten, r. 99)

Nelson Mandela, Olîver Tambo, Anton Lembede, Walter Sisûlû û çend hevalen xwe di sala 1944-an de di bin baskê

ANC-ê de rêxistina ciwanan "Youth League" ava kirin. Lembede bû serokê rêxistin, Olîver sekreter û Walter jî sekreterê aborî. Mandela û çend kesên din ketin komîteya birêvebinenê. Li gorî baweriya wan ku van dîtinên xwe ji serokê rêxistinê dr Xusa re jî diyar kiribûn, ANC êdî bi vî awayî nikaribû gel bikşîne nav rêxistinê; pêwîst bû ku rêxistina ciwanan bi taktîkên guhartî û xebateke pirrhêl, bibûna pireke ku gel bikşîne nav rêxistinê û wê hîn bi hêztir bike. Her wiha ji xwe re bernameyeke kar û xebatê li dijî hukumeta nîjadperest jî amade kirin û dest bi xebata xwe kirin. Li gorî manîfesto ya wan, wê Yekîtiya Ciwanan ANC-ê bibûna dil û hêza ku Afrikayê ber bi rizgariyê ve bibe.

Xebata wan û pêşî, li hember qanûnênu ku hebûna wan ji ortê radikirin bû. Qanûnênu milk (Land Act-1913), ji % 87 axa afrikaniyan ji destê wan derdixistibû. Qanûnênu herêmên bajêr (Urban Areas Act-1923), reşikan mecbûrî bicîhkirina di herêmên feqîr û belengaz de dikirin û derketina wan a ji herêmên xwe qedexe dikir an jî ew mecbûrî pasaportê û destûra dikirin. Qanûnênu astengiya nîjadî (Color Bar Act-1926), reşikan ji her karên meslekî û bi kalîte dûr dixistin. Qanûnênu mîna van sal bi sa zêde dibûn û her riyên jiyanê dixitimandin. Yekîtiya Ciwanan, di karê xwe yî yekemîn de gelê xwe li hemberî van qanûnan bangî protestoyan dikir.

Ji ber ku cîhekî wî yî taybetî tune bû,

hevalê wî Walter ew anî cem xwe û di mala xwe de cih da yê. Walter her wiha ji hêla aborî ve jî alîkariya wî dikir û ji bo ku di dersên xwe yên dawî de biserkeve, bi deyn pere jî dabûyê. Mandela di vê malê de keçekte bi navê Evelyn ku xwendegeha hemşîretiyê dixwend, nas kir û piştî demekê pê re zewicî.

Di sala 1946-an de karkerê ocaxan dest bi grevê dikin û zêdeyi 70.000 xebatkar besdarî vê grevê bûn. Meaşê wan mehê tenê du shilling bûn û karkeran doza deh shilling û salê du heftî jî betlaneyê dikirin. Piştî greva heftiyekê, polîs tevî çek û seyên xwe bi ser wan ve girt, ew ji malên wan derxistin û serokên African Mineworker's Union û aktîvistên ANC-ê xistin zîndanan. Bi hezaran kes hatin girtin, bi sedan kes di bin xezeba polîs de hatin birînkirin û 12 kes jî hatin qetil kirin. Li welêt cara yekem bû ku greveke di vê çapê de çêbûbû û di demeke kin de li çar aliyê welêt bela bûbû. Greva karkeran sempatiya gel jî kişandibû ser xwe lê din bin xezeba polîsên nîjadperest de hat perçiqandin.

Piştî vê bûyerê, hukumetê mafêñ hindiyêñ Natalê kêm kirin. Li ser vê hindiyêñ Afrikayê di bin ala Transvaal Indian Congress de dest bi protestoyen xwe kirin. Piraniya hindiyêñ Afrikaya Başûr besdarî van protestoyan bûn. Gelê hindî-karker, gundî, dewlemend û rewşenbîr-dor bi dor nêzî du salan vê protestoya xwe domand. Polîs bi hezaran kes xistin

hepsê. Zirtên dewlet û polîs, gelê hindî çavtirsandî nekirin, her roj bi sedan kes kişiyan ber hepsê û ji polîs dazwaza ketina hepsê kirin.

ANC û Yekîtiya Ciwanan jî di vê tekoşîna wan de, ew bi tenê nehiştin û bi her awayî piştgiriya wan kirin. Wan jî hêla xwe ve dest protestoyêni bi vî şeklî kir. Protestoyêni bi vî awayî, li ser ciwanan tesireke mezin kir. Wan fêm kir ku tekoşîna rizgariyê, ne bi tenê axaftina ji bo gel, civîn an jî şiyandina delegasyonan bû; lê her wiha organîzeyeke baş, protestoyêni gelempêrî û mîlîtanî û ya herî girîng jî xwe fidakirin bû. Ew hê tê gihîştin ku gelê hindî çima hewqas rûmeta Mahatma Gandhî digirtin û tekoşîna wî ya 1913-an ku wê demê li hember hukumeta Afrîkîya nîjadperest dabû meşandin, didomandin.

Mandela di vê tekoşînê de roj bi roj pişîya û fêrî tiştên nû bû. Di sala 1947-an de weke cîgirê serokê komîteya Transvaalê yê ANC-ê hat hilbijartin. Her ev sal e ku serokê ANC-ê dr Xusa, yê Kongreya Hîndî li Transvaalê dr Dadoo û yê Kongreya Hîndî li Natalê dr Naicker bi hev re peymanekê çekirin. Ev peymana ku bi navê "peymana doktoran" dikeve dîrokê, li hember dijmin xebateke hevbeş xistibû bernameya xwe. Ev platform di jiyana gelên reşik û hindî de gavekî girîng bû û piştî ku rêxistina rengînan (asyayî, çînî, mulat û yên din) Afrîcan People's Organisation jî besdarî vê platformê bû, hîn

bêtir bi hêz bûn.

Weke prensîb van her sê rêxistinan li hev kiribûn ku di protesto û civînan de, di gel hev kar bikin û piştgiriya hev bikin. Lê ji ber ku pirsgirêkên wan ji hev cuda bûn, xebata wan jî li gora van pirsgirêkan ji hev cuda dibûn. Weke nimûne sistema pasaportan zêde tesîrê li ser hindî û gelên rengîn nedikir; qanûnên ku hindîyan bi tenê li cîhênen wan mecbûrî taciriyyê dikir, reşikan zêde eleqedar nediki an jî qanûnên wê hingê ku gelên rengîn li hember jihevqetandina nîjadan dixistin tengasiyê û rewşike xerab, reşik û hindîyan eleqedar nedikirin. Dewletê bi zanebûn ji bo her gelê qanûnên cuda derxistibû ku bi vî awayî ew ji hev biqetînin û tekoşîna wan jî ji hev dûr bixe.

Di hilbijartinan sala 1948-an de partiya Smuts (United Party) ku di şer de li hember Hitler li gel Dewletê Yekbûyî cîh girtibû, ji ser hukum ket û partiya ku piştgiriya Hitler kiribû (Nationalist Party) hate ser hukum. Partiya Nîjadperest berî hilbijartinan di xebat û propogandaya xwe de eşkere erîşî ser reşikan kiribû û ew ji xwe re xetereke herî mezin ilan kiribû. "Reşikan li cîhê wan bidin rûniştandin" û "hindî û asyayî ji welêt derxin" sloganâ wan i herî girîng bû.

Ev partî ji teref afrikaaniyan (hollandî, belçîqî, elmanî û hwd) ve dihat idarekirin û bi salan di bin baskên îngîlîziyan de ji-yabûn. Di dema idareya îngîlîziyan de kîneke mezin ketibû dilên wan û dixwestin

vê kînê di çavê reşik û gelên din de derxînin. Serokê partiyê dr Malan, mixalefeta li hember United Party civand ser hev û navê vê platformê “Apartheid” danî. Apartheid tê maneya *cudabûn* an jî *jihev-qetandinê*.

Çaxê Partiya Nijadperest hate ser hukum, êdî ew ji bin bandora îngîlîziyan rizgar bûbûn. Heta niha zimanê afrikaanî zimanê duyem bû, lê piştî hilbijartinan îngîlîzî bû zimanê duyem. “*Gelê me, zimanê me, welatê me!*” şîara wan û herî gi-rîng bû. Serokê Partiyê dr Malan di axaf-tina xwe yî piştî hilbijartinan de wiha digot: “*Afrikaya Başûr dîsa ya me ye!*”. General Smuts jî baş fêm kiribû ku çawa hukum xistibû destê nijadperest û kevneperestan lê êdî tiştek ji destên wî nedihat.

Salên 1950-yan, di jiyana Afrikaya Başûr de pergalên nû vedike. Tevgîra rizgariyê, ji nav mal û civînan rizgar dibe; di jiyana siyasî de xebatên nû dikeve rojevê û pêşkeftinên gi-rîng bi xwe re derdixe meydanê. Gelên bindest bi piştgiriya rêxistinên civakî, li hember rejîma nijadperest beşdarî xebata demokratîk û polîtîk a bi awayê aştî dixin. Tevgîra “**antî-apartheid**”, bi xebata ANC-ê ku di vê demê de dibe tevgîra neteweyî-demokratîk, di-gihîje rewşa xweyî herî bilind.

Salên 1960-an, ji bo jiyana gelên bindest ên afrikayê, ji her awayî ve dixin salên reş û tarî. ANC û tevahiya rêxistinên demokratîk ên li dijî rejîmê, têne qedexekirin û bi sedan serokên wan dikevin

heps û zîndanan an jî di malên xwe dibin hepsî. Di van salan de ye ku Mandela û bi dehan serokên ANC û PAC-ê (Pan Africanist Congress, rêxistinêku pirrani-ya serokên wê di sala 1959-an de ji ANC-ê veqetiyabûn û rêxistinêbi vî navî da-nîbûn. PAC li dijî komunîzmê û li dijî ku sipî di nav tevgîra rizgariyê de cîh bigrin bû û şîara wan “*Afrika ji bo afîkaniyan!*”bû.) ji teref polîs ve têne girtin û ce-zayêñ pirr giran digrin.

Mandela di konferansa ANC-ê ya sala 1952-an de dibe cîgirê yekem ê rêxistinê û mîr Albert Luthulî yekemîn reşik û afrikayî ku wê di sala 1961-an de xelata Nobelê ya aştiyê werdigre, jî dibe serokê ANC-ê. Mandela wê demê nikaribû ji mal derkeve û beşdarî civînên siyasî bibe, lê dawî agahdariyên pêwîst distîne. Ew ji rewşa welêt texmîn dike ku wê ANC bête qedexekirin û lewma jî dest bi planekî dike ku rêxistinê bike îllegal. Bi hevalên xwe re diaxife û wan dide bawerkirin ku planekî wiha pêwîst e. Planê Mandela ku jê re bi kurtayî “M-plan” tê gotin, roj bi roj dikeve jiyanê. Li tevahiya herêmên xwe dest bi kurseke ku vî planî bi komîte û endamên xwe re têxin jiyanê, dikin.

Her wiha Mandela bûbû ewûqat jî û şîrketa xwe vekiribû. Pişt re ew û Oliver Tambo bi hev re şîrketa “Mandela & Tambo” vedikin û dest bi karê xwe dikan. Şîrketa wan di demeke kin de pirr populer dibe û di salona avahiyê de jî cîh na-mîne. Hukumet naxwaze destûra xebata

van herdu reşikên ewûqat bide lê ew dîsa bi awayekî nîv-dizî vî karê xwe dimeşînin û jê hélekê ve jî kar û xebata siyasî didomînin.. Tevî ku besdarî karê ewûqatiyê dibin jî dîsa ji karêne xwe yên siyasî bi paş ve namînin; besdarî dijberiya qanûnên nû dibin û gelê xwe di van karan de organîze dikin.

Mandela tevî vê jî ne memnûn e; dijminê har bi vî awayî nedihat rê û zilm û zordariya xwe roj bi roj zêdetir dikir. Tekoşîna pasîf êdî ew têr nedikir û bersîva dîtinên wî nedida. Pêwîst bû dijmin bi awayekî çavtîrsandî bibûna ku zilma xwe kêm bikirna û ew jî bigihîştina armanca xwe. Ji xwe gelek carê berê jî ji hevalên xwe re, di kongre û civînan de behsa tekoşîneke mîlîtanî û radiqal kiribû lê zêde kesan guh nedabûn dîtinên wî. Van dîtinên xwe ji serokê ANC- ê re jî vekiribû çend caran, lê jê jî bersîveke pozitîf negirtibû.

Walter Susulî hevalê wî yî herî nêz bû; ew di sala 1953-an de li Bukreşê besdarî civîna xort û şagîrtên cihanê dibe. Wê demê Mandela jê daxwaz dike ku ew li ser rewşa şerê çekdarî fîkrên welatên derva bipirse û bi taybetî jî li Çînê lêkolîneke di vî awayî de bike. Walter soz didê ku vê qewîtiya wî bi cîh bîne. Piştî civîna xorstan li Bukreşê, Walter xwe bi awayekî digihîjîne Çînê; serokê Çînê bi hatina wî pirr kîfxwes dîbin û sempatiya xwe ji tekoşîna wan re diyar dîkin lê alîkarî nadîn û naxwazin ku gelê Afrîkî dest bi şerê

çekdarî bikin.

Partiya Komunîst di sala 1950-an de hatibû qedexekirin û ANC û rêexistinê din jî li ber qedexekirinê bûn. Her wiha zilm û pîkoliyê hukumeta nîjadperest jî her roj zêdetir dibûn. Serokê rêexistinan di malên xwe de hatibûn hepiskirin û besdariya wan û civîn û meşan hatibû qedexekirin, mafêni jiyanê roj bi roj zortir dibû. Li ser van bûyeran û rewşa nû, tevahîya rêexistinê dijberê hukumetê li hev dicivin û kongreyeke gel organîze dikin. Di serî de nûneren ANC-ê û yê SAIC-ê (South African Indian Congress), SAC-PO-yê (South African Coloured People's Organisation) û COD-ê (Congres of Democrats) di dawiya kongreyê de bi hev re deklerasyoneke ku navê wê weke "**Deklerasona Azadiyê**" derbasî dîrokê dibe, ilan dikin. Ev deklerasyona ku wê bibe hîmê azadî û rizgariya gelên Afrîkayê, li ser çend tiştîn giring û pêwîst radiwestuya: wekhevî û bidawîanîna zilm û zordariyê, demokrasî û aştî. Her wiha çar ser-nîvîşen deklerasyonê jî ev bûn: wê gel xwe idare bikirna; Wê her grûbênen welêt xwedî maf û erkên wekheviyê bûna; wê gel ji dewlemendiyê welêt para xwe bigirtina û wê ax ji hêla kesên ku wê bikardianîn ve bihatina parê vekirin.

*Dûmahik di hejmara bê de*

# Azar Mahloujian, nivîskara "De sönderrivna bilderna"

F. Cewerî

**D**i civîneke me ya konseya kulturê de, Azar Mahloujian, ku nêzîkî sê salan e em bi hev re dixebeitin, piştî civînê ji çenteyê xwe qapaxeke bîriqandî derxist û bi şermokî ji me re got: "Ez dixwazim ji we re tiştekî bibê-jim, piştî du hefteyê din pirtûka min derdikeve."

Hera wê kêliyê jî wê di derheqa nivîskariya xwe de tiştek ji me re negoti-bû. Bi tenê me dizanîbû ku ew hinek şârîn faris werdigerîne swêdî.

Ez li nêzîkî wê rûniştibûm, min qapax ji destê wê girt û bi kêt lê nihêrî. Li ser qapaxa sorêtarî, bi swêdî *De sönderrivna bilderna* (Resimên çiriyayı) nivîsandîbû, mîna nivîskar jî navê Nahîd li ser hebû. Nahîd naznavê Azar Mahloujian yê zaroktiyê ye. Piştî ku ez çav li navê weşanxaneyê ketim, min fêhm kir ku wê pirtûkeke baş be. Weşanxaneya Bonniers yek ji weşanxane-yê Swêdê ya herî cidî ye.

Min ji Azarê pirsî bê çîma wê navê xwe yê rastî bi kar neaniye.

"Ez ji xirecira massmediyayê hez nakim û ji aliyê din ve jî tu dizanî ku re-jîma meleyan metodên tunekirinê li hemberî muxalîf û intellektuelan bi kar tîne", wê got.

Ez du hefteyan bi heyecan li bendî pirtûka Azar Mahloujian "De sönderrivna bilderna" mam. Gava pirtûk derket û bi afişen mezin di camekanên pirtûkfiroşan de xuya bû, min texmîn kir ku ew ê jî bişibe pirtûka Betty Mahmudî "Ne bêî keça min". An jî ji bo qezenkirina peran û derxistina



Pirtûka Azar Mahloujian di çapemeniya Swêdê de rexneyên baş girt.

navê xwe, bi navê lidijderketina fundamentalîzmê, wê weşanxaneyê, pirtûk pê dabe nivîsandin. Lê gava min pirtûk xwend û ez bûm şirîkê serpêhatiya Azarê, ez bûm şahidê dilsoziya wê jî.

Azar Mahloujian bi ciwanî, di dema xwendina unîversiteyê de, dikeve nava refen çepan û li dijî nedemokratîkbûna kar-bidestiya Şah têkoşînê dide. Ew jî mîna çep û komunîstên dinyayê dibe yek ji piştgirê serîhildana Xumeynî. Lê piştî Xumeynî desthilatdariya Îranê dixe destê xwe û ji metodê demokratîk bi dûr dikeve, Mahloujian û hevalên xwe vê carê dikevin nava refê muxalîfan. Ji bo ku ew jî aqûbeta bi sedan muxalîfên ku hatin kuştin, nejî, ew riya azadiyê di revê de dibîne.

Pirtûka Mahloujian li ser reva wê ya ji Îranê, derbasbûna ji çiyayê Kurdistanê yên asê, hatina Tirkîyeyê, li Tirkîyeyê pêrgîhatina probleman, mayina li Yugoslavia-yê, dawî dawî hatina Swêdê, li Swêdê rûbirûbûna pirsgirêkên surgûnê û berbihevirkirina kulturê rohilatî û roavayı. Herçiqas carinan pirtûk nêzîkî sînorê romanê dibe jî, dîsa ew mîna bîranînekê hatiye hûnandin.

Gava bi niyeta kurtehevpeyvînekê ez Azar Mahloujian li kafeteryaya "Kulturhusetê" dibînim, bi vexwarina qehweyê re ez pirsa fikra nivîsandina vê berhemê jê dikim. Ew bi swêdiyekê baş lê bi devoka farisan pirsa min wilo dibersivîne:

"Min ji mêt ve dixwest ez li ser reva xwe tiştekî binivîsînim û di kovareke swêdî de

biweşînim. Bi vê yekê hem ez ê ji aliya wij-dan de rehet bibûma, hem jî min ê bala giştî ya Swêdê bikişanda ser rejîma Îranê. Lê cesareta nivîsandinê nedihate min û herweha min bawer nedikir ku wê kovare-ke swêdê xwe bide ber weşandina wê. Lê gava min beşek ji reva xwe nivîsand û ji ko-vara *Vî* re şand, wan tavilê nivîsa min we-şandin. Wê nivîsa min bala weşanxaneyâ Bonniersê jî kişandibe, loma wan dev ji min bernedan û xwestin ku ez li ser reva xwe û jiyana xwe ya li "surgûnê" pirtûkekê binivîsinim. Heta wê kîliyê jî min qet bîra nivîsandina pirtûkeke bi swêdî nedibir."

Bi rastî jî nivîsandina pirtûkeke bi zima-nê duwemîn, an jî bi zimanekî biyanî ne hêsanî ye. Ji bilî welatên kolonyalîst ku zi-manê xwe li ser koloniyêن xwe ferz kirine, mirov dikare ji dinyayê bi tenê pêrgî çend mînakan were. Herçî li Swêdê ye, digel ku bi sedan nivîskarên biyanî lê hene, ji bilî Theodor Kallifatidesê yunanî û çend kesen din, hemû bi zimanê xwe diniyîsinin.

Li ser girîngiya nivîsandina bi swêdî Azar Mahluojian dibêje:

"Em êdî perçeyek ji Swêdê ne, divê têki-liyên me ne tenê bi pizza û xwarinê bi Swê-dê re hebin, divê em bi têkiliyên xwe yên û intellegtuelî jî têkevin nava civaka swêdiyan. Divê em bi xebatên xwe yên û intelleg-tuelî hem kultura Swêdê dewlemend bikin, hem jî swêdiyan bi dewlemendiya kultura xwe bihesînin."

Ez dixwazim hebekî jî berê Azarê bi Kur-distanê vekim:

– Tu di beşeke pirtûka xwe de behsa Kurdistanê dikî. Lê tu kurdan ne mîna Betty Mahmudi tasvîr dikî...

"Ji xwe ez ê ne mîna wê tasvîr bikim" Azar dibêje û beşê li ser kurdan vedike. Ew behsa mîvanperweriya kurdan, dilovaniya wan û dostaniya wan dike. Û bi ser ve zêde dike: "Mîna her miletî neqencen kurdan jî hene, lê ez ji kurdan hez dikim û sempatiya min ji bo azadiya wan bêsinor e."

Bi hêviya rojek ji rojan wergerandina berhemâ Azar Mahluojian, em bi hev re ra-dibin, di nava qerebalix û çalakiyên keç û xortên ciwan yên "Sergelstorgetê" de xatir ji hev dixwazin û bi stresa jiyana modern berê xwe bi kar û mijûliyên xwe ve dîkin. ■

# Bi munasebeta 60 saliya

## Wezîrê Eşo

Têmûrê Xelîl/Emerîkê Serdar

Em gelek caran dibêjin ku nivîsara me ya vekirî (proza) an tune an jî berî çend salan dest pê bûye. Li ser mesela nivîsara me ya vekirî, nimûna nivîskar Wezîrê Eşo, ku gotara me di derheqa wî de ye, bes e ku em bêne bawerkirinê, ku nivîsara me ya vekirî ne iro û ne doh dest pê bûye. Wezîrê Eşo berî 40 salî dest pê kiriye. Lê Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Cerdoyê Genco, Nadoyê Xudo, Ahmedê Mîrazî û yên mayîn 40 salî berî Wezîrê Eşo nivîsandine. Nivîskar, wergervan, rojnamevan, Wezîrê Eşo 60 salên ji-yana xwe dagirt û kete 61 saliya xwe. Ew ji nisilata ronakbîrên kurdên Ermenistanê yê dudane, piştî wan kete meydana pêşdabirina lîteratûra û kultûra kurdan, yê ku salên 30-î bingeha lîteratûra kurdan li Ermenistanê û bi temamî li Sovietistana berê danîn. Di nîveka salên 50-î da, çaxê wî dest bi karkirina xwe ya nivîskariyê û rojnamevaniyê kir, bû hogirê ronakbîrên kardan yên here navdar: Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Qanatê Kurdo, Nadoyê Xudo, Ahmedê Mirazî û yên mayîn, yên ku karkirina hogirê xwe yê piçûk bilind qîmet kirine. Tevî hogirên çaxê xwe ra wî êtapa pêşdaçûyîna lîteratûra kurda ya nuh da kedeke mezin kire nava tevdanîn û çêkirina nivîsara kurdan ya vekirî û nava proza kurdî. Lîteratûranê kurd Çerkezê Reş dinivîse:

“Qinyatê emir wî çaxî dibê iżbatiya lîteratûriyê, gava kûra bedewetiyê da tê “rokirin”, gava ji wir “dertê” wek rastiya hunermendiyê. Di salên 60-î da rex nivîsarên serra-berraye êmpîrik proza kûrbûyî-dîtinê, psîgolgiyê-civakiyê riya xwe ya kardar girt û hêdî-hêdî ew fireh kir.


Aha Wezîrê Eşo nav wan hêzên nivîskaran yê peciryayîda bû, kîjana proza kurdî aliyê bedewetiyê da gîhandin ser derecke nuh, a bilindtir”.

Wezîrê Eşo di wî zemanî da dest bi karkirina xwe ya efrandariyê kir, çaxê

asaxa (qedaxa) Stalîn ya li ser ziman û çanda kurdan li Ermenîstanê û bi temamî li Sovietîstanê hate hilanînê û bi goveka firehtir û kûrtir dest bi pêşdaçûyina lîteratûra û kultûra kurdan bû li Ermenistanê. Ew di nava vê etapê û vî zemanê nuh da bi karkirina xwe ya êgîn, pir-cûre û pîrserecem bû ronak-bîrekî herî eyan, yê ku di nava hemû derecên kultura gelê xwe da kedek pirr rêt wek nivîskar, rojnamevan, publîsist, pedagog, wergervan, lîteratûrzan. Keda wî kifše nava dereca bilindkirina xwenaskirin-xwehesîna mîletiyê û hişyarkirina gelê kurd da.

Wezîrê Eşo r'ê Mijdara sala 1934-an li paytextê Gurcîstanê-Tibîlîsiyê da ji diya xwe bûye. Dê û bavê wî Eşoyê Hûtî û Kara Ûsiv mihacîre sala 1918-an yê ji qeza Qersê, gundê Şîrîkuyê bûn. Bav xwendina xwe wê di dibistana kurdî da sitend, ya ku salên 20-î li Tibîlîsiyê la-wekî malbeta Bedirxana -Kamil Beg Bedirxan seba palên kurdên nîvxwendî vekiribû. Dayika wî xwendina xwe ya êlementar li sêwîxana Celaloxlîyê da dest anîbû.

Sala bûyina Wezîr bavê wî bi mal û neferan ve koç kir û hate gundê Pampê (niha Sîpan) li Komara Ermenîstanê.



Wezîrê Eşo niha li Brukselê dijî

Eşoyê Hûtî li vî gundî gelek salan dibe serwerê kilûba gund, pişt re dibe serokê gund. Ew karekî mezin dike bona ronakkirina gundiyyê nexwendî, seba bingehgirtina kultura wî gundî. Li Mala Eşoyê Hûtî rûmet û qedirê xwendinê bilind bû, lema jî sê ewleden wî xwendina bilind xilas kirine: Şîralî bû doxtor-xîrurgê bi nav, Lûsic bû mamostaya dibistana Rûsî li Yerevanê.

Zarotiya Wezîrê Eşo û ji wê şûnda pakî zilamtiya wî li vî gundê kurdan yê li berpa-

la çiyayê bilind derbas bûye. Pamp gundekî ji 12 gundêñ kurdan yê li Navçeka Ermenîstanê ye. Bineciyêñ wî bi 60-70 malan wê hênen jiyana patrîarxalî, ya mîna jiyana bav û kalan yên çend sedsalan pêşda derbaz dikirin: bi paraztîna dep û rizm, edetê mîletiyê, bi derbaz kirin, kifşkirina cejnêñ xwe, dawet-şahîyen bi govendêñ kurmanciyê, bi civînêñ odan û gilîkirina serpêhatîyan, mijûliyan, qisan, beyt û serhatîyan, lehengan, çîrokan, mesele û metelokêñ kurdî yên xweş, bi sitirana kilamêñ kurdî. Wezîr li rex kalemêrên dinêdîtî rûdiniştî û gilî-gotinêñ wan hildicinî nav rûh û sewdê xwe. Ev yeka bû keremeke mezin seba nivîskarê paşerojê, yê ku nava berhemêñ xwe da zarziman, gilî-gotin, mesele û metelokêñ kurdî merd-merdane bi kar dianî.

Wezîrê Eşo xwendekarê universîteya Yêrêvanê bû, ku dû mirina Stalîn re ronakbîrêñ kurdan li Ermenîstanê dest bi şikayetan kirin bona hilanîna asaxê (yasaxê, qedexe) ji ser ziman û çanda kurdan, bona dîsa oca-xên çanda kurdan li Ermenîstanê bêne vekirin, yên ku di sala 1937-an de hatibûne girtin. Wezîrê Eşo ji bi heval û hogirêñ xwe yên xwendekar re bi ruhdarbûneke mezin tevî vî karê welatparêziyê bû. Sala 1955-an dîsa dest bi çapkirina rojnama kurdî "Riya Teze" dibe, di radyoya Ermenîstanê da para xeberdanêñ kurdî tê vekirin, di dibistanan de dîsa dersêñ ziman û lîteratûra kurdî têne teşkîlkirinê, seksiyona nivîskarêñ kurd ya yekîtiya nivîskarêñ Ermenîstanê tê vekirin, dest bi çapkirina pirtûkêñ kurdî dibe, di Enstituya Rohilatzaniyê da ya Akademi-

ya Ermenistanê ya Zanyariyê de para kurdzaniyê tê vekirin. Rojêñ pêşin de wezîrê Eşo yê xwendekar dibe nûçegîhan û wergervanê para xeberdanêñ kurdî, dest bi ni-vîsara ûnformasyon û gotaran dike bona rojnama kurdî, lê ji sala 1958-an ew ser rû-pelêñ wê rojnamê pêş da tê wek nivîskar.

Sala 1958-a Wezîrê Eşo diploma xwendîna bilind distîne û bona şikênanîna hisreta gundê bav û kalan, hînkirin-terbiyekirina zarokêñ kurdan, berê xwe dide Pampê û li wir dibe serokê dibistanê. Bi temamiya kel û bîn, êginî û hêza gencîtiyê ew zane-bûnêñ xwe diyarî wê dibistanê dike. Ew mal bi mal digere bi dê û bavêñ zaroka ra qise dike bi wî şerti, ku tu zarokê kurdan ji xwendinê-dibistanê der nemîne, bixwîne û bibe kadroyê kîrhatî bona gelê xwe yên bindest.

Wezîrê Eşo di sala 1964-an de vedigere Yêrêvanê. Hema wê salê ewî kifş dikan wek berpirsiyarekî prêsa Ermenîstanê. Karkirina xwe ya rojnamevaniyê û wergerê ew payê pirê li rîdaksiyona para xeberdanê radyoya kurdî da pêk tîne, li ku dibe wergervan û şiroçiyê (komentator) radyoyê. Her tenê ji cêrga "Serîhildanêñ kurdan" bi radyoya Yêrêvanê di sala 1994-an de weke 30 qisêñ Wezîrê Eşo hatine belakirin. Bona emekê Wezîrê Eşo radyoyê da tam û zelal bê berçavan, bese em bêjin, ku hetanî sala karkirina wî ya dawî -1994-an, weke 800 qise û gotarêñ wî hatine belavkirin. Wezîrê Eşo di radyoyê da karkirina xwe dom dike aliye amadekirina radyokompozisyayêñ (piş, şano) kurdî da. Ew vê derecê da pêş da tê

him wek şîretkarê rejîsor, him jî wek artîst. Çend radyokompozîsayêن wî jî hene, wek: "Tîgran û Mehmûd", "Koçekê Dere-wîn".

Di derheqa karkirina xwe ya radyoyê de Wezîrê Eşo weha dibêje:

"Radyoya Yêrêvanê, wek dibêjin, kere-meke Xwedê bû, ku ji me kurdan ra hatîbû kirin. Me bi riya radyoyê, bi temamiya gelê xwe, bi temamiya kurd û Kurdistanê ra xebêr dida. Guhdarêن me bi milyonan kurd bûn û me zanîbû, ku dema destpêbûna xebordanêن kurdî guhdarêن me yên bindest dilbirîn li hemû parçen Kurdistanê kar û barê xwe li alîkî dihelin, têr ber radyoyê rûdinêن û guhdariya me dîkin. Tşte herî ecêb ew bû, ku wana di derheqa rewşa xwe da ji me dibihîst û xebordanêن me alîkarâ didan, ku ew sebabîya wê rewşa xwe ya bindest zelal fêm bikin. Ez "serbilind û kubar im, ku nava dereca kurdperweriyê û hişyarkirina gelê kurd da emekê radyoya kurdî ya Yêrêvanê mezin e. Ne axir min jî di wê da weke zanebûn û hereketê xwe kar kiriye".

Wezîrê Eşo ji destpêka ronahîdîtina rojnama "Riya Teze" (1955-a) hetanî sala par-weke 40 salan miqaledarê wê bû. Ji 200-î zêdetir gotar û oçerkên wî rûpelên rojnamê xemilandine. Ew bingehdarekî rojnama seksiyona nivîskarênen kurdane li Ermenîstanê, ya ku salên dawî bi zimanê Ermenî, bi navê "Botan" der tê. Ew endamê wê kolêgia redaksiyone, ku wê rojnamê der dixe. Li Moskow rojnama Navenda Çanda Kurd bi navê "Golos Kurda" (Dengê Kurd) der-

diket. Miqala wî ye pirbelgê ye derheqa Bedirxanan da rûpelên wê da ronahî dîtine.

Wezîr bi hostatî çend pirtûkên nivîskarênen Ermenîyan û miletêن mayin wergeran-diye kurdî û daye çapkiran. Ewî pêşgotina gelek pirtûkên nivîskarênen kurdan nivîsiye. Ew herweha bi karê kurdzaniyê ve jî mijûl bûye. Wî di derheqa kurdzanêن navdar Hecîyê Cindî, Qanatê Kurdo, Çerkez Bakayev, Emînê Evdal, Şekroyê Xudo û yên mayin gelek miqalêن kêrhatû nivîsîne.

Li Ermenîstanê Wezîrê Eşo bi heqî nav dîkin wek "mirovê gel" bona karkirina wî, ya civakî. Usa jî dibêjin, ku navika wî birîne avîtine nava gel. Ew bawer bikî hemû gundêن Ermenîstanê yê Kurda qedisiye, geryaye, herweha wan gundêن Ermenîya, li ku kurd dimînin. Li wan gunda, usa jî li zozanêن kurdan, li ku kurdêñ rîncber konê xwe vedigirtin, zomêñ xwe datanîn, Wezîrê Eşo bi doklad, lêksiyayêñ hewaskar pêşda hatîye, yê derheqa rewşa kurd û Kurdistanê ya îroyîn, derheqa têkoşîna gelê kurde çek-dariyê. Bi wan pêşdahatinêñ xwe wî çavna-siya kurdêñ Ermenîstanê dida dîroka gelê me yê sal û zemanêñ dirêj, nava beden û rûhê wan da alava welatperweriyê bîr ne dikir.

Lê pirr kes Wezîr wek nivîskar nas dîkin. Eger em bidine ber hesêb, ku ji ronakbîrêñ kurdêñ Sovyetistanê, yên bi karê nivîsarê va mijûl in, ji sedî 95-ê wan helbestvan in, yên din nivîskar in. Mana vê jî heye: Sovyetistana berê ji bo helbesta belkî 20-30 carî diha zef pere didan, ne ku ji bo nivîsara ve-kirî. Wezîr hîc caran ji bo peran nenivîsiye.

“Sernivîsa pirtûka wî, ya pêşin, - doktor Çerkezê Reş dînîvîse, - “Mizgîni” bû, ku sala 1976-a li Yêrêvanê hate çapkiri-nê. Bi rastî jî, ew mîzgîniyek bû ji bo lîteratûra kurdan, ji bo dereca nîvîsara vekirî, prozayê. Nîvîskar di riyeke dirêj de derbas bûbû, xêr û şera cîhanê dîtibû, idî bi carekê ra mîzgîniya hatina efrandarekî “dest-pê” li xwedevana daxist”.

Sala 1983-an pirtûka Wezîrê Eşo ya bi navê “Dengbêj idî kal bûbû” li Yêrêvanê ronahiyê dibîne û ji aliyê xwendevanan da bi şabûn tê qebûlkirin. Bi vê berevokê va jî nîvîskar da kifşê ku mola wî ser serhatiya (çîroka) û kurteromanan e. Têma nîvîskar di vê pirtûkê da jiyana gund û gundiyan e. Piştî sê salan pîrtûka wî ya “Pamp-Sîpan” hate çapkiran. “Aliyê Janrêda, -Çerkezê Reş dînîvîse,-Pamp-Sîpan kurteromana dokumental e, ya jiyan û qewimandinên rastî. Di wê da her tişt heye: bîranînên zarotiyê, etyûdên tarîxiyê-miletzaniyê, pîrsdanîn-mîtalân publîsîtiyê, dilvekirinên lîfîkiyê, qîmetkirina zargotinê û hwd. Germahiyike dilê şîrîne helal vê kurteromanê da perwaz dide, ji bern ku qinyat “serdapê” rûhayeti-ya nîvîskar e, ji navber, hundurê k’el û hesinên wî tê, “dirije”.

Bona karkirina Wezîrê Eşo, ya efirandinê - zaniyariyê tam bê ber çavan lazim e em bêjin, ku pêşgotinên heft pirtûkên şâîr û nîvîskarê kurd li Yêrêvanê bi pêşgotinên wî hatine weşandin.

Lê çiqas kitêbên zaniyar û nîvîskarê kurd, kitêbên dersa, yê ziman û lîteratûra kurdî bi redaktoriya wî hatine weşandin.

Bi van pirtûkên çapbûyî berhemên Wezîrê Eşo xilas nabin. Pirtûkeke wî, ya nû, ya çîrok û kurteromana ji 400 rûpelî çapxana Yêrêvanê da ma, ji ber ku bi sebêbiya rewşa civakî-aboriyê, ya giran ew nehate çapkiran. Bilî vê, pirr serpêhatiyê Wezîrê Eşo yên netemambûyî û nîvcîmayî di arşîva wî da mane. Nîvîskarê bêwestan pîan û arman-cen nû ji bo pêşerojê dane pêşıya xwe.

Wezîrê Eşo niha li er romanekê dîrokî, ya bi navê “Xezal” kar dike û wî gelek berhemên li ser kurdan ji ermenî wergerandîne kurdî û mîna du pirtûkên pirbelge, bi pêşgotinên lîteratûrzaniyê çap kiriye. Di çend berevokên din da jî wergerandinêñ afirandinêñ nîvîskarê Rûs û Ermenî bi destê Wezîrê Eşo hatine weşandin.

Wezîrê Eşo salên dawî cîgirê serokê Komeela Ronakbîrêñ Kurdan bû li Ermenîstanê, endamê Kolegia Redaksiyonâ Rojnama Kurdî ya “Botan” bû, ku bi zimanê ermenî li Ermenîstanê ronahî dibîne. Karê di rad-yoya Kurdî de, ku pirranî li ser milêñ wî bû, ev hemû tişt tesîr li ser wî hiştin û dîlkê wî ber van hemûya deyax nekir û terk lê ket. Ew nav û dengekî bilind, derecên rûmet qezanc kiriye. Ew endamê Yekitiya Nîvîskarê Sovyetîstana berê û Ermenîstanê ye. Endamê Enstituya Kurdî ya Brukselê ye.

Wezîrê Eşo jî mîna gelek nîvîskarê Sovyeta kevin, mecbûr ma û cî û warê xwe terk kir. Ew niha bi jin û zarokên xwe re li paytextê Beljîkayê, li Brukselê dijî. ■

# Sîma Semend bi tîpêñ latînî

Lokman Polat

Kurdên Soyyeta berê (kur-dên Kafkasayê) berhemên xwe bi tîpêñ krilî dînivîsinin. Wan hetanî niha gelek berhemên çandî, edebî, lêkolînî û dîrokî afirandine. Di van çend salêñ dawîn de hinek berhemên wan bi metoda transkrîpsiyonê ji alfabeşa krilî kirin alfabeşa latînî. Ev kar û xebat ji bo çand û zimanê kur-dî xizmetek hêja ye.

Pirtûka bi navê "XEZAL"ê ji bi metoda transkrîpsiyonê kirine alfabeşa latînî-kurdî. Yê ku ev karê hêja kiriye Şefîk Kaya ye. Pirtûk 72 rûpel e û di nav weşanên Nûdemê de hatiye weşandin. Nivîskara pirtûkê Sîma Semend e. Ew di sala 1933-an de li navçeya Axbara-nê hatiye dinê.

Ji ber ku di nav nivîskarêñ kurd de yên jîn gelek hindik in, qîmet û rûmeta Sîma Semend hîn ji giranbiha ye. Ew jîneke kurd e û nivîskar e. Nivîskara jîn Sîma Semend du pirtûkê çîrokan nivîsandiye. Berhemâ wê ya bi navê "Xezal" çîrokek dirêj e. Di vê pirtûkê de ji xeynê çîroka dirêj a



**XEZAL**  
Sîma Semend  
Çîrok, 71 rûpel  
Weşanên Nûdem

bi navê "xezal"ê, du kurteçirokêñ din ji hene. Yek jê navê wê "Reva Rihanê" ye, ya din ji navê wê "Mîzgîn" e.

Ev berhemâ hêja bi zimanekî edebî, zimanekî hêsan û zelal hatiye nivîsin. Naveroka çîroka dirêj û herdu kurteçirokan ji gelek dewlemend e. Le-henga vê çîrokê navê wê Xezal e. Xezal di kolxoze de dixebite, kar dike. Kolxozi avahîyeke ku di sazûmana Sosyalîzmê de

derketiye holê û pêk hatiye. Gundiyêñ welatêñ Sosyalîst di kolxozan de bi hevre dixebeitin, karê kolektîfi dîkin.

Xezal û Karê du keçen kurd in. Herdu ji hevalêñ hev in. Mirov wexta ku li têkiliyêñ herduyan yêñ hevaltiyê dinêre, şêrîntiya hevaltiyê dibîne.

Bi navê Qaçax xortek ji di kolxoze de dixebite. Ev xort bi yekalî ji Xezalê hez dike. Hevalekî vî xortî jê re dibêje:

—«Xezal ji te hez nake. Ew tu car te nastîne, dev jê berde.»

Qaçax ji dibêje:

—«Gere ez vê qîzê bixwazim. Heke ew min nexwaze ji ez ê wê birevînim.»

Xezal naxwaze niha bizewice. Ew dixwaze di dibistanê de bixwîne û bibe doktor. Mala Xezalê li Elegezê ye. Ew ji wê diçe Erîvanê, dest bi xwendina dibistana bilind dike ku bixwîne û bibe doktor. Xezal li Erîvanê, di nav rêxistina ciwanan, Komsomolê de ji kar dike. Xezal li Erîvanê diçû tiyat-ro û operayê.

Xezalê di dibistana bilind de

keçikek û xortek nas kir û bi wan re bû heval. Navê Keçikê Sêvê bû û navê xort jî Ahmed bû. Ahmed ji Xezalê hez dikir, lê nikaribû-şerm dikir- dilê xwe jê re vebike. Lê Sêvê ji Xezalê re dibêje ku Ahmed jê hez dike. Xezal jî ji Ahmed hez dike. Xezal paşê dibe doktor, tê di gundê xwe de dest bi karê doktoriyê dike û paşê jî ew û Ahmed dizewicin. Dawiya çirokê bi bextiyarî diqede.

Di vê çirokê de hezkirinek rasteqînî, hezkirinek paqîj, evîna bi dilûcan, têkiliyên însanî bi şeweyek gelek baş hatîye qalkirin.

Çiroka duyem navê wê "Reva Rihanê" ye. Rihan keçikek kurd e. Ew ji şivanê gund, ji Mirad hez dike. Seydo Axa, Axayê gund e. Kurê wî Casim çav berdaye Rihanê. Bavê Rihanê dixwaze wê bide kurê axa. Lê diya wê naxwaze wê bide Casim. Diya wê ji mîrê xwe re dibêje:

—«Em feqîr in, ew dewle-mend in, dê herroj bidîne rû-yê qîza min. Rihan wî naxwaze. Dilê wê bi Mirad ra ye.»

Bavê wê dibêje:

—«Mirad şivan e. Ew Axa ne qîza te dixwazin û tu neqayîlî.»

Diya Rihanê nexweş dikeve û dimre. Rihan sêwî dimîne. Piştî mirina diya wê, bavê wê wê dide kurê Seydo Axa. Kurê

Seydo axa, Casim ji Rihanê panzdeh salan mezintir e. Rihan gelekî li ber dikeve, xemgîn dibe ku bavê wê ew daye Casim.

Rihan ú evîndarê wê Mirad hevûdu dibînin. Rihan jê re dibêje ku bavê wê ew daye Casim. Mirad wexta dibihîse, sar dibe, erd di bin de diheje, serî lê gêj dibe. Rihan jê re dibêje:

—«Min jî, xwe jî, ji vê zil-mê xelas bike! Mirad min azad bike!»

Mirad jî ji Rihanê re dibêje:

—«Heta Miradê te sax be nahêle tu bibî jina Casim Axa.»

Mirad û Xezalê hevûdu bi dizî dibînin. Mirad birtyar di-de ku Xezalê birevîne. Xezalê jî vê birtyarê bi dilxweşî qebûl dike.

Şevekê Mirad, Rihanê dire-vîne ku wê bibe Tiblisê. Mala Seydo Axa pê dihesin, bi dû wan dikevin. Rihan li hespê suwar e. Gule bera wê didin, gule li Rihanê dikeve, Rihan ji ser piştâ hespê dikeve xwarê û ji Mirad re dibêje:

—«Mirad, zû bireve, ew pê hesiyane, dê te bigirin, here!»

Dinya li serê Mirad dibe dojeh. Lê Mirad, Rihana birîndar li erdê nahêle û nareve. Ew wê heldigre û bi rê dikeve, berê xwe dide çiya û diçe. Paşê birîna Rihanê rehet dibe û ew

herdu bi hevre dizewicin, digî-hijin miradê xwe.

Çiroka Sêyem navê wê "Mizgîn" e. Di vê çirokê de jî leheng qîzek e. Navê keçikê Zînê ye. Zînê li kolxoze kar dike. Birayê Zînê, Selîm ji leş-keriyê tê malê. Ew jî di kolxo-zê de dest bi kar û xebatê dike.


Di hersê çirokan de jî têt xuyakirin ku, di çirokan de ro-la sereke qîz (keç) dileyizin. Sîma Semend di çirokên xwe de rewşa keçen kurd, xemgînî û bextiyariya keçan, evîna wan ya bi dilûcan, hezkirina wan ya pak bi zimanekî edebî li hev dihone.

Nivîskara kurd, Sîma Semend, di çirokên xwe de jiyanâ gundîtiyê, kar û xebata kolektif ya kolxozan baş dide di-yarkirin. Ew di çirokên xwe de cîhanekê ava dike. Di nav vê cîhanê de tiştîn başî û xirabî hene. Tradisionên kevnare û yên nûjen hene, adet û toreyen paşverû û li hember wan ramanê pêşverûtiyê hene. Nakokî û dijberiya di nav başî û xirabiye de, tim başî, xweşî, bextiyarî, hêvî bi ser dikeve. Pirtûka bi navê "Xezal" berhemek hêjayê xwendinê ye. Xwendevanê kurd û bi taybetî jî jinê kurd divê vê pir-tûkê bixwînin. ■

# Rojek ji rojê Evdalê Zeynikê dibe piyes

Adil Dûran

**R**ojek ji rojê Evdalê Zeyni-kê her wekî roman hatiye nivisîn. Motîvên wê yên nete-weyî û çandî û exlaqbilindî ji bo herkesî û her demê derbas dibin. Dîsa ev berhem jihev-naskirina başî û xirabiyê bi bûyerên evîndarê nemir Ev-dal û Gulê, welatparêziyê bi yên Bengîn û Meyro bi me di-de hezkirinê. Ev bîr û bawerî dijwar e, xurt e û rûmet e, rû-metek ji başiyê ye. Li aliye din zor û zilma Osmaniyan û xira-biya Egît Begê, ew xişm û xe-zebê li ser ermenan û kur-dan, pênaşıya tarîx û jiyana ci-vakî ya gelan tîne ber çavan. Ew serpêhatî û bûyerên têkûz pir alî û bi armanceke mezin in. Mirov dikare bibêje, li gora afirandinê edebî, Shakespe-are'ê Kurdan yê hemdem e. Herwekî di nav klasikên kurdî de morî û mircaneke yekta bi cih e. "Li vê dînyê her tişt tê û derbas dibe, diç... Malê dînyê li dînyê dimîne... Her zindî-



*Rojek ji rojê Evdalê Zeynikê, di sala 1991'ê de mîna roman di nava Weşanên Welat de derketibû.*

yek di pêvajoyê xwe dibuhurî-ne..." hwd. Van gotinê bav û kalan bûne axaftinê rojane û her tim bi devkî têne gotin. Ji ber ci têne gotin? Pîvan ci ne û bi ci sedemî têne gotin? Ez dixwazim piçekî li ser vê rawestim, di derheqê van de şirove bikim. Bi qewlê diyalektîkê "tu tişt ji tunebûnê nayê

avakirin û ji avahiyê ji nayê tunekirinê." Her tişt xwe di-guherîne. Pêvajoya jiyana mi-rov ji wisan e. Mirov tê dînyê, dijî û umrê xwe temam dike. Laşê wî gorî axê dikin yan ji dişewitînin. Her çawa be ji, ew xwe diguherîne. Di tebiye-tê de tiştên bi can, zindî, mi-rov, heywan, kurm, masî, çûk, giya, dar û ber her texlid te-menên xwe didomînin û da-wiyê tên guhertin. Ji bilî wan rêaziyeke din heye, ew ji ev e; di jiyana civakî de mirov bi ki-rinê xwe, bi afirandinê xwe yên çeker û havil nemir dibin. Ev xusûsiyet, mirovan ji nevi-yen din cihê dike. Ji ber ku mirov bi ramanê xwe ji texlî-dên din bilindtir e, bi aqîl e.

Bi vê xusûsiyetê hinek mi-rovên bijare di dem û dewra-nan de bi afirandinê xwe yên çeker û havil nemir in, ew tên bi bîranîn. Wek Firdewsî, Eh-medê Xanî, Cigerxwîn, Pir Sultan Abdal, Puşkin, Gorki,

Bertohlt Brecht, Nazim Hikmet, Pablo Neruda, Stanislavski... ev bi çekeriya xwe, lê hinek şexsiyet jî bi kavilkirina xwe têni bi bîranîn. Ew jî ev in, Hitler, Musoloni, Franko, Atatürk û cahşen me, ango ev korucuyên han!..

Ez dixwazim gotinên xwe bînim ser Homerosê Kurdan ê nemir û bala we bikişînim ser Evdale Zeynikê.

Birêz Mehmed Uzun "Rojek ji rojê Evdalê Zeynikê" wek destaneke herdem, ev berhemâ nemir bênepixandin afirandiye. Ew şanî me dike ku ji mêt ve Kurd li welatê xwe ne azad in. Bêtifaq û bêhêzbûyina xwe ji xwe ne ewle bûne û dîl û bende mane. Korbûyina Evdal, evîna wî û Gulê, Meyro û Bengîn an ji cîgirê Evdal Şêx Silê, qulingê perşikestî û rewşa wan ne gelekkî ecêb e. Ew remz in, wek bâweriya Zerdeş, ronahî û tarî, şer û aşitî, xirabî û qencî, curmê bêguneh û nalebaran dide pêş. Ew remz, reng, deng û nexşen neteweyî pevre, di wê demê de, bi gelek alî, ji jiyana Evdalê Zeynikê wîrdetir, cîvata Kurdistanê ku ji aliyê hêzên dagirker ve hatiye kavilkirinê pêşkeşî xwendevanan dike.

Dema ku mirov rêç û şopa dengbêjan yên bi nav û deng yên dawiya sedsala nozdeh û heyâ serê sedsala me dajo, dibîne ku ew yan şagirtê Evdalê zeynikê bûne, yan jî di bin tesîra wî de mane. Evdalê Zeynikê di wê qadê de rêgeheke bêhempa ye û Homerosê Kurdan i herdem e.

Ji ber van sedemên jorîn yên giranbiha min ev berhem hêjayî şanoyê dît û bi adet û úsilên dinê dest bi xebata lihevânîn kir. Ev xebat wisan bi hesanî nebû. Karê mehan û salan bû. Çaxa romanek, kurteşirokek, destanek ji bo şanoyê bêt lihevânînê, di wê afirandinê de, bingeh û naverok esas tê girtin û ev tiştên din yên cur be cur ji jê tê derxistinê. Carina ji naverok li gor rewşa rojane tê guherandin. Ev çenebin nabe!

Min têkilî û danûstandina xwe bi M. Uzun re danî û raya wî girt, piştre ew berhem ji bo şano li hev anî û afirand. Cîgeh, mekan, rê û derên dûr jê derxistin û ew û bûyerên wê li ser cîgehê şanogehê de gîhandin hev. Bi úsil û regezên şanoyê "Rojek ji rojê Evdalê Zeynikê" di nava dekor û "nexş" de, ji nû ve hate ziman.

Çawa ku tê zanîn, wêje, hûner, çand û ew heyiyê din yên neteweyî di çerçeva zanisitiya gel de tê pejirandin. Ev xusûsiyetê kûr û berfireh yên zanyarî bi lêger û lêkolînan derdi Kevin ronahiyê. Li welatê me bê lêger û lêkolîn herçiqas çend nimûneyên cur be cur hatine lîstin ji mirov nikare van wek şanoya neteweyî bi nav bike. Ev kêmasyek e û ev kêmâsi jî ji bêdesthilatiya me tê. Di van salêن dawiyê de çend berhem ji şanoyen biyanî hatin wergerandin. Ez şaş nebim, çend berhem ji nivîskarîn me bi xwe afirandin. Mîxabin komên şanoyen Kurdi ev berhem negirtin ber çavan. Karê wan bedilhewa diçe û hênikarin listikên nemir çêkin û biafirînin.


Ma fonksiyona şanoya neteweyî û civakî ci ye? Divê nivîskarîn şano rêgeh, ango şert û şûrtêن civakî, dîrokî, aborî û mercen hîsî û terbiya exleqî bi rîgehêن zanyarî baş hîn bibin da ku bikaribin li ser babetên neteweyî yên nemir rawestin û binivîsinin. Ji ber ku fonksiyona şano: mirov baş û kûr û piralî dide naskirin; li ser pîrsigîrêkan ramankirinê û darazda-

niyê dide hînkirinê û fêdeya afirandina huner û guhêrkariya hunerê dide şanîdanê, bi van regeziyan têkîlî şûndamaya civatê dibê û êrşî kompleksê wan dike. Şano nasnamaya neteweyî qaîm digire û rastî û nerastiyê ji hev dertîne, azadiya ramanî derdixe pêş û dadikeve nav bincê "kok"ên danûstandina şexsî û civakî.

Ji bo neteweyekê tunebûna şanoyê xeter e. Hebûna şanoyê ji, ji bo netewe û civatekê sedemê pêşketin û guherînan pêwist e. Ji ber ku şano di pêşketin û serkevtina gelan de roleke mezin dilîze. Piştî şerê cihanê yê yekem û yê duwem Elmanya ser û bino bû. Wan di destpêkê de bingehêن şanoyê ava kirin û li her bajarî sazgehêن şanoyê anîn holê û bi moraleke mezin kar û barê civakî rêve birin û bi ser ketin.

Îro ji bo me, dîrok xwe dubare dike! Ma em nikarin li ser avahî û heyiyêن xwe berhemên nemir biafirînin û bijînin? Ji ber ci na? Li vir bi gotina Mehmed Uzun ez dixwazim bi dawî bikim:

"Îro li dunyayê tiştê herî dijwar Kurdbûyin e û em ji wê dixwazin..." ■



**ŞAHMERAN**  
Berhevkar: Bavê Berzan  
Weşanên Sara, 40 rûp.

**D**i danasîna vê pirtûkê de em ê ji agahdariyê Weşanxaneya Sarayê bi rê bikevin. Weşanxane dibêje: Di nav gel de dibêjin ku Şahmeran xortekî çeleng û aza bû. Wî serî li hevberî padîşahê dewranê rakiribû. Padîşahê xwînrêj, gel ji ber stema xwe perîşan kiri bû. Lê vî xortî, li ber vê bêdayîyê, hez ji serîçemandînê nekiribû û serî hildabû.

Hevalên wî, li berxwedanê ne durust bûne, ji lewra doza wî jî bi ser neketiye. Ji ber vê

hindê, wî li ber padîşah xwe bi şûn de kişandiye û ketiye bin erdê. Bi salan, weke maran, di kun û şikeftan de maye, nîvê laşê wî bûye mar. Vêca maran xwe pê re kirine heval û ew bûye padîşahê wan, yanî ew bûye şahê maran. Paşê miriye û keça wî dêmar bûye şahbanuya maran. Lê navê şahmeranê her ji keça wî re maye.


Lê ser çiroka şahmeranê bi awayekî din ji tête çêlkinin. Tê gotin ku piştî derketina Adem, di navbera ademîzad û maran de, dijminahî peyda bûye. Mar bûne sedem ku Adem ji buhuştê hatiye derxistin. Ji wê rojê, mar û mirov bûne dijminen hev. Ji ber ku mirovan mar bi hêsanî kuştine, ew li ser rûyê erdê nemâne. Maran xwe ji ber stema mirovan kişandine binê erdê. Heger mirov wan netirsîne ew bi mirov venadin."

Li ser çiroka Şahmeranê hînek nêrîn û şiroveyên din ji hene. Weşanxaneya Sara bi weşandina vê berhema mîtolojîk karekî baş kiriye. ■

# Kurteçîrokêñ Suzan Samancı werdigerin kurdî

Jî ber qedexebûna zimanê kurdî û nebûna perwerdeya bi zimanê kurdî, kurdên bakurê welêt her tim mecbûr mane ku bi tirkî bifikirin, bi tirkî bixwînin, bi tirkî binivîsinin. Îdeolojiya tirkîtiyê, gelek caran teşîrên wilo xurt li intellektuel û nivîskarêñ bi eslê xwe kurd kiriye, ku ew ji tirkân tirkîtir bûne û wan jî dane ser riya îdeolojiya tirkîtiyê. Loma wan xwe û zimanê xwe ïnkar kirine; motifên folklora kurdî, edebiyata kurdî ya devkî, temayêñ ji-yana kurdan ji xwe re girtîne û ew mîna edebiyata tirkî pêşkêş kirine. İro, li Tirkiyeyê, di nava nivîskarêñ navdar de, hejmara nivîskarêñ esilkurd cihekî mezîn digire.

Lê çîroknîvisa ciwan Suzan Samancı nedaye ser şopa wan. Erê, ew kurteçîrokêñ xwe bi tirkî dinivîsîne, lê tema çîrokêñ wê, motifên ku bi kar tîne, hemû ji civaka kurdî ne. Herçiqas kurteçîrokêñ wê bi tirkî hatibin nivîsandin jî, mirov ruhuyeteke kurdî tê de dibîne, mirov ru-



**BAJARÊ MIRINÊ**  
Suzan Samancı  
Werger: Songül Keskin  
Kurteçîrok, 95 rûp.  
Weşanen Avesta

huyeteke kurdî tê de hîs dike. Ew bi tirkîyeke xurt tasvîra jiyana kurdan, zilma li ser kurdan, şewitandina gundan, reva xelkê, şer, birçîbûn, tîrsa psîkolojik û hwd. dike. Wê heta niha du pirtûkêñ kurteçîrokan di nava weşanen Can de weşandine. Pirtûka pêşî bi navê "Reçine kokuyordu Helin" (1993) û ya duwemîn jî "Kıraç dağlar kar tuttu" (1996).

Weşanxaneya Avestayê karekî baş kiriye, ku pirtûka Samancı ya bi navê "Reçine kokuyordu Helin" bi kurdî weşandiye. Wergera wê ji aliye **Songül Keskin** ve hatiye kîrin. Di wergera kurdî de navê çîrokeke din li pirtûkê bûye. Bi kurdî bûye "Bajarê Mirinê".

Mîna tê zanîn cara pêşî wergera kurteçîrokeke Suzan Samancı ya bi navê *Evîndara ji Helepçeyê hatî* di kovara Nûdemê, hejmara 9'an de weşiyabû.

Wergerandina berhemên nivîskarêñ eslikurd, ji du awiran ve girîng in. Yek jê berê nivîskaran bi nivîsanda kurdî vekirin e, ya din jî antramana wergêran ya zimanê kurdî ye.

Di vê pirtûka aktuel de bi kurtî ev çîrok hene: *Muhaci-riya din, Bışkokêñ çîrisî, Bedo Hoste, Berçem, Evîndara ji Helepçeyê hatî, Gavanê lîseyî, Bajarê mirinê, Bêhna gezo ji Hêlin dihat, Veger, Asya, Berî mirinê, Du dayik, Enqereya di radyoyê de, Evîneke rakirina rezan, Sirgûn.* ■

# Gelas om våren

och andra berättelser från Kurdistan

Gelas bor i en liten by i Kurdistan. Gelas älskar den här lilla byn. Hon älskar våren med alla blommor och fåglar. Hon älskar månen och stjärnorna men mest av allt älskar hon sina föräldrar. Varje vår går Gelas till en blomsteräng nära byn. Då brukar hon ha en ny klänning. Hur ska Gelas kunna få en ny klänning? Det får du veta i *Gelas om våren*. Där får du lära känna en flicka i Kurdistan- hur hon lever, vad hon fantiseras och funderar om. *Gelas om våren* är en barn bok, skriven av Fahmi Kakae, med många vackra färgillustrationer av Kamil Ali Ridha. Den är på 40 sidor, inbunden, i stort format.

Jag beställer

.....ex av *Gelas om våren*,

ISBN 91-604-0247-4, pris 99:- (ord bokhandelspris 131:-).

Namn:.....

Adress:.....Postadress.....







Skicka beställningen till Naturia Förlag, Box 42053, 126 13 Stockholm  
Eller faxa på nr 08-709 05 30. Tel: 08-709 04 13




Naturia

# JI WEŞANÊN NÛDEMÊ PIRTÛKÊN NÛ

Maleke bê pirtûk weke xaniyekî bê pencere ye  
*Moa Martinsson*



# BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!



**G**er hewesa te li ser helbest, çirok, roman, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, Sînema û hwd. hebe, pêşniyazeke me heye; bibe aboneyê Nûdemê! Ger tu dixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya her çar perçeyên welêt haydar bibî û edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwînî, dîsan bibe aboneyê Nûdemê!

Nûdem dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu jî alîkariya wê bike, bibe abone!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê Nûdemê.

Ji bo Swêd salek 190 Sek, welatê din 50 \$

**Nav û paşnav.....**

**Navnîşan.....**

---

Vê karta jor dagirin û fotokopiya wê li ser navnîşana Nûdemê bişînin. Çer ku ew bigihîje me, em ê Nûdemê digel karta abonetiyê ji we re bişînin.

